

AHMEDÊ HEPO

KARÎBARÊN GELÊ KURD



KARÎBARÊN KURDÎ

AHMEDÊ HEPO

P

PEYWEND

EHMEDÊ HEPO

KARÎBARÊN GELÊ KURD

(Bijarteyeke Folklorê Kurdî-Tekst û Nirxandin)

Weşanên Peywend:

Gerîndeyê Giştî

M. Xalid Sadînî

Karîbarên Gelê Kurd / Folklor

Nivîskar: Ahmedê Hepo

Edîtor: Umîd Demîrhan

Berg û Mîzanpaj: Dr. Îbrahîm Mîrza

ISBN: 978-605-70315-0-1

Çapa Yekem: 2021

Çap: Bizim Büro Matbaacılık Basım Yayıncılık San.
Sanayi 1. Cad. Sedef Sok. No: 6/1 İskitler /ANKARA

PEYWEND

Vali Mithat Bey Mah. Hastane Cad.

Nedim Odabaşı İş. Mrkz. A Blok, Kat: 1 No: 33

İpekyolu /VAN

Gsm: 0532 354 44 65

e-mail: peywend2020@gmail.com

web: www.peywend.com www.kitabakurdi.com

 AHMEDÊ HEPO

KARÎBARÊN GELÊ KURD

(Bijarteyeke Folklorê Kurdî-Tekst û Nirxandin)

 PEYWEND

Pêşek

Heta niha Peywendê du berhemên Ahmedê Hepo weşandine: ji wan yek romana bi navê “Birîn” bû ku eleqeyê baş dît û berhema duyem jî berhevoka kurteçîrokan a bi navê “Hêsirên Xwînê” bû.

Îcar ev berhema di destê we de cara pêşîn sala 2000î li Bakuyê ji aliyê Weşîneka Gençlikê ve hatibû weşandin û bi rastnivîsa kurdên Sovyêta berê hatibû amadekirin. Di van salên dawîn de weşanxaneyê Peywendê jî bi biryara desteya weşanê girîngiyeke taybet da wêjeya kurdên Kafkasê û niha wan berheman bi rastnivîsa nû diweşîne.

Ev berhem xebata salan a nivîskarî ye ku gelek numûneyên çanda gelêrî ya kurdî ji windabûnê rizgar kirine û gihandine nifşa me. Li gorî gotina Apê Ahmed wî hê di xortaniya xwe de dest bi tomarkirina gilî-gotinên nas-dostan, kal-pîran kiriye. Niha piraniya salixdarên van numûneyan ev gencîneya giranbiha radestî me kiriye û çûne rehmetê, gora wan bihuşt be! Çavkaniya van gilî-gotinan ew salixdar in ku di navbera salên 1918-1926an de koçberî Sovyêtê bûne, di heyama Kurdîstana Sor de hînî xwendin-nivîsandina kurdî

bûne, zarokên xwe bi kurdî perwerde kirine, raman-serpêhatiyên xwe bi kurdî vegotine û ev “emaneta neteweyî” sipartine me. Lewre me jî dest nedaye zimanê berhemê; me tenê bi rastnivîsa nû amade kiriye û peyvên kêmnas bi jêrenivîs û ferhengokekê şîrove kirine.

Nivîskarî navê “Karîbarên Gelê Kurd” li pirtûka xwe kiriye. Bi rastî jî çanda gelêrî ya kurdan hem çavkaniya ziman, dîrok û erdnîgariya wan e hem jî çavkaniya hişmendiya wan a kevneşopî ye.

Endamê Yekîtiya Nivîskarên Azerbaycanê Ahmedê Hepo ev xebata xwe li ser heşt beşên sereke ava kiriye: Di beşa yekem de beyt-serpêhatiya mêrxasê kurd Eliyê Xarziya heye û bi terzê dengbêjan hatiye tomarkirin. Di beşa duyem de çîroka bi navê Dundulçûk heye ku hiinekî dişibihe çîrokek ji Çîrokên Hezar û Yek Şevê. Kilamên mêrxasiyê yên bi navên “Îsmayîl Axa”, “Elîko Lawo”, “Kekê Nisret”, “Tahar”, “Kekê Ewlo”, “Heydero Lawo”, “Elîngo Lawo”, û “Hamê Mûsê” di rêza sêyem de cih digirin. Herwiha di beşa kilamên evîntiyê de jî stranên “Kalê û Du Keçîk”, “Qazî”, “Domam”, “Heso û Xanim”, “Jina Çê” û “Hecî Nûrî” valahiyeke berbiçav dagirtiye. Di tevahiya berhemê de 185 dilok hene ku her yek ji ya pêşiya xwe xweşiktir e. Çil pêkenîn û şîretên berhemê çêjeke taybet didine wêjeya kurdî; hem rûyê mirovî geş dikin hem jî hişê guhdarî kaşî nava deryayeke ramanê, ibretgirtinê dikin. Nivîskarî tenê numûne berhev nekirine; herwiha derbarê nîrxandina numûneyên folklorî de jî du gotarên lêkolînî amade kirine. Di beşa “Hêjaya karîbarên gel di çi da nin?” de berhevkarî hewl daye ku tekstên tomarkirî û bihîstinên xwe bi rêbazeke wêjeyî binirxîne. Mirov dikare gotarên “Nîgara Jina Kurd Nava Beyt-Serpêhtîyan da” û “Nîşana Mêrxasiyê” wekî du xebatên zanistî binirxîne ku lêkolînerî ji gelek çavkaniyan sûd wergirtiye. Di dawîya berhemê de beşa nivîsarnasiyê heye ku bîbliyografiyaya salixdarên nivîskarî tê de hatine destnîşankirin.

Wekî weşanxaneyê Peywendê em gelekî kêfxweş in ku vê berhemê digihînin ber destê we. Ji ber ku nivîskar-berhevkarê me şahidek ji şahidên sedsala bihurî ye, parek ji çanda me ya devkî ji devê salixdaran berhev kiriye û bi vî terzê xweşik pêşkêş kiriye. Ji aliyekî

din ve xebatên folklorî di nava xwe de gelek peyv û têgihên kêmnas di hewînîna û divê werin şîrovekirin. Em dîsa bextewar in ku nivîskar-berhevkarê me yê temendirêj hê sax e û ji bo şîrovekirina van peyv û biwêjan alîkariya me kiriye. Apê Ahmed piştî amadekirina çapê vê duayê li me dike û em jî dibêjin amîn: “Xwedê zehmetê me yê giran ro da nede! Bi hêviya siba bi tav, gel, ez bi heyran!”

Umîd Demîrhan

19.01.2019, Bazîd

*Ger nişkê va Xaliqê Jorîn careke mayîn
jiyan bida min, min ê hemû salên jiyana
xwe rewayî beravkirin, amadekirin, berni-
vîsara zargotina gelê xwe bikira. Ji ber ku
erf-edet, zar-ziman, rûpelên riya şerkariya
azadariyê, baweriya roja sibê ye geş di
nava wê xemilê da hatiye parastinê.*

Ahmedê Hepo

Xwendevanên Hêja!

Kî evê berevokê bide destê xwe bixûne, bizanibe ev hemû we-
kokên ronahîdîtî ji kûraya sedsaliyan hatine ghiştine me. Me jî
ewana bi hezar dijarî, lê bi şabûn, monik monik pey hev dane
rêzên weşevaniyê.

Bona dewlemendiya zargotina gelê kurd bê ber çavan, me ji xe-
zina zargotinê kulme karîbar, beyt, serpêhatî, çîrok, kilam-stran,
dîlok, pêkenîn û yên mayîn hildan dane weşandinê.

Me dem bi dem hinek ji wan binetaran rojnamên cuda cuda
dane weşandinê. Çi ku cuda cuda ronahî dîtine nivriya undabûnê
ra derbaz bûne, lê efirînekê da ronahîdîtina xwe va ewana wê riya
sedsaliyan qevz kin.

“Rewayî bavê xwe Hepoyê Bedo û diya xwe Gulistana Îsa dikim.
Ne ku bona wê yekê, wekî yekî ked, yekê şîrê helal daye min, lê him
jî bona wê yekê ku ewana di aliyê hizkirina zargotina gelê kurd da
min ra bûne mamosteyên hêja.”

Çarenûsa min ê sipî be

Xwendevanê hêja! Dema ev berevok bona weşandinê amade bû, hate dilê min ku derheqa beravkarê wê da çend giliyan binivîsim.

Me ev biriyara bona vê yekê kir, wekî emir-jiyana nivîskar bi xwe riya çarenûsa bi hezaran kurdan ra derbaz bûye. Ew çarenûs rûpelekî dîroka me ye. Ger me wede da derheqa gellek nefsdarên xwe da, derheqa kirinên wan e qenc da binivîsiya xwey kira îro ew ê destê me da bibûyana çekek miqabilî dujmin, him jî bona wê yekê, wekî roja dahatî nijad û paşkar bizanibe Azerbaycanê da rewşa xwenaskirina kurdîtiyê çawa bûye, çawa hineka cedandine kurdîti carekê va neyê bîrkinê, erf-edet, çand, dîrok çawa hatiye parastinê, çawa boy xweyîkirin û pêşdabirina zimanê wêjeyî gav hatiye avêtinê.

Eva dewra rêjîma Stalîn bû. Dema Ahmedê tîfal sê salî bû; malbeta wana tevî bi hezaran malbetên kurdên musulman ji Ermenîstanê hate nefikirinê. Malbatên kurda ye nefikirî li rêspûblîkên Asiya Navîn û Qazaxistanê hatine hêwirandinê. Malbeta bavê nivîskar Hepoyê Bedo tevî çend hezar malbetên kurdan anîn derxistine rêspûblîka Qırqistanê, marza Celalabadê avana Kok-Yangakê.

Kok-Yangak avana senaya komirê bû. Vira bi dehan kanên sextên komirê hebûn.

Him cî-war, him qewlên xwezayê, him rewşa debê ye nûh ku nişkê va hatibû guhastinê bona kurdên nefikîr bibûne bobelata ser bobelatê.

Kurdên ku havîna li zozana, payîz-zivistana li gundên xwe ye ser arana jiyana xwe derbaz dikirin, naha bêgav mabûn û bin çavdêriya wekîlên hukûmetê da kanên komirê da kar dikirin. Her ro jî li vê malbetê, li wê malbetê şîn-girî bû, ji ber ku mêr-xortên kurdan ziman nizanibûn qe na têxnîkayê hîn bin, geh diketine bin qezîyayê dimirîn, geh seqet dibûn.

Lê belê, jiyana ku nefikirinê da, koçberiyê da dadibarî roja reş e dijwar bû. Me jorê got, wekî mêr-xortên kurdan ne çêker bûn, lema jî zû zû emirê wan dihate qusandinê.

Diya nivîskarê paşerojê Gulistana Îsa jineke rûken, beşerxweş û zarşîrîn bû. Ewa ji şayî-şîna nedîma û li wir ciyê wê yî birêz hebû. Dema ewa diçû şayî-şîna biçûkê malê Ahmedê xwe jî bi xwe ra dibir. Bavê wî, Hepoyê Bedo jî camêrekî zane, rûspîkî rûspiyan, meclîs biribû. Ewî hemû nêtên xwe bi mesele-metelokekê va mak û pate dikir. Hema hewasa nivîskar e ber bi zargotinê ji wan salan di kûraya dilê wî da xwe ra hêlûnê çêdike.

Civakiyê da rewş çiqasî dijwar be jî gel gotiye: “Şîn û şayî birê hev in”. Kilam, gerokên ser şîna, yên li şayî-dewata da strayî, awaz, miqamên reng bi rengî, çîrokên ku dayîkê şevên zivistanê zarokên xwe ra qal kirî çawa gir ser girê da tê û dawiyê da dibe nexş, a usa wekokên zargotinê hiş-sewdayê Ahmedê biçûk da dihatine hûnandinê.

Alîkî dinê da nefikirin jî qîra bi qîr bû. Destûr tunebû mal-malbetê qewm-pismama gundekî, yanê jî avanekê da bihatana hêwîrandinê.

Mala apê nivîskar 2-3 km dûrî avana Kok-Yangakê, li kolxozaya “Oktyabr”ê hatibû edîlandinê. Di nava wan da posta eskeran hebû. Destûr nedidane mezîna herîne serkêşîya qewm-pismaman. Lê dê-

bavê, qe na, heftê carekê Ahmedê biçûk dişandine mala apê. Ewî hey derdê van wan ra dibir, derdê wan jî van ra dihanî. Di wê rojê da jî derdkêşî bû para Ahmed.

Her didemên şayî-şînan, civînan, tore, pêşk , rêza ku biçûkan mezinan ra datanîn, erf-edet, qanûnên gel yên nenivîsar roj bi roj di mêjûyê nivîskarê pêşerojê da dihate neqîşandinê. Wê demê kesî nizanibû, wekî ew neqş û nîkên gel wê rojeke “Adar”ê, dema “Emir Gul Vedide” bi “Bawerî”ke mezin wê ser kaxezê sipî mîna rengê emenî, xurc, fermaş, carcimên cure cure bêne “hûnandinê” û bibi-ne melhem bona romana wî “Birîn”ê.

Sala 1947an dewleta Sowêtê bi fermî destûrê dide, wekî yên nefî-kirî, kî dixwaze dikare vegere ciyên xwe ye berê. Payîza vê salê bi sedan malbetên kurdan ra malbeta Hepoyê Bedo jî berê xwe didine Ermenîstanê. Lê gava Ermenîstan pê dihesa ku kurd careke mayîn dixwazin bêne cî-warên xwe, ewana ber Moskva Sor pirsê bilind di-kin ku ji welatên dereke ermeniyên “zêrandî ” vedigerine Ermenîs-tanê, ciyê rêspûblîkê teng e. Bona vê meniyê jî gava êşalon-rêz-malên kurdan gihîştine axa Azerbaycanê, nehiya Yêvlaxê wekilên hukumetê ew hêsrên kurdan li vê derê didine xweyîkirinê û wan kurdana li gundên nehiya Yêvlaxê, Xanlarê, Qasim-Îsmaylovê û cî-warên mayîn “cî dikin”. Ahmedê Hepo li vira, li avan-sovxoza “28 Aprêl”ê dibistana navîn koma 10a xelaz dike.

Bona xwendina bilind bistîne bi şêwira dê-bavê Ahmedê Hepo sala 1959a tê Rewanê (Yêrêvan). Ser hîmê qanûnên wan sala, gotî kî dersxana deha kuta dike, salekê deranînê da karê bike. Paşê dika-re xwendinê bidomîne. Ahmedê Hepo sala 1959a dikeve zavoda ku parên avtomobîla çêdike û weke salekê paletiyê û di vê rojê da dest bi serpêhatiya jiyana wî ye duda dibe û him jî kela efrandariya xwe derdixe holê.

Hema di nava saleke paletiyê da dunyake nûh ber Ahmedê Hepo vedibe û ew gellek tiştî dihesa. Wê yekê dihesa ku gelê kurd ra him kurdên musulman dibêjin, him kurdên êzdî. Ziman yek, erf-edet; lê ol cuda. O agiro tu mala neyara kevî çawa hêsa ev yek xwe ra kiriye

çeka birakuştin, malwêrankirin, kerîkerîkirinê.

Pêwîst e em bi çend rêzan çarmedora civakî-çandê ye wê demê ber çavên xwendevana ra bidine derbazkirinê. Di aqara Yektiya Sovêta berê da ber bi kurdan siyaseteke durû didane ajotinê: Kurdên musulman didane nefîkirinê boy kurdên mayîn mafên çandî-xwendina bi zimanê weşandina rojnamê, kitêban, bernameyên radiyoyê hatibûne xuliqandine.

Ji vê sedemê jî di nava kurdên ne nefîkirî da êpêce rewşenbîr, helbestvan, nivîskar, ulmdar û karkerên mexlûqetiyê pêş da hati-bûn. Ahmedê Hepo bi van gişka dihesa bi merîfet, kirinên xwe ye ketî va dikeve nava vê behra ronahiya netewî û gav bi gav pêş da gav dide. Nava wedekî kin da Ahmedê Hepo hînê elîfba kurdî dibe û ji hal-wext, rewşa zavodê gotaran dinivîse, rojnameya “Riya Teze” da dide weşandinê, him jî rewşenbîr, helbestvan, nivîskar, ulmdarên kurdan ra dibe nas: Nado Maxmûdov, Heciyê Cindî, Erebe Şemo, Eliyê Evdilrehman, Qaçaxê Mûrad, Casimê Celîl, Sehîdê Îbo, Emerîkê Serdar û gellek gellekên mayîn.

Ahmedê Hepo sala 1960î li Rewanê qebûlî înstîtûta pêdagogiyê dibe û sala 1964a wêya bi serfîniyazî xilaz dike. Nava salên xwendinê da gotar, serpêhatiyên wî, wekokên zargotinê ye wî beravkirî rojnameya “Riya Teze” da ronahî dibînin, bi radiyoyê têne belakirinê. Hê gava ew xwendevanê înstîtûtê bû berevoka serpêhatiyên wî ya bi navê “Adar” bi serkariya sedrê Sêksiya (beş) Nivîskarên Kurdan Heciyê Cindî tê enenekirinê û sala 1965a bi rêdaktoriya doktor-nivîskarê bi nav-deng Sehîdê Îbo ronahî dibîne.

Ew kitêb wî ra navê nivîskariyê tîne. Sala 1965a kurdzana dunê eyan Margarîta Rûdênko nameke xwe da dinivîse: “Min kitêba we ‘Adar’ xwend. Ewa xweşa min hat. Ez bawer im, wekî beqî qelema we wêjeya kurdan di aliyê rastesere nivîsarê da wê pêş da here.”

Piştî kutakirina înstîtûtê Ahmedê Hepo rêdaksiya rojnameya “Riya Teze” da dikebe xebatê. Di ser gulvedana efrandariya wî da bandora salên karkirina rêdaksiyê pirr û pirr bûye. Nivîskar sala 1970î ji Rewanê bar dike û bi malbeta xwe va tê serbajarê Azerbay-

canê-Bakûyê.

Ji wê salê hetanî sala 1998a Îdara Sereke ya Çapemeniyê da parastina sura dewletê –senzûrayê - da pêşiyê çawa sênzor-rêdaktor, paşê serwêrê parê karê dike.

Rewşa kurda ye siyasî-civakî li Ermenîstanê û Azerbaycanê ji hev cuda bû. Eva ji siyaseta Yektiya Sovêtê ye here qilêr bû. Pey salên 30î bona weşandina wêjeya kurdî li Azerbaycanê tu mecal tunebûn.

Rast e, li Akadêmiya Ulma ya Azerbaycanê da parek hebû, kîjanê bi azerbaycanî ser dîrok û wêjeya kurdan lêkolîn dikir. Zaniyarên mîna Rehîm Qazî, Elî Gelavêj, Husêyn Kurdoxî, keça azerî Zûmrûd Şefiyêva û yên mayîn kar dikirin. Xênî van zaniyarên ku vê beşê da kar dikirin Şamîl Eskerovê ku li nehiya Kelbecerê dijî jî vê parê ra miqîm hatibû girêdanê. Van zaniyaran her yekî di hindava xwe da karên berbiçav dikirin û bi destî wan kurdzaniyê ra girêdayî efrênîkên bi pesn hatine weşandinê.

Destpêbûna salên 70î doktorê ulmê fîlologiyê Kinyazê Îbrêhîm bi kar-efranîkên xwe va heleqetiyên wêjeya kurdan û azerbaycanê derxiste holê.

Lê mixabin li Azerbaycanê bi zimanê kurdî tiştekî ronahî nedidît. Evê yekê Ahmedê Hepo neditirsand, ewî bi zimanê dê him dinivîsî, diefirand him nehî , gundên Azerbeycanê digeriya, kêderê kurd dijîn, çawa dibên, dibû mêvan, zargotina kurdan berdinivîsî , berav dikir . Bi hîvîke mezin ew çav lê bû, wekî rojekê Azerbaycanê da destûr ê bê dayînê û bi kurdî qiniyatê bêne weşandinê. Bona wê jî sala 1971ê ew Kommerkeziya Partiya Kommûnîstiyê ya Azerbaycanê ra namê dinivîse û hîvî dike, destûrê bidin bi kurdî kitêb bêne weşandinê. Nama wî dişînine Komîtêya Dewletê ye Çapemeniyê ya Sovêta Mînistêrêd RSS Azerbaycanê. Awa Komîtêya Dewletê ye Çapemeniyê 15ê sibatê sala 1971ê bi fermî Ahmedê Hepo ra nameke bersîvdariyê dişîne: “Hevalê Ahmedê Hepo yî birêz! Girêdayî nama we ya ku ji Kommerkeziya PK Azerbaycanê şandine ser Komîtêya Dewletê ye Çapemeniyê em we didine agahdarkirinê, wekî hê weşanxanên Rêspûblîkayê da mecal tunenin ku bi kurdî kitêban bide-

ne weşandinê, ji vî sedemî jî em nikarin daxweza we bînine sêrî.”

Evê bersîvê jî ew ji ruh nexist, ewî nivîsara bi zimanê dê domand.

Kitêba xwe ye duda ya bi navê “Emîr Gul Vedide” sala 1975a li Rewanê da weşandinê. Evê pirtûkê navekî daha jî bilind nivîskar ra anî.

Lê ewî hey dicatedand, wekî di Azerbaycanê da pirtûkên bi kurdî bêne weşandinê û baweriya xwe qet nedibirî.

... Me destpêkê da jî çend caran wekiland , wekî nivîskar Ahmedê Hepo bi zargotin, erf-edetê gelê xwe va mezin bibû, hizkirina ber bi zargotinê hê sê salî bûnê, gava poyêz-tirêna barbir du meha zêdetir dikire çeçeçeq, kufekuf, hêsîrên kurdan ku da dibir kesî nizanibû; dilok, kilamên şînê yê dayîk-xûşkan hevanî , di nava ruhê wî da hatibûne hilçinandinê .

Lema jî hema salên ku înstîtûtê da dixwend bi hînbûn û beravkirina wekokên zargotinê yên mîna beyt-serpêhatiya, çîrokan, dilokan, kilaman, şîret, pêkenîna û yên mayîn va mijûl dibe, him jî diefirîne.

Behrê vê keda wî di ser hev da hatina pirtûkên bi wekokên zargotinê yên ku ulumdar-folklorzanên cuda cuda (Heciyê Cindî, Margarîta Rûdênko) amade kirinê da jî tê kivşê.

M. Rûdênko pirtûka xwe ye “Poyêziya Kurda ye Şînê” da (Moskva, weşênîka “Naûka”, sala 1982) dinivîse: “Nivîskarê kurda yî eyan Ahmedê Hepo di beravkirina qiniyetên zargotin û êtnografayê da timê bûye alîkarê min”. Heciyê Cindî pêşgotina pirtûka “Meselok û Xeberokêd Cimaeta Kurda” ya weke 800 rûpelî, sipasiya xwe dide gellek rewşenbîra, xwendevanên îstîtûtan yên wan sala, usa jî bi dilgermî navê Ahmedê Hepo dikişîne.

Nivîskar temamiya jiyana xwe da bedewnivîsarê ra tevayî berev-
kirin, şîrovekirina zargotinê va mijûl bûye. Dema li Azerbaycanê destûra weşanên bi kurdî tunebûn, ewî êpêce karê zanistiyê, lêkolîn ser zargotina kurdan kir. Nava salên 1974-1976a gotarên wî ye pîrr hêja kovarên wê demê ye here baş da hatine weşandinê.

Gotara wî ye bi navê “Ruhên Di Dastan Da Dijîn”, ya ku sala 1976a kovara “Azerbaycan”ê da ronahî dibîne û yên rûpêlên “Efranî-ken zanîstiyê” dixemilînin di wêjeya Azerbaycanê ye bedewetî û zanîstiyê da qewimandinên pirr giring bûn. Ji ber ku bi van gotaran va ewî dunêdîtina gele kurd, dewlemendiya zargotina wê, peykêlê wêjeya nenivîsar, yên ku bi hezar salan va ji aliyê gel hatiye xuliqandinê bi cêribandina xwe ye sala ya, bi mêzîna xwe ye nivîskariyê va li Azerbaycanê da naskirinê. Çawâ gotaran da jî dibêje di nava xêzîna folklorê dunyayê da para kurdan jî heye. Ew gotarekê da dinîvise: “Di nava xezîna peyvên dunyayê da beşekî mezin karîbarên folklorê digirin, yên ku sed salî nikarin zer kin, biweşînin. Di vê xezîne da para kurda ye xwexwetiye jî heye.”

Bi ronahîdîtina van kara civakî ya kurda ye li Azerbaycanê dihatê pîrozkirinê. Mirov dest bi dest van kovaran digeriyan. Salên derbaz bin, ew qinîyet-gotarê daha bilind hêjaya xwe bistînin.

Nava efrandariya Ahmedê Hepo da wergerandin cîkî berbiçav digire.

Ewî êpêce efrandinên nivîskarên Azerbaycanê, yên mîna Mêhdî Hûseyîn, Enver Memmedxanlî, Mîrze Îbrahîmov, Gulhusêyîn Huseyînoxlû, Suhrab Tahîr û yên mayîn wergerandîye.

Xwendevan ev serpêhatiyana xwendinê tê dernaxin, ku ewana ji zimanekî dinê hatine wergerandinê. Hema cî ye bê gotinê, wekî zimanê Ahmedê Hepo yî nivîsarê him dewlemend, him şîrîn e. Çavkaniya vî zimanî ji dewlemendiya zargotinê tê.

Ji sala 1985a virdatir hêj stûnên Yekitiya Sovêtê ketin û ro bi ro dêmokratiyayê gav davît.

Destpêbûna sala 1990î destûr dan, wekî bi zimanê gelê hindikji-mar, (Azerbaycanê da) çawa talişa, kurdan, lezgînan kitêb, rojname bêne weşandine.

Di ve pirsê da jî Ahmedê Hepo bû mizgînîanî. Povêsta wî ye “Bawerî” ronahî dît.

Ev pirtûka zûtirekê di nava hemû kurdên aqara Sovêta berê

bela bû. Ji rêspûblîka Gurcistanê, Qazaxistanê û rêspûblîkên Asiya Navîn ser navê nivîskar bêjimar name dihatine stendinê. Xwendevanan spasiya xwe ye mezin digîhandine torîvan û didane kivşê, wekî ewana bi qewm-pismam beravî cîkî dibin, bi bînekê va “Bawerî”yê dixûnin. Çend rêz ji nama ku, ji Rêspûblîka Qazaxistanê, bajare Cambûlê xwendevan şandiye, dinivîse: “Birao, min pirtûk stend, îcar min dest pê kir xwend, vê lehzê birê min ji bal min bû. Ew ji bal min nediçû digot, Nûredîn, mesene bixûne ... Bişîne mal, bila Bavo jî zara ra bixûne.. Sibê dîsa di hate cem min rûdinişt, digo bixûne.” Dîsa ji Qazaxistanê, bajarê Karataûyê xwendevanek dinivîse: “Gelek mêvan têne mala me, em kitêbê wan ra nîşan didin, ewana gellekî şa dibin, wekî hûn wan kitêba dinivîsin, navê kurdan derdixin. Gişik ji we razî ne”. Yek jî dinivîse, wekî em hîvî dîkin, çend kitêba bişîne, em ê wêya bidine şagirtan û pey dîsa ra bixûnin, hînî zimanê kurdî bin.

Piştî ronahîdîtina “Bawerî”yê nivîskar bi dehan namên awa distend.

Çawa gel dibê: “Êl maka mêriv e.” Eva hêjake bilind e. Li Qazaxistanê rojnema “Sibe” derheqa vê pirtûkê da gotareke bi navê “Reşxemilandina Dîroka Me” daye weşandinê. Çend rêz ji wê gotarê: “Çawa eyan e neyekbûna gelê kurd bûye belgeyê reşxemilandina dîroka me. Ev yek û usa jî pirsên emrê mayîn povêstê da cîkî berbiçav digirin.”

Pey van nêta ra me tê ra dît ji nameke zaniyarê ulmê kîmyayê yê navdar akademîkê Akademiya Qazaxistanê yî Ulma Nadîrê Kerem Nadîrov çend rêzbêjan jî bidine enekirina xwendevana, bila ewana bi xwe hafiye derxin .

“Gulhusêyn (Gulhusînê Heso, doktorê ulmê kîmyayê, ewledê gelê kurd î zaniyar bû. T.R.) selama te gîhande min, kitêba te anî, da min. Gellekî, gellekî sipas dikim. Min bersîv hinekî derengî xist bona vê sebebê. Min dixwest bixwînim, him fikira xwe binivîsim him razîbûna xwe bişînim. Min van rojê eydê da ew serî heta binî temam xwend. Wekî tu îna bikî , bila nivîskarên me ye kurd nexeyîdin,

cara peşîn e qewata min, mehebeta min, dilxwestina min û hemdê min têrê kir ku ez temam bixwînim. Ez hesab dikim wekî kitêba te tişteki kilasîk e, him mehna xwe da, him aliyê edebiyatê da, usa jî aliyê şikilkîşandinê da.”

Azerbaycanê serbestî destanînê şûn da bi kar-zehmetê Ahmedê Hepo tevî çend ronahîkarên kurd, li rex fonda çandê ya rêspûblîka Azerbaycanê Navenda Çanda Kurd “Ronahî” hate damezirandinê û sala 1991ê 21ê meha sêntyabrê ev saziya ji aliyê Wezîriya Yûstêsiyayê hate navandinê. Ahmedê Hepo bû sedrê vê navendê yî yekem.

Damezirandina Navendê kela netewiyê di nava kurdên Azerbaycanê da daha jî gur kir. Navend roj bi roj rêspûblîkayê da û ji wê derê hate naskirinê. Sala 1992a qewimandin, kirina navendê ye here mezin bû ew, wekî rojnameya “Dengê Kurd” ronahî dît. Ahmedê Hepo bû rêdaktorê wê yî yekem û di nava wedekî kin da desta rojnamevana, rewşenbîra, helbestvan û nivîskaran dora xwe civand.

Pêwîst e bi şêkirdarî ewê yekê bîne ser zara ku di van pirsên ferz da xatirnasiya Ahmedê Hepo, ya di nava civakiya Azerbaycanê da hebû weynekeke giring list.

Ber ewqas karê civakiyê ra nivîskar dest ji efrandariya xwe na-kişîne, him jî dibe rênîş û rêdaktorê çend kitêban, yên ku Bakûyê da ronahî dîtine.

Kitêba helbestvan Qadîrê Motî “Bi gazin im, dunya” (Neşriyata Azerbaycanê ye Dewletê, Bakû, 1993), Bariyê Bala “Ku da herim” (Neşriyata Dewleta Azerbaycanê, Bakû, 1994), Bayramê Fetî, “Pirtûka Azerbaycanî-Kurdî ya axaftinê” (“Azernesr”, Bakû, 1994), Bayramê Fetî “Elîfba” (Weşîneka “Maarifê, Bakû, 1996), Qadîrê Motî, “Bêpar im dunya” (Weşîneka Dewleta Azerbaycanê, Bakû, 1999).

Di ronahîdîtina van kitêba da kar û keda Ahmedê Hepo heye. Lê qewimandîneke şabûnê ye mezin bû ew, wekî ji behrê pênuşa Ahmedê Hepo sala 1996a romana wî ye “Birîn”ê ronahî dît.

“Birîn” ji birîna pareke gelê kurd, ya ku hatiye nefîkirinê, bi zîmanekî zelal, bi bedewî, lê bi şewat qal dike.

Em nikarin navê kitêbekê jî neyne holê, ew jî ew e, ku sala 1999a Ferhenga Şamîl Eskerov, ya Kurdî-Azerbaycanî, Azerbaycanî-Kurdî û Mişarên Zimanê Kurdî tê weşandinê.

Sala 1993a bersîveke bi xêrê nava kurdên Azerbaycanê da bela bû.

Şîrketa Têlêradiyoya Rêspûblîka Azerbaycanê ser hîmê fermana prezîdent biriyar kir bi programa “Arazê” heftê du cara bernama zimanê kurdî bê dayînê. Ew yek emir da hate miyaserkirinê û Ahmedê Hepo bû rêdaktorê wê yî yekem. Van gişka ra tevayî daxweza nivîskarê kurd, endamê Yektiya Nivîskarên Azerbaycanê Ahmedê Hepo ew weşandina wekokên zargotina gelê kurd e, ku ewî salên dirêj amade kiriye û mîna pisporekî vê karê, ew nivîsiye, beş beş kiriye, jê hez kiriye.

Dawiyê da em dixazin rawestê bi nêteke nivîskar dayîn : “Kîngê gelê kurd bejina dara azayê xemiland, ez zêndî bim, yanê jî mirî bim, çarenûsa min ê sipî be”.

Tamara Refo,

Sala 2000î, meha nîsanê

Serbêjek

Xwendevanên hêja!
Çawa gelên Rojhilatê ye mayîn, usa jî gelê kurd xwedanê zargotineke dewlemend e. Derheqa wê dewlemendiyê da pîr-hindikî hatiye nivîsarê.

Nêta me ye sereke ne ew e, ku em ser her wekokeke zargotinê beyt-serpêhatîkê, çîrokekê, kilamekê, dilokekê, meselê-metelokekê, pêkenîkekê, têderxistinokêkê û yên mayîn bisekinin, wana parzûnê lekolînê ra derbaz kin, lê daxweza me ye mezin ew e, wekî ji wan peykelan hineka bidine weşandinê û ji undabûnê bidine xilazkirinê. Bona vî meremî ew karîbarên giranêja yên ku me bi salan ji gel bernivîsiye û bi riya weşandinê va wana careke mayîn vegerînine gel, heta hetayê jiyanê bidine wana.

Berevoka amedekirî beşekî kara me ye salan e. Me ew wekokên zargotinê binge hî ji kurdên ku komelên Piştakfakazê dijîn bernivîsiye. Dawiya berevokê da navê wan kesan kişandiye, yên ku qiniyat-bintar me ra gotine.

Me her navê wan kesa nekişandiye yên ku pêkenîn qal kirine. Hê

biçûktî û ciwantiya xwe da min ewana payê pirr ji bavê xwe Hepoyê Bedo, ji diya xwe Gulistana Îsa bihîstîye, rehma Xwedê li wan be, ku zarotiyê da min ra bûne dersdarê zargotina me ye kimkimî .

Xênî çiqilên folklorê yên cuda cuda me tê ra dît, ji. wan gotaran, yên ku me derheqa zargotina gelê kurd da nivîsiye, qe na, yên here ferz rex wan peykelên dewr-zemana bidine weşandinê. Çima?

Em awa dişêvînîn dema mirovek diçe mûzêyekê ber wênêkî dîrokî disekine, mêze dike û çawa pewîst e nuqî nava qewimandinên bihurî nabe, derbaz dibe diçe, lê gava salixkarê mûzeyê, derheqa wî wêneyî da şîrove dike hewasa te, zanebûn-hizkirina te ber bi wî wêneyî daha jî zêde dibe. Bî dîtîna me ev gotarên berevokê da ronahîdîtî , wê weynekeke dunêdîtina gel bilîze.

Dawiyê da dixwezim xastineke xwe ye here evra bigîhînîme xwendevanên pirr bi rêz. Ger nişkê va Xaliqê Jorîn careke mayîn jiyan bida min, min ê hemû salên jiyanê xwe rewayî beravkirin, amedekirin, bernivîsara zargotina gelê xwe bikira, ji ber ku erf-edet, zar-ziman, rûpêlên riya şerkariya azadariyê, baweriya roja sibê ye geş di nava wê xemilê da hatiye parastinê. Gava tu dikevî nava wê, ewa barê dîrokê yî giran mîna neynûkeke zelal dide kivşê. Ewledên gelê efirandar ev barê dîrokê yî giran hildaye ser xwe, lê çirokbêj, stranbêj, dengbêjan bi sal-zemana hemû çiqilên zargotinê bi xwe ra dane jiyanê, ji silsiletekê derbazî ya dinê kirine. Îro em deyindarê wê yekê ne ku ber her efirandineke gelê xwe hên biricifin û nehêlin ewana benê bîrkirinê, yanê jî hineke mayîn li wana bibine xweyî.

Ahmedê Hepo

Nivîskarê kurd,

Endamê Yekîtiya Nivîskarên Azerbaycanê

I

Beyt-Serpêhatî

“Cimeta Kurd (Kurmanç) ji zemanê qedimî heta roja îro zargotina dewlemend û nexş-nîgar efrandiye: hikiyat (çîrok), beyt, beyt-serhatiyê mêraniyê û bengîtiyê, kilamên reqasê, şîna û şaya, meselok û xeberok û yên mayîn.”

Prof. Dr. Heciyê Cindî

“Di dîrokê de, gelek caran gelê kurd ji bo parastina rûmet, jiyan û hebûna xwe destanên berxwedanê yên ku mirov nikare bi hêsanî bîne ser ziman afirandine.”

Jan Dost

Eliyê Xarziya

Têlî Hemze kubra sivê ra ji xewê rabû, derkete derva hinekî dorberê xwe mêze kir, paşê bi dengêkî hormîn gazî Temo kir:

-Temo lawo, zanî çi heye? Min îşev xewnê xirab dîtine, Eliyê Xarziya qe ber serê min neçû.

Îja hilda bi kilam got:

-Îşev min bire xewnê xirab dîne,

Rabe Hoko ji tewlê bikişîne,

Zîn-bûsat li piştê xîne,

Tengekê sist ke, duda bişidîne;

Lingê xwe têke zengûya zîn e,

Şextê Têhranê, zozanê Celaliya,

Gera ortê, nîveka çiya,

Xwe mala Ûsivê Cazê ra bigihîne,

Binê aliyê Eliyê Xarziya da,
Tiştê xêrê heye, yanê tune?
Bi gotina devê Hemzê ra Temo rabû ber bi tewlê çû.

Temo dike dilezîne,
Hoko ji tewlê dikişîne,
Zîn-bûsat li piştê dixîne,
Tengekê sist dike, duda dişidîne.
Lingê xwe dike zengûya zîn e,
Xwe gêdûka jêrîn ra digîhîne.
Siyarekî gêdûka jêrîn divîne ,
Ewî siyarî Ûsivê Cazê dişêvîne.
Qamçîkî navtenga Hoko dixurîne ...

Tu nevê Ûsivê Cazê jî tê here mala Têlî Hemze bona mesela Eliyê Xarziya. Li gêdûkê ew Temo rastî hev tên. Pey salam-kelamê ra Temo pirsî:

-Ûsivê Cazê, bextê te, mal-halê te me, aliyê Eliyê Xarziya da tiştêkî xêrê heye, yanê tunînê?

Ûsivê Cazê vê sivê mîna kaniyê kire bilqebilq, dilê wî tijî bû, got:

-Temo lawo, do ezî Hesenqela Jêrîn bûm,
Li Hesenqela Jorîn bû zingîn e,
Ezê çûm siyarî Mînbaşî , Mihê Onbaşî ,
Hevt jandarmê Romê va ber kelê sekinîne.
Zêrekî deha min piçenga Siyarî Mînbaşî da,
Rê bide min da ez ê girtiyê kelê bivînim.
Çi min tîna xwe dayê da,
Eliyê Xarziya destê wî kelemçê da ne,
Lingê wî ye lelê da ne,
Li peşiya bîst çar girtiyê kurmancan e,
Bi mirûz, bi mede rûniştiye.

Ûsive Cazê çawa bi kîlam, usa jî bi devko Temo ra şîrove kir:

-Eliyê Xarziya min ra got, wekî Ûsive Cazê, bextê mêrê çê me, tu

cawê bide Têlî Hemzê xalê min, bê Eliyê Xarziya digot, Siyarî Mînbaşî, Mihê Onbaşî pûte zêr xûna min stendine, îşev na, şeveke dinê, sehet yekê, nîvê şevê, wê min û bîst çar girtiyê kurmanca va ji kelê derxin. Wê me ji kevirê Deveboyîne derbaz kin, bigihînine Erzurûma rengîn. Ser ewraqê min nivîsîne, yanê sed yek sal e, yanê jî gulebaran e. Bê Elî digot, xuzila roja îroyîn tu dewsa min bûyayî, ez dewsa te bibûyama. Qesem ber dergê Xudê bûya, min nedihîşt berê wî bidana Erzurûmê.

Temo û Ûsive Cazê îdî nesekinîn paş da vegeriyan. Têlî Hemze dûr va siyar dîtin.

-Dilê min dibêye, ha dibêye,
Têlî Hemze misînê avê li dest da ye,
Dike karê du rikatê nimêja sivê ye.
Bala xwe dide Temo lawê wî ye,
Ûsivê Cazê jêl va tê ye.
Dest davê sola, gora ra nagihîne,
Biniya malê pêşiyê Ûsivê Cazê distîne,
Divê Ûsivê Cazê bextê te me,
Bêje tiştêkî xêrê heye, yanê tunîne?

Ûsivê Cazê mesele monik monik Têlî Hemze ra qise kir. Vê şûn da xêr-xaşî lê barî, kevir-kuçik Têlî Hemze barî, êgir girte qafê wî û gote kur:

-Temo lawo, defa hewarê bixîne,
Hezar hevsid siyarê eşîratê bicîvîne.
Sî siyarê xalçê, bavçê nav derîne,
Cotê yaşîkê cebirxanê,
Kêleka menegiyê xîne,
Ez çûm tu kekê xwe bigihîne.

Temo defa hewarê da lêdanê, ji nava mera sî siyar bijart, cebirxane menegiyê kir, helan da siyara pêberjêr pey bavê rast kir, xwe Hoko ra gîhand siyar bû, hinekî dûrî malan ketinê Huca diya wî hê bi meselê hesiya, ka binê çi dike, çi dibê kur:

Hucê dike dilezîne,
Dewil-dawa xwe hiltîne,
Sê cara li Temo dike qûrîn-qûjîn e.
Lawê xwe ji ser oxirê vedigerîne,
Divê bêje bavê xwe, bê diya min digot:

-Navê meraniyê te heram be,
Laçika min serê te be,
Hetanî Eliyê Xarziya venegerîbe,
Mirina te hebe,
Vegerandina te tunebe.
Hê dadide misîn e,
Avê pey kur direşînê.

Temo xatirê xwe ji dê xast û xwe siyara ra gîhand.

Bintara gêlî gihîşte bavê û Ûsivê Cazê. Têlî Hemze siyarê hatî nihêrî û ber xwe ket, gote kur, wekî lawo, evan siyarana gişk cahil in, vana dew-doz nedîtine, te gerekî mêrê pijiyayî, şera da qalbûyî bihaniya. De tişt nake.

Temo jî tema dê gotê. Hê rê ketin. Siyara kubra sivê ra xwe kevirê Gewrikê Jerîn ra gîhandin. Vira ji hespa peya bûn, hinekî bîna xwe standin.

Nişkê va Têlî Hemze ji kur pirsî:

-Lawo, te qe navtilî anîne?

-Na, bavo.

-Lawo, mala te xerab nebe, min xwe şaş kir, lê te ra çi bibû? De, îdî em dûrî malê ne, lê nêzîkî gundê Xalitê Reşê ne. Ew dest dike peleguha xwe hêrsa diqîrîne:

-Temo lawo, rabe bike bilezîne,
Teng-qûşê Hoko bişidîne,
Xwe mala Xalitê Reşê ra bigihîne,
Bê kekê min tu gellekî selam dikirî,

Evan qeziya han min qewimîne,
Xerclixa siyarê min tunîne,
Min ra sed zêrê Reşatî bişîne,
Vegerînê pêncî selem bistîne ,
De lo lo, lo lo, lo xalo!

Temo go:

-Bavo, min qe Xalitê Reşê nedîtiye, ez nizanim nav-nîşanê wî çi ne?

Bavê bi hêrs got:

-Wexta tu kurê min î, tu yê herî bivînî, na, xêr, eger ji kelefana î,
riya Eliyê Xarziya da here neyê!

Paşê ewî dest avîte simêla xwe ye reş e palik bada:

-Lawo, em ê îşev vira şevger bin, sivê em ê kevirê Girgewînê Jorîn
bin, warê wira .

Îdî Temo tu gilî-gotin newekiland, mina siyarê qitîkê piyê xwe
kire zengûyê û serê Hoko pêberjêr berda.

Berbangê xwe kewşenê gundê Xalitê Reşê ra gîhand. Ji yekî mala
Xalit pirsî û ajote wir. Xalitê Reşê derê malê sekinîbû.

Dilê min dibêye, ha dibêye,
Xalitê Reşê bala xwe dide deştê ye,
Siyarekî bi çevê xwe dibîne,
Temo nas nake, Hoko dişivîne .
Dil jan dide, dilerizîne,
Hew zane cerda Têlî Hemze ye,
Direve dikeve malê ye.

Hespê Temo, Hoko hespekî mîna Qiratê Korogîlî bûye nav-nîşan.

Riya sê roja, dan nîvekê diqedîne. Heta tevzî paş-pîlê Xalit da jan
didin dinihêre ew Têlî Hemze nîn e bi kulzikî dertê derva. Temo
selamê dide û gotina bavê dibêjê. Xalitê Reşê dibê:

-Belê, lawo, selam selama Xudê ye,
Kerem ke aliyê odê, şûşebendê ye,
Rûnê ser kulavê Xuristanê ye,

Hilde stekana qawê ye.
Lê ma mesela dirava ye,
Quranê jor da tîne,
Destê xwe çar belgê Quranê dixîne.
Temo lawo, danzde kerî pezê min hene,
Sê garan dewarê min hene,
Sê revo hespê min hene,
Welleh mişteriyê wî tunîne.

Temo dibê:

-Apo, xarina nanê te heram be,
Rûniştina ser kulavê te postê berazan be.
Nav-dengê te erdê sar be,
Êl-eşîr bi te şa nebe.

Temo ha got û berê Hoko paş da vegerand. Hema vê qîtê jina Xalitê Reşê bi meselê dihesê. Ewe ser kaniyê, ber kiraşoyê bû, gazî siyarê Hoko kir:

Eyşanê sê cara Temo dike qîrîn e,
Temo ji ser oxirê vedigerîne,
Destê xwe kofiya xwe digerîne,
Sêsid zêrê reşadî ber Temo datîne,
Divê Temo, tu kurê min î qiyametê,
Zêra hilde ser xatirê dayîkê,
Ez bi her çar qulba, Quranê kim,
Gur-gumanê kotîmêrê min,
Tev van zêran tunîne.

Temo ser xatirê Eyşanê zêr hildan, go:

Dayîkê, tu diya min e qiyametê,
Bêje Xalitê Reşkotê,
Bira van erda nemîne,
Ez vegeîrînê, bira çara serê xwe bivîne.

Xalitê Reşê dît, wekî Temo Eyşê hev ra hewal didin , Temo çûnê ew hate bal jinê û pirsî:

-Lê lê, Temo te ra çi got?

-Kula canê te got. Temo go, wekî ez vedigerim wî ra vedigerim. Lo lo, te qe şerm nekir yekî mîna Temo vala verê kir . Hema qe na te ser xatirê Eliyê Xarziya qedirê Temo bigirta. Sed zêr çi bûn, wekî te timayî kir, çima tu tirsîyayî paşê yekî mîna Têlî Hemze zêrê te nedana.

Xalitê Reşê hê poşman bû, bi kilam gote kur:

Mehmî lawo, menegiyê ji tewlê bikişîne,
Xurca zêra li terkiyê bişidîne,
Bilezîne xwe Temo ra bigihîne,
Bê bave min digo ez şaş bûme,
Bira zêra hilde, min bibaxşîne.

Kur vegerî gote bavê, wekî ez şerm dikim, ez naçim.
Dê ji gotina kur wekiland û got:

-Gura meydan nexariye, menegiyê siyar be û bide pey Temo.

Xalitê Reşê menegiyê siyar bû û xurca zêra hilda, da pey Temo, Siyarê Hoko dinihêre siyarekî daye pey wî, lê çi feyde nikare bigihîje wî. Temo tê derxist ku ew Xalitê Reşê ye û tema bavê, kete bîrê wekî rûspiyê êlê ji xwe neêşîne.

Temo devê Hoko şûn da vedigerîne,
Xwe Xalitê Reşê ra digihîne,
Tû dikê, bayê kotîbûnê lê dixîne,
Divê ez vegeriyanê tu bizanibe,
Çara mirina te hebe,
Çara serê te tunîne.

Xalitê Reşê çiqasî kir, nekir Temo zêr hilneda. Ew por poşman paş da vegeriya, Temo dîsa rasteve hate rê.

Temo xwe pişta çiyê digihîne,
Gulekê ser siyara diteqîne,
Xênî bavê û Ûsivê Cazê,
Siyarê bavê yekî navîne.

Têlî Hemze divê:

Lawo, fêza me esmanê hêşîn e,
Evan deran gêdûkê xir-xalî ne,
Min ê evan dera sê cara qaçaxî dîne,
Gede, tu îro bavê xwe nacerbîne.

Temo tê derxist, wekî bavê wî hêrsa gula ser gula ra agir dike,
got:

Keko, her çar qulba kim, her du dîna kim,
Agirê Eliyê Xarziya serê min ketiye,
Serê min dêşe, halê min tunîne,
Mîrata tekeyaxê sor bûye,
Xuberê gula ser çoka min diteqîne.

Pey van giliya ra perça Têlî Hemze danî û vegeirî ser kur:

Temo lawo, bike bilezîne,
Wan bavneçêya, xalneçêya
Paş da bizivîrîne sî siyara nav da bibijêre,
Ewêd mayîn paş da vegeirîne.

Temo xwe siyara ra gîhand paş da vegerand û gote bavê:

-Bavo, min qelet kiriye ez ber te xeber nadim, lê ware em siyara
paş da venegerînin, qe na qeretû ne.

Bav razî bû û ji wir rê ketin. Hatin, derketine gêdûka Gîhadînê.
Vê derê ew ji hespa peya bûn, hesp tewilandin , xwe hatine ser ka-
niyê. Nan- xarina wan tunebû. Têlî Hemze got:

Temo lawo, rabe bike bilezîne,
Xwe mala Feqî Ûsiv ra bigihîne,

Li Senema Jêrîn dimîne,
Bê: “kekê min tu selam dikirî,
Digo ev qeziya han me qewimiye,
Bira nan, pezeke goştî bişîne.”

Paşê bi zar gote lawê xwe:

-Hetanî tu herî-bêyî em ê herin bigihîjine geliyê Meyremê. Lê tu nekeve kûraya gêlî, şiverê ra ware hetanî quntara gêlî. Em ê wir bin, lê olecax e bekî usa bû tu berî me hatî wir, tu dera da meçe, hîviya me be. De lawo, te ra oxir be, rê keve.

Temo berê xwe da Senema Jêrîn çû. Sibê berbangê xwe derê mala Feqî Ûsiv ra gîhand. Selam da Feqî û gotina bavê gotê. Feqî Ûsiv wê sehete kevanî civandin, pezek, dudu da serjêkirinê. Barê nanê loş û qelî hespekî kir û gazî kurê xwe, çend xortêd mayîn kir, got:

-Temo bivin derxine geliyê Meyremê, Têlî Hemze lazim zanibûye bimînîn, na, vegerin werên.

Feqet Temo razî nebû, tenê da ser rê. Danê êvarê gihîşte geliyê Meyremê. Nihêrî kesek tune. Ew ji Hoko peya bû, barê hespê danî, goşt, nava şeltê bûzê da veşart, Hoko destkêş kir dakete bintara gêlî. Hoko tewiland, xwe jî serê xwe danî, raza. Ewî gellekî westiyayî bû. Naha em ji Têlî Hemze wana xeber din.

Têlî Hemze berbangê xwe gêlî ra digihîne,
Bala xwe didê dewsa simê Hoko dibîne,
Agir kezevê dikeve Temo tunîne,
Çevê xwe li daxdewranê digerîne,
Hoko binê geliyê Meyremê da dibîne,

Dibê:

-Mîrmihê, dilê min hînehîn e,
Lawo, tu bike bilezîne,
Xwe qaşê gêlî ra bigihîne,

Agirê Elî yek bû, agirê Temo dudu ne,
 Serê min ketiye halê min tunîne,
 Gulekê, duda biteqîne,
 Destê Temo min bigihîne.
 Gotina devê Têlî Hemze ra,
 Mîrmihê xwe qaşê gêlî ra digihîne,
 Gulekê, duda badilhewa diteqîne,
 Temo serê xwe ji xewê hiltîne,
 Xwe Hokoyê şêr ra digihîne,
 Piyê xwe dike zengûya zîn e,
 Yalîkî gula diteqîne,
 Bayê bezê gêris ji erdê hiltîne,
 Xwe bavê ra digihîne.
 Divê, bavo, bibaxşîne,
 Xewê li min zor kiriye.

Gêlî da rûniştin, nan xarin, lê Têlî Hemze nan nexar. Ewî sond xaribû, wekî hetanî Eliyê Xarziya xilaz neke nişa nîn tehm nake. Nan xarinê şûn da Têlî Hemze, got:

-Rabin, hespa siyar bin, em rê kevin. Riya gêlî sert e, bira Temo bide pêşiyê, em ê bidine pey. Em ê herine mala Îboyê Cindiroglî. Em dujminê hev in, lê ew mêrekî çê ye. Ez ê ser xatirê Elî berê xwe bide me mala wî. Bi reza aqilê min ew tu wexta gedetiyê nake.

Siyara xwe kubra sivê ra gîhandine kewşenê gundê Cindiroglî. Cindiroglî tîpe siyaran deştê dîtinê gote kur:

Evdilbarî, bike bilezîne,
 Daxdewranê kekê xwe ra bigihîne.
 Cindiroglî çevê xwe dirbûnê digerîne,

Vedigere dibê:

-Evdilbarî, tu karê mêvana bivîne,
 Ev siyarana ne esker e, ne lêşker e,
 Siyarê hewar-gaziyan e,
 Siyarê heşînboz zirav ser pêşiyê ye,

Xavikeke sipî dor sêriye,
 Nîşana Hemîdê pêş eniyê ye,
 Kûçikçap orta wî zîn da ye,
 Heşînboz bin da zirav bûye, bûye qendîl e,
 Kefê ser siyarê xwe da weldigerîne.
 Siyar qulap qulap cixarê dikişîne,
 Medê wî ser piştî menegiyê tunîne,
 Min ew siyar sê cara bi çevê xwe,
 Li dew-doza da, oxirmê giran da dîne.
 Têlî Hemze xwe derê mala,
 Cindiroglî ra digihîne.

Cindiroglî xwe xwe ra dibê yekî mîna Têlî Hemze hatiye derê
 mala min, yeqîn tişteki xêrê tunîne. Zehf jî em dujminê hev in, mêrê
 çê rojê oxirmê giran mêra tengasiyê da nahêle. Ew rabû pêş Têlî
 Hemze va çû. Ew hatine dest-rûyê hev. Kêf-halê hev pirsîn, Cindi-
 roglî ew teklîfî odê kir. Mêvan rûniştin. Têlî Hemze ya dilê xwe got.

Îboyê Cindiroglî destê Têlî Hemze da sonda mêra sond xar:

-Navê min heram be vê oxirê da ez pîkî ji te paş da biavêjim.

Paşê Cindiroglî gote kur:

Evdilbarî lawo, bike bilezîne,
 Defçiya bicivîne, defa hewarê xîne,
 Hezar hevsid siyarî bicivîne,
 Sê siyarê xalçê, bavçê nav derîne,
 Li bavê xwe bigihîne,
 Kilîtê devê sandoxê xîne,
 Sî tivingê tekeyax jê derxîne,
 Bira dilê Têlî Hemze ji min nemîne,
 Siyarê Hemze ne sîw sisê ne,
 Siyarê wî sisê ne,
 Ewî dinê nava xelqê da qeretû ne,
 Tivinga bide, dema giran bira,
 Nevêjin padironê me avkêşî ne.

Belê, siyar xweşa Cindiroglî jî nehatin, ewî her Têlî Hemze, kur û
Ûsivê Cazê çawa mêrê çê. siyarê baş hesab kir.

Îboyê Cindiroglî, kurê xwe, yek jî sê mêrê dew-doza da qalbûyî
hespê xwe siyar bûn û bi Têlî Hemze wana ra berê xwe dane mîrata
kela Parsînê.

Epêcekî xurt çûnê, nezîkî kelê rê bûne duda. Têlî Hemze got:

-Cindiroglî, tu bextê xwe em kîjan riyê ra herin. Tu van dera ji
min rindtir nas dikî.

Cindiroglî go:

-Têlî Hemze, tu qe tiştê xirab neke dilê xwe. Rast e, em dujminê
hev in, lêbelê, roja îroyîn em dostê hev in. Ez wê gola heşîn kim, vê
oxirê da tu yê meytê min erdê bivînî, lê qelptiyê navînî. Ma mesela
rê, ez bêjim: Diqewime Elî vê riyê ra jî bînin, diqewime rîya hanê da
bînin. Ware herek me siyarê xwe ra rêkê da herin. Eger Elî aliyê min
da bê, metirse ez ê usa bikim nav bive navê te. Lê paşê te dujmintayî
kiriye, ez ê jî bikim.

Her destê rêkê da çûn.

Hinekî şûn da şepûr lê ket, kodîn rê ket. Siyare Mînbaşî, Mihê
Onbaşî, Eliyê Xarziya pêxas kirin, sapokê wî tijî xoyê kirin, stu da
dar da kirin dane pêşiya bîst çar girtiyê kurmanca û rê ketin.

Ew aliyê Têlî Hemze da hatin. Nezîkî gêdûkê Siyare Mînbaşî, On-
başî hev ra gotin:

-Li gêdûkê dûyê cixarê tê kivşê.

Vê demê Eliyê Xarziya dibê:

-Ew dûyê cixara xalê min e, wexta pêşiye ji we bistîne, me gişka
bi destê zorê aza ke.

Elî ha gotinê Siyare Mînbaşî gihîşt qamçîk, dudu qafê wî da lê da.
Hema vê gavê siyarek rex wan ra derket. Siyar qîriya:

-Ez qasidê Têlî Hemze me. Ewî digot bira Eliyê Xarziya û bîst çar
girtiyê kurmancan berdin, xwe bira bên derbaz bin.

Siyare Mînbaşî keniya û bi kilam got:

-Evan kurmancê serê çîyan e,
Xarine dewê miyan e,
Aqil sêrî firîne,
Hatine pêşiya girtiyê dewletê ne,
Qasid bigirin wayne xar e ,
Paşpîla da lê din,
Kezev-pişikê wî hilşêne,
Nava sapogê ne.

Qasid dît şuxul xirab e, qamçîk hespê xist, paş da vegerî mesele
gote Têlî Hemze. Vê qîtê ewî qîrandê:

-Temo lawo, bike bilezîne,
Xwe pêşiya kodînê ra bigihîne,
Çoka çepê erdê xe, ya rastê hilîne,
Usa lê xe qotika fînoyê ,
Mînbaşî, Onbaşî bifirîne,
Bira ji heyştê çar jandirma yek nemîne,
Min sond xariye bira xûn nerijê erdê ye,
Te dît tiştêkî xêrê tunîne,
Bike bira bikişe goleke avê ye,
Na walleh yeke xûnê ye.

Gotina bavê ra Temo pey hev du gule teqand, qotikê fînoyê Mînbaşî, Onbaşî firand, lê wana da qafê xwe , girtî bernedan, hela serbarê ser gule avîtin.

Pey vê yekê ra Têlî Hemze Temo va mîna teyroka baharê gule barandin, Leşê Mînbaşî, Onbaşî anîne erdê. Vê gava çetin da Cindiroglî pişt ji jandarma stend, lê bû hevteheyst . Jandarma dît ketine telê , yên aqil ew bû hîşt revî, Têlî Hemze qeyd-çîdarê dest-piyê Eliyê Xarziya vekir, girtiyê mayîn aza kirin. Ew Cindiroglî va hatine dest-rûye hev û bext dane hev, wekî pey vê yekê ra dujmintiyê nekin.

Ji vir Cindiroglî wana paş da vegerîn, lê Têlî Hemze Eliyê Xarziya da terkiya xwe û rê ketin hatin gihîştine gundekî. Aşê gund bintara gund da bû, ew nêzîkî êş ji hespan peya bûn, Têlî Hemze got:

-Temo lawo, qe cayîz e em yekî mîna Elî terkiya xwe bivin derxine nav êlê. Em vir hinekî egle vin , tu dakeve gund, binê dikarî hespekî bikire.

Temo dakete gund û hinekî şûn da hespekî zînkirî destkêş xwe kirî hat. Têlî Hemze got:

-Xarziya, ca hespê teze kirî siyar be, serîkî here, ware, ka binê hespê dew-dozan e, yanê na?

Elî hespê siyar bû, serîkî çû, wextê vegeirînê nişkê va gulek teqîya. Gule rast paştîpîlê Eliyê Xarziya da lêket û ew ji ser hespê anî xarê. Evê te hev ketin, lê îdî hemû tişt bê feyde bû. Têlî Hemze qîriya:

Xarziya, xarziya, xarziya ...

Eva çendek e leqetiya nîn nexariye,

Xarziya, li zozana sive ye tavê daye,

Kafirê Feqî gulekê bere Eliyê Xarziya daye,

Bira êl-eşîr top ve tamareke dilê min qusiyaye.

Ûsivê Cazê go:

Eliyo lawo, dilê min dibêye,

Dûmanê girtiye rûyê erdê ye,

Xêrê-ayê navîne kafirê Feqî

Gulekê bere bedena Têlî Elî daye,

Cinyaze vî şengexortî herefê meydanê maye.

Temo go:

Felekê te çima li me ha kir,

Mil û basikê xwe me ra ba kir,

Mala feqî derm-dax ve ,

Çawa nav êlê da kekê min sekesis kir.

Têlî Hemze go:

Dilê min teyrê herî hewa,
Lê dixûne refê qulinga, cote kewa,
Lo xarziya, çevê xalê te rijiyayo,
Feqî emekê xalê te da badilhewa.

Paşê bi posîde gote Temo:

Temo lawo, megirî, melorîne,
Bike-bilezîne xwe Hoko ra bigihîne,
Wexta Roma xayîn ser me da bigire,
Cinyazê Elî ji nav neyara derxîne.

Wana cinyazê Elî anîn derxistin. Êl-eşîrê bi şîn-girî, bi hurmet ew defin kir. Paşê Têlî Hemze sond xar û got, wekî ez ê herim, hetanî Feqî nekujim, paş da venagerim.

Têlî Hemze hat derkete wî gundî, ji wir pirsî, gotinê wekî kalê ber êş Eliyê Xarziya kuştiye. Romê çîn-mêdal daye wî. Ew jî gotin, wekî kalê cîkî ji devê xwe revandiye gotiye, wekî, wextê siyara hesp da rikêfa min hema “ya bext” gulek avît, ku bira nevêjin vî gundî da mêr tunenin. Ew jî çû Elî ket.

Pey gellek çetinaya ra Têlî Hemze kalê dikuje û kincê wî xûna wî da dimewicîne, tîne dide Hucê.

*“Bi hikyata em emirê berê, edet û ra-
bûn-rûniştina cimaetê, xeysetê wê ra dibi-
ne nas.”*

Heciyê Cindî

II

Çîrok

Dundulçûk

Hebû-tunebû, du bira hebûn. Birê mezin mir. Miraz, birê çûk tenê ma. Nava çend sala da çi ku hebûna wan hebû xerc kir; lap bû kasivekî hevalê kasiva.

Miraz rabû çû bal dostekî bavê xwe. Ewî dostê bavê ra got:

-Hine dirav bide min.

Dostê bavê got:

-Qewlekî min heye, eger biqedînî çi bixazî ez ê bidime te.

Go:

-Bêje.

Go:

-Keçeke min e topal, kerr-lal, kor heye; wekî tu wê bistînî kerem ke, çi dixazî bidim.

Miraz fikirî: Canim, ez çawa wê bistînim. Paşê fikira xwe guhast, go ya pak wê bistînim, dostê bavê min mirinê şûn da berdim. Lema Miraz got:

-Ez razî me.

Mêrik ew anî ber oda keçikê û got:

-Dêrî veke, têkeve hundur, keçik wir da ye.

Ew der da ketinê hundur, nihêrî çî, keçikeke usane bedew rûniştîye hişê mêriv dibe. Miraz ciyê xwe da qerisî. Keçikê got:

-Xorto, pêş da were, çima ser piya sekiniyî?

-Ê, tu ye ne kor î, ne lal î, erê?

-Na, ez e ne kor im, ne jî lal im.

-Di riya Xaliqê Alemê ve, ca rave heta dêrî here.

Keçik rabû, çû ber dêrî. Miraz daha şa bû û pirsî:

-Axir, tu ye ne kor î, ne lal î, ne ye topal î, ne ye kerr î, çima bavê te usa dibêje?

-Bavê min bona wê yekê gotiye ez e kor im, çunkî çe'vê xwe bilind nekiriye rûyê kurê xelqê nenihêriye. Bona wê yekê gotiye, ez e kerr im, min hetanî niha guh nedaye giliyê xelqê. Bona wê yekê gotiye, ez e lal im, min rokê devê xwe nedaye ber devê tu kesî, berede berede xeber nedaye, ji vir-viza dûr im. Bona wê yekê gotiye ez e topal im, çunkî tu dera da neçûme. Bavê min rast gotiye, te fêhm nekiriye.

Miraz keçikê distîne.

Wextek derbaz bû, bavê Sînemê mir. Miraz li cem xezûrê xwe îdî hîn bibû, qedrê qezencê zanibû. Rabû, xwe tucartiyê girt. Timê Miraz çûnê kirîn-firotanê, çî zexîre lazim bû jina xwe ra dihişt, diçû. Îcar çûnê dîsa usa kir, lê derengî ket. Zexîra jinê xilaz bû, Sînem rabû, çû bazarê, wekî hine kel-mel bistîne. Li bazarê bazirganek çe'v Sînemê ket û hiz kir. Pê pê pey Sînemê heta mala wê hat. Mala wê nîşan kir, çû cem pîrê. Navê wê pîrê Xezê bû. Ew e gelekî fêlbaz bû.

Bazirgan got:

-Xezê, zanî çî heye?

-Na, bêje binê ?

-Filan malê bûkek heye, ewê bixapîne ji mal derxe, ez wêya bîrevînim.

-Ka, çend zêra bide.

Bazirgan çenge zêr da pîrê. Xeza te rabû, rast çû bal bûkê û got:

-Pî, ez qurbana te me, tu keça xûşka min î. Min diya te va kiribû şer, lema nedihatime cem te. Îro bihîst, wekî tu ye tenê yî, lema hatim.

-Dayka pîrê, lê diya min qe çima min ra derheqa te da tu gilî negotiye?

-Qurbana te bim, dilê wê ji min mabû, lema negotiye.

Paşê pîrê dest avîte fêla:

-Ez qurban, çend roja şûn da dewata kurê min e, gereke tu bêy dewata kurxatîyê xwe.

Pîrê rabû çû.

Bazirgan pirsî:

-Pîre, bû çi?

-Welêh min dûz kiriye . Ka hine dirav.

-Canim, han , çiqas dixazî bidim. Lê bizanibe, ez seva qurîşekî kor meriya dikujim, way halê te, tu dûz nekî.

Çend roja şûn da Xezê dîsa çû cem Sînemê. Go:

-Ez qurban, îro dewata kurê min e, em hinekî lez ketin. Rabe, kincê xwe xwe ke, em herine dewatê. Belqîtiyê kurê min dibê: heta keçxatiya min neyê, defê nakim.

Sinemê rabû kincê xwe xwe kir û xast dêrî va derê, teyrekî wan hebû - Dundulçûk. Ewî got:

-Xanim, diçî, here. Ancax bihêle te ra bûyerekê bêjim, dîsa here.

Go:

-Bêje.

Go:

-Wextekî keçikekê û xortekî tev dixandin. Wana hev hiz dikir. Medrese xilaz kirin, hatine ber behrê, gemiyê siyar bûn û herine mal. Çe'vê gemîajotî kete keçikê. Navê keçikê Perî bû. Gemîajotî gote xort:

-Here hine sîr bistîne, bîne, wekî bixun, ser-behrê dilê we hev nekeve. Xort çû hat, niherî ne keçik e, ne gemî heye, ne gemîajo. Çawa xort boy çûyîna sîrê poşman dibe, ewqasî jî tu yê herî dewatê poşman bî. Dixazî here, naxazî meçe.

Pîrê çiqasî kir, nekir, Sînemê got, naçim ku naçim, here sivê were, ez ê bêm.

Pîrê rabû por-poşman vegerî.

Sivetirê hat, got:

-De rave, axir, dewat seva te sekiniye. Dewatê betal meke.

Sînemê rabû dîsa kincê xwe xwe kir, wekî dêrî va derê. Dundul-çûkê go:

-Xanim, diçî here, lê te nepirsî axiriya gemîajo û Periyê çawa bû?

Go:

-De bêje paşê herim.

Pîrê go:

-Canim, çi tu guhê xwe didî wî teyrê nehiş , were em herin.

Go:

-Na, bira bêje.

Dundulçûk got:

-Keçik û gemîajo hatin derketine wî alî behrê. Gemîajo dibê:

-De rave em herine mala me. Periyê got:

-Lê îdî ez ê ku da herim? Lê pak dibe, ez vira rûnê, tu here merivê xwe bîne, bi edetê êlê min bive .

Gemîajo bawer dike, diçe mal, tê dinihêre keçik tune. Çiqasî gemîajo ser mal çûyîna xwe poşman dive , aqasî jî tu yê herî dewatê poşman bî, hez kî here, hez kî meçe.

Bûk dîsa neçû.

Pîrê go:

-De, lawo, nayêyî îro neyê, ez ê sibê bêm.

Sivetirê Xezê hat û got:

-De rabe, em herin, îro du roj e dewat seva te sekiniye, cimaet hîviya te ye.

Bûkê rabû kincê xwe xwe kir ku dêrî va derê Dundulçûkê go:

-Diçî here, lê qe napirsî, axiriya Periyê çawa bû?

Sînemê go:

-Bêje.

Teyir go:

-Keçik gemîke mayîn siyar bû çû gihîşte bajarekî. Ewa li bajêr pîrr geriya û hat derkete mala pîrekê. Dît ku pîrê tenê ye, go:

-Dayîka pîr, were tu bive diya min, ez keça te û em tev bijîn. Pîrê razî bû. Keçik ma mala pîrê.

Padşahê wî bajarî derd ketibûyê. Şevê çil keçik dibirin li wî bi-nihêrin.

Rokê jî dor gihîşte Periyê. Ewa jî birin. Êvarê padşah hat. Tê cem Periyê, wê got:

-Padşah sax ve , destûrê bide gilîkî bêjim.

Padşah got:

-Kerem ke.

-Padşah sax ve, te ev keçikana anîne, gişk keçikê kasiban in, diqewime wan da jî nexaşî heye. Destûre bide em herin behrê da avê xwe kin, paşê bên.

Padşê dît giliyê keçikê nezîkî aqılan e qayî bû. Periyê keçik hil-dan hate ber behrê. Gemîkê siyar bûn û çûne welatekî dinê. Padşah heta sivê hîviya keçika rûnişt, ew nehatin. Sivê cimaetê hat keçê xwe xast. Padşah rabû terkesalî dunê bû, keça bigere. Çiqasî padşah ser şandina keçika poşman bû, ewqasî tu yê ser çûyîna dewatê poşman vî. Dixazî here, dixazî meçe.

Sînemê got:

-Xatî, îro jî nebû, here ez ê sivê bêm.

Pîre hêrs ket, lê da çû. Sivetirê pîre dîsa hat.

-Lawo, de rave, kincê xwe xwe ke. Ez pîreke kasib im, nanê dewatê xerav dibe.

Sînemê kincê xwe xwe kir ku here, teyir go:

-Xanim, diçî?

Go:

-Erê.

-Lê tu navêjî, keçik wê da çûn, lê axiriya wan çawa bû?

-De bêje, ez herim.

Pîrê sola xwe derxist go: ez ê vî teyrî bikujim, rûyê wî da nanê min pûç dive, bihêle em herin. Sînemê got:

-Na xatî, dest nede teyrê min, bira bêje, em ê herin.

Teyir dest pê kir:

-Keçik çûn derketine welatekî dinê. Ji gemiyê peya bûn, hatin derketine daristanekî. Êpecekî geriyan, çûn rastî zaxekê hatin. Ketine hundurê zaxê, nihêrîn çî bêjî heye: nan, rûn, toraq, goşt, penêr, şîr, qatix, dew. Keçik gellekî birçî bûn, rûniştin nîn bixun û zû herin, wekî xudanê zaxê hê bi wan nehesiyaye. Hema hê rûniştibûn nîn bixun, çil qaçax hev ra ketine hundur. Tûk devê keçika da miçiqî. Lê piyê qaçaxa jî şabûna erd negirt.

Gotin: eva him şîv e, him jî paşîv e.

Herekî gihîşt xwe ra keçikek girt.

Serkare wan jî keça pîrê girt. Periyê dît dest wan xilazbûn nabe got:

-Xudê bela we bide. Îdî em bi piyê xwe hatine mala we. Îja çîma hûn nolî hurça rabûne gihîştine me. Bînin, em nîn hazir kin. Şerava we jî heye.

Em gişik hev ra dewata xwe bikin, em e yê we, hûn jî yê me.

Qaçax, razî bûn. Keçika dest pê kir xurek çekir. Periyê keçikê hevalê xwe yeko yeko hîn kir, wekî şeravê gellekî qaçaxa bidine vexarinê, paşê ewana yê nehiş bikevin, em ê jî rêkê bivînin.

Nan hazir bû, dora sifrê rûniştin. Hetanî wextekî şevê xarin-vexarin.

Nêzîkî nivê şevê bû, qaçax hêdî hêdî, yeko yeko nehiş ketin.
Waxta qaçax hemû nehiş ketin. Periyê gote hevala:

-Herek we kincê wan xwe kin, kincê xwe jî wan kin, em rêkevin.

Keçîka usa jî kirin, çûn. Qaçax sivê rabûn nihêrîn, çokê xwe hîştin, serê xwe kutan. Çiqasî qaçax ser dewata xwe poşman bûn, haqasî jî tu yê ser çûyîna xwe poşman bî, dixazî here, dixazî meçe ...

Bûkê got:

-Xatî, here, îro jî nayêm.

Pîrê got:

-Ez ê teyrê te bikujim, tu ez ser xeznê me, te mal li min şewitand.

-Xatî, here, sibê erd jî biqelişe ez ê bêm.

Pîrê rabû çû cem bazîrgan, ewî pirsî:

-Pîrê çi bû?

-Hal-hewal ev e, gilî daye sivê bê.

-Xezê, ez seva qurîşekî kor merîva dikujim, tu jî royê çend zêra dixuy. Ev nebû, sivê jî nebû, ez ê kefenê te bibirim.

Sivê zû pîrê ser Sînemê birî ku rabe em herin. Ewê bejin-bala xwe xemiland xwest rabe here, Dundulçûk dîsa kelîmî:

-Xanim, diçî here. Lê qe te nepirsî axirîya keçîkan çawa bû?

-De bêje lê, îro ez ê ese herime dewatê.

-Xanim, keçîk hatin kincê mêra da derketine bajarekî. Hema ketine bajêr, dergevanê bajêr derî dada. Keçîka go, canim me berdin em e merivê kasiv in.

Dergevan keçîk dane serwaxtkirinê ku padşah mirîye teyirê dewletê berdidin, destûr tune.

Teyirê dewletê berdanê, hat ser serê Periyê sekinî. Cimaetê keçîk girt, bir kire kadînê, teyir dîsa hat ser serê wê sekinî. Cara sisiya dîsa teyir hat ser serê keçîka pîrê sekinî. Lê kesî nizanibû ewa keçîk e. Cimaetê hev ra got, wekî yeqîn ew î biesil e, yek jî kal-bava hetanî sisiya gotiye. Perî bû padşah û her hevaleke xwe danî şuxulekî. Yek bû wezîr, yek bû wekîl ...

Wextek derbaz bû, cimaet sekinî, wekî gerek padşah bizewice.

Keçik metel ma. Axirî nîşanî keçikeke hevala xwe kir, go bira sura min veneve. Nevêjin padşah jin e.

Paşê ewê şikilê xwe kişand li ser kaniya hevt riya xist, çend qerewil danî ser û teme da wana:

-Kê hat ji kaniyê av vexar û şikil nihêrî kire axinî, bigirin bînin cem min.

Rokê xortê Periyê ra dixand hat kaniyê av vexarinê, niherî siya şiklekî dikeve avê. Serê xwe hilbirînê çe'v şikil ket, kire axinî, Qerewila ew girt, anî cem padşah. Keçikê wê sehetê hizkiriye xwe nas kir û got:

-Evî bivin odeke rind da xayî kin û ez çi dixum bidine wî jî.

Rokê jî gemîajo hat. Ew jî girtin anîne bal padşêh. Ewê got:

-Bivin evî têkine cîkî nemkêş, royê sê cara avê bireşînîne bin û çi didine kelb, bidine wî jî.

Çend roja şûn da jî padşah hat. Ew jî girtin anîne bal padşêh. Ewê got:

-Ewî bibin têkine zindana tarî, sar e bûz û çi didine hespa bidine wî jî.

Rokê jî ew qaçaxana hatin. Ew jî girtin, anîne cem padşêh.

Ewê got:

-Vana bibin pak xayî kin.

Çend roja şûn da padşêh emir kir, wekî bira cimaet berav ve, ez ê gunê wan meriya bidim, yê ku girtî ne. Cimaet berav bû, girtî anîn.

Ewê pirsî:

-Xortê delal, te çima av vexwerinê, şikil nihêrinê kire axinî. Xort ji serî heta kutasiyê qal kir. Paşê gemîajo, padşah û qaçax da xeberdanê. Serê gemîajo, padşêh da lêdanê. Vê şûn da kincê xwe derxist got, wekî ez xût ew keçik im. Ew jî hezkiriye min e. Hizkiriye wê bû padşah.

Ew sî û neh keçik herek da qaçaxekî û got, îdî qaçaxiyê nekin.

Qaçaxek ma bê jin. Ji bajêr wî ra jî keçikek stand. Dewata wan kir.

Dundulçûkê hê giliyê xwe xilaz kiribû, Miraz der da hat. Pîrê xast bireve Miraz derî ser da girt. Ewî pîra bêîman rind nas dikir, zanibû ewa xudanê xwe çi fêlan e, ew da ber balta .

Jor da sê sêv hatin yek min ra, yek çîrokgotî ra, yek jî cimaeta hazir ra.

*Îro dengbêjê kurd derheqa Yêzdanşîr û Ebdulrehman
Paşa da kilam stranê, ew usa jî serhildana boy azaya
gelê kurd, ya demên here hên dinitirîne û miqabilî
zeftkarên dereke dertê. Stranbêj mêrxasiya gel, ya
bihurî rapêrandinê îro êl-obê boy wê şerkariyê bi-
domîne û biparêze ruhdar dike ...*

B. Nîkîtîn, dîrokzan

III

Kilamên mêrxasiyê

Îsmayîl Axa

De li min, de li min, de li min ...
De dayê, dêranê,
Şerekê li me qewimiye,
Çariya kavi l wê li berwarê.
Eskerê Elîheyder Paşa giran bû,
Vê şevê bulik bulik , taxbûr taxbûr ,
Kişiya, xwe da çiyayê Gulîzerê.
Lê lê Muhteberê, porkurê,
Xuzla wê dewrê, wê heynê ,
Kekê Xosrov, paşê me kurda
Şer xaş kiribû li ser ecem, mîrata Îranê.
Ax de li min, de li min, de li min.
De li min, de li min, de li min ...
De lê lê Muhteberê, dêranê,
Şerekê li me qewimiye

Çariya kavi l wê li fêzê.
Eskerê Eliheyder Paşa giran bû,
Vê sibê bulik bulik, taxbûr taxbûr,
Kula dilê min ra kişiya, kete rêzê.
Lê lê Muhteberê, porkurê
Xuzla wê dewrê, wê heynê,
Kekê Xosrov, paşê me kurda
Şer xaş kiribû li ser ecem, mîrata Tewrêzê.
De li min, de li min, de li min, de li min ...

De li min, de li min, de li min ...
De lê lê Muhtebere dêranê ,
Şerekê li me qewimiye
Çariya kavi l wê li fêzê.
Eskerê Elîhêyder Paşa giran bû,
Vê sibê bulik bulik, taxbûr taxbûr,
Dora koçka Kekê Xosrov paşê me kurda,
Girtiye îşev ji êvar da.
Lê lê Muhteberê dêrane, heyfa min nayê,
Li terş û talan, li kuştina mêra,
Heyfa min tê li wê heyfê,
Vê sivê Xanim kuştine,
Îsmayîl Axa girtine di xewa sivê da.
De li min, de li min, de li min, de wayê,
De li min, de li min, de li min...

De li min, de li min, de li min...
Lê lê Muhteberê, dêranê,
Şerekê li me qewimiye

Çariya kavi, kula dilê min ra li beyara.
Xuzla wê heynê, wê dewrê,
Kekê Xosrov Paşa, paşê me kurda siyar dibû,
Bala xwe dida eşîrê, şengê siyara .
Lê lê Muhteberê, porkurê,
Heyfa min nayê kuştina mêra,
Li terş û talana,
Heyfa min tê li wê heyfê,
Xosrov Paşa girtin, kete destê van neyara.

Elîko Lawo

Helay, helay, helay. . .
Elko lawo, şerekê li me qewimî,
Mûse, Mûselayê li petek e.
Min ê nego merî xulama,
Mîna te xayî nake.
Merî xulama xayî dike,
Mîna Evdilezîzê Bavfile.
Hesongê Welo, heçar lawê şevederê,
Rojê oxirmê giran mêra bikuje,
Riya revê pê xe, la min dîlê.
Hewar dikim, hewar nayê,
Gazî dikim, gazî nayê,
Hewara me maye Xaliqê Alemê,
Sehîdê Nado qaçaxê dewletê.

* * *

Helay, helay, helay. . .
Elîko lawo, şerekê li me qewimî,

Mûse, Mûselayê li beyara,
Li meydanê tê qîrçîna mîratê mûdeliya ,
Şinginiya şengesiya,
Min ê nego merî xulama,
Mîna te xayî nake.
Merî xulama xayî dike,
Mîna Evdilezîzê Bavfile.
Hesongê Welo, heçar lawê şevederê,
Rojê oxirmê giran berê xwe naguhêze,
Ji gullê van neyara.
La min dêranê,
Hewar dikim, hewar nayê,
Gazî dikim, gazî nayê,
Hewara me maye Xaliqê Alemê,
Sehîdê Nado qaçaxê dewletê,
Zengilê şera, bavê Dilşayê.

* * *

Helay, helay, helay...
Elîko lawo, şerekê li me qewimî,
Mûse, Mûselayê devê sêz e .
Siveng da li meydanê şer bûye,
Ser qiranê pêz e.
La min dêranê, la min dîlê,
Hewar dikim, hewar nayê,
Gazî dikim, gazî nayê,
Hewara me maye Xaliqê Alemê,
Sehîde Nado, qaçaxê dewletê,
Zengilê şera, bavê Dilşayê.

Kekê Nisret

Wê ha wê, wê ha wê...
Wê ha wê, gundo, wê.
De dayê, hatiye Nêrkoxa kaviîl tût- qeysî,
Kekê Nisret serê xwe pencerê ra derxist,
La min dêranê ne kirrî, ne pirsî,
Cemar Xanimê bi sê denga
Bacê Xanimê kire gazî, go:
-Wextê berê Kekê Nisret
Dane mîrata kela Wanê,
Pey Kekê Nisret ra
Qewil-qiyara nadine tu kesî.
Wê ha wê, wê ha wê...
Wê ha wê, gundo, wê.

Wê ha wê, wê ha wê...
Wê ha wê, gundo, wê.
De dayê, naçime Nerkoxa kaviîl.
Kula dilê min ra çem-kanî,
Kulê tu têkevî mala Zeynelê Xudo,
Ji dêriza Wanê cendirme anî.
Wextê milê Kekê Nisret-Refîq,
Pişt piştê va girêdan,
Derê malê sê cara simêl bada,
Qarê dujmina xwe ra nexiste bargiranî.
Wê ha wê, wê ha wê...
Wê ha wê, gundo, wê.

* * *

Wê ha wê, wê ha wê...

Wê ha wê, gundo, wê.

De dayê, naçime Nêrkoxa kavi, wê bi sûs e .

Pêşîra Kekê Nisret dinihêrî,

Çîn-mîdalê Roma qewrik ,

Haleta mawîzerê dibirûse .

Çaxê berê Kekê Nisret dane kela dêrîza Wanê,

Şîn-girî kete nava eşîretê,

Eşq-şayî kete nava evên bênamûs e.

Wê ha wê, wê ha wê...

Wê ha wê, gundo, wê.

Tahar

Lo, lo, lo, keko...

Keko qurban êvar e,

Ha êvar e bû tarî,

Steyrkê esmîn bûne xalî,

Êvar da agir ser piştê kekê min da barî.

Kekê min î Tahar, tu yî,

Nava neyara da bêpişt î, bê mêr î.

Kekê min mêrê mêran e,

Hakimê hakimî e,

Keke min kana zêran e,

Gurçikê kekê min pola ne.

* * *

Lo, lo, lo, keko...

Ez Qeleniya kavi ketim nolî hêk e,

Kesekê tune orta kekê min,
Huseyîn padşê Tokerî çêke.
Eskerê padşê gelek e,
Eskerê kekê min hindik e,
Yê serê kekê min qelaçê da jê ke.

* * *

Lo, lo, lo, keko...
Êze Qeleniya kavi ketim bi gir e,
Îşev êvar da têlefona kekê min,
Şahê Îranê ra,
Kumsorê Rewanê ra,
Fînosorê Romê ra,
Zabitê Îç Kilîsê ra,
Kula dile min ra tev digere.

* * *

Lo, lo, lo, keko...
Sive ye, sive sar e,
Miştûka kekê min gêlaz e,
Îmama sêrî karîbar e.
Berdaye hevsiid mêrê tokerî,
Heysid mêrê qecerî.

Kekê Ewlo

Warê min vê xelayê, vê belayê,
Keke Ewlo siyarî dajo ser qedayê .

Geliyê Kalo dar sinc e,
Kekê Ewlo siyarê bozê dêlnarinc e.
Ji Qersê papaxreşa dikuje heta Qaqizmanê,
Seriya jê dike davêje bin apinc e

* * *

Warê min vê xelayê, vê belayê,
Kekê Ewlo siyarî dajo ser qedayê.
Geliyê Kalo dar merx e,
Kekê Ewlo siyarê bozê dêlçerx e.
Ji Qersê papaxreşa dikuje heta Qaqizmanê,
Seriya davêje ber xwe.

* * *

Warê min vê xelayê, vê belayê,
Keke Ewlo siyarî dajo ser qedayê.
Geliyê Kalo dar sinc e,
Kekê Ewlo koloz xar dike,
Ser aliyê apinc e.

Heydero Lawo

De lo lo, lo lo, lo lo...
De lo lo, Heydero lawo,
Dilê dayka te behra Wanê,
Behra xeylan -xeman.
De lo lo, lo lo, lo lo. . .
Baharê malê me danîne
Zozanê Hesenkêfê,

Li Çîmlîka kavi,
 Werê Dêma .
 Badînê bi sê denga,
 Li Rehîmê kire gazî, go:
 -Por-guliyê min te jêkirî ve,
 Baharê derdê xelqê mal-halê dunyalikê ,
 Derdê dayka te ne mal-hal e,
 Ne koza berxan e, ne tewla menegiyan e,
 Ne hoza miyan e, ne mala giran e,
 Derdê dayka te Kekê Mehmed,
 Axangî xorta,
 Cote gulle mawîzerê birîndar e.
 Li deşta Bişigînê,
 Bê xweyî, bê xudan maye.
 Rojekê rojê Xudê çima,
 Qe mala xwe nema.
 Hey wê, wê, hey wê,
 Hey lo lo, hey lo lo,
 Lo birîndaro.

* * *

De lo lo, lo lo, lo lo...
 De lo lo, Hêydero lawo,
 Dilê dayka te sêla hesinî,
 Berxê min, dilê dayka te sêla hesinî,
 Berfekê li me barî,
 Li zozanê Hesenkêfê,
 Li Çîmlîka kavi, Gîhadînê,

Kulî kulî hat erdê sekinî.
Baharê xelqê ketiye derdê mal-halê dunyalikê.
Derdê dayka te ne mal-hal e,
Ne koza berxan e, ne tewla menegiyan e,
Ne hoza miyan e, ne mala giran e,
Derdê dayka te Kekê Mehmed,
Axangî xortan e.
Sebebe wî bûye Mistokê Tozo,
Sewsanê Şex Bizinî.
Çima rojekê roja Xudê,
Mala xwe nese kinî.
Hey wê, wê, hey wê,
Hey lo lo, hey lo lo,
Lo birîndaro.

* * *

De lo lo, lo lo, lo lo...
De lo lo, Heydero lawo,
Wira rûnenê, wira erd e,
Were jorê, ser îskemê-mîskemê ,
Perçe parçedanê rûnê.
Bide cixarê mij-dûmanê,
Qulav qulav ser milê dayka xwe ra berde.
De lo lo, lo lo, lo lo...
De lo lo, Heydero lawo,
Derdê dayka te ne mal-hal e,
Ne koza berxan e, ne tewla menegiyan e,
Ne hoza miyan e, ne mala giran e,

Derdê dayka te Kekê Mehmed,
Axangî xortan e.

Elîngo Lawo

Demam e, xuş demam e,
Elîngo, lawo dilê dayka te, genimê qûma şewitîn,
Berpalê min te da buxum dan e.
Elîngo, lawo min ê çend cara te ra got:
-Ware neçe peşiya vî kafirî Dawo Mûsa,
Kafirekî bêdîn î, bêîman e,
Şûrek kirriye danzdeh zêran e,
Royê qesasê danzdeh kurmancan e.

* * *

Elîngo, lawo dilê dayka te vê hedîsê,
Genimê qûma şewitîn,
Berpalê min te da çinîne, dane lîsê .
Min ê çend çend cara te ra got:
-Ware neçe peşiya vî kafirî Dawo Mûsa,
Kafirekî bêdîn î, bêîman e, bênamûs e
Şûrek kirriye danzdeh kîs e,
Royê qesasê danzdeh mêrê ûris e.

* * *

Elîngo, lawo dilê dayka te berê dinê,
Genimê qûma şewitîn,
Berpalê min te da xal ketinê.
Heval-hogirê Elî lawê min pirsînê,

Ez ê nizanim çi bêjim?
Ez ê bêjim min Eliyê xwe şandiye,
Bidlîsê ser şêxê mezin xandinê.

* * *

Elîngo, lawo tê eskerê vî kafirî,
Min ê bala xwe da eskerê vî kafirî,
Serî fînoyê sor e tilsiman e,
Ling da sapokê reş e nelçekirî ne.
Mine pirsî Elî lawê min kanê?
Go:
-Pîre, gunê Xudê te hatê,
Elî lawê te ketiye,
Turxana topê ,
Nikare bide ser eyaxê.

* * *

Elîngo, lawo ne min têr dîto,
Ne min dêranê têr bînayo,
Henika sê roja li destano,
Bûka serxêlî ber perdê mawo,
Danê vê baharê em hesîr mano.

Hamê Mûsê

Delî delê, delî delê...
Siba me sibeke şîrîn e,
Êla Beraza êleke rengîn e,

Dîkê nivê şevê li me dike qîrîn e.
Hamê Mûsê birre giregirê Beraza
Konê reş î erebî da rûniştî ne,
Bin wan kulavê xuristanî ne,
Ber palê wan balgiyê tûkî ne,
Îşev êvar da şêwreke giran danîne.

Hamê go: - Nûrê, lê ha Nûrê,
Tu xûşka birangê xwe kiribî,
Çe'vê xwe deşta jêrîn bigerîne,
Binê deşta Gelho çi heye, çi tunîne?

- Birao nemînim, nemînim,
Saçaxê nav êlê ra,
Serbilindê Îranê ra,
Serekê tucara ra,
Ji bokê Mûsilê ra,
Ji Hamê Mûsê,
Ji kekê xwe dêranê ra,
Delî delê, delî delê,
Birango, nemînim...

Nûrê dike, dilezîne,
Çe'vê xwe deştê digerîne,
Li deşta Gelho tîpe siyara dibîne,
Vedigere aliyê malê, cem Hamê Mûsê ye,
Dibê: -Keko, tîpe siyarê giran jêl va tê ye.
Hamê Mûsê go: -Nûre, daka birangê xwe yî,

Ez nikarim, tu derê pêşiyê ye,
Herke şivan-gavan in,
Bira bên herine rêncberiyê ye,
Herke şex-melle ne,
Bira bên herine hucrê ye,
Herke eskerê Osman Paşe Milî ye,
Kekê te yê rabe pêşiyê ye,
Jê ra bike qal û cengê ye.
Delî delê, delî delê. . .
Birao, nemînim, nemînim.

Nûrê bala xwe dide vê tîpê ye,
Dibê: -Keko, Xude min qurbana nav-dengê te kirî be,
Ew tîpa giran e jêl va tê ye,
Sê siyar e ser pêşiyê ne,
Siyarê pêşiyê lawê pîrê ye,
Her du siyarê dinê,
Yek ji şivîn e, yek ji gêvîn e,
Heçiya , kurê şivîn û gevîn in,
Emrê bavê xwe da li menegiya siyar nebûne,
Îro menegiyê hêşînboz e xalxalî siyar bûne,
Qamçiya xavikê menegiya dixurînin,
Zengûya li piçenga menegiya dixînin,
Bînê li menegiya diçikînin.
Ew ku hene siyarê bavkotî ne,
Roja oxirmê giran wê birevin,
Wê xwe bidine serê çiya.
Wê herefê meydanê temaşe kin,
Mêrê mêrxas kî dikeve, kî dimîne,

Heçiya lawê pîrê ye,
Jêl va têye mîna istekana je're ye,
Çekê pehlewanê ser mila ye,
Destê xwe davêje erşa ye,
Delî dele, delî delê,
Birao, nemînim, nemînim.

Hamê Mûsê gote birê xwe:
- Kelo, Kelo, Kelo,
Piştmezino, ne tu tişto,
Ne ji dola bavê mino,
Bike bilezîne,
Xwe pêşiya têlîn bigîne,
Wana hêdî hêdî bixapîne.
Mîratê Etman î giran e, min nakşîne.
Hetanî kekê te xwe pêşiya têlîn bigihîne.
Bi gotina Xudê kekê te yê mêra bikujîne, têlîn bizvirîne

Kelo çûnê şûn da, Hamê Mûsê dibêje xûşkê:
-Nûre, tu xûşka birangê xwe bî,
Bike-bilezîne,
Xwe aliye malê ra bigihîne,
Kilîtê devê sandoxê xîne,
Destê çekê efata , ji kekê xwe ra derîne.
Nûre dibê:
-Keko, ez qurbana nav-dengê te me,
Ez ê nizanim çekê efatê çi bi çi ne?
Hamê go: -Kulikê serê wan Hemedanî ne,
Na welleh devetûkî ne,

Cotê engalê Helebê dorê alandî ne,
 Evê milê wan gulavdûn e misirî ne,
 Şelê wan e hêşîn e mahûdî ne,
 Kiras-derpiyê wan sipî ne misqalî ne.
 Rimê destê wan qemekî ne,
 Serê rima îlandîlî ne,
 Ortê wan e sedefî ne.
 Qîmete wan sed bîst şeş mecîdî ne,
 Menegiyê wan heşîn e xalxalî ne,
 Guhê menega kevçîkî ne,
 Simê wan e kodikî ne,
 Navtengê wan e qendîlî ne,
 Çivtê wan e kêwrîşkî ne,
 Gerdenê wan erîn-nîvekê ji nava pîla derketî ne.
 Zînê wan stembolî ne,
 Gemê wan diyarbekirî ne.
 Heçî gava merê mêrxas ningê xwe dike zengûya zîn e,
 Li meydana mêrkuştinê,
 Bira dikeve, bira haj ciniyazê birê tunîne,
 Wexta Hamê mal da giregirê êlê ra meclîsê da bû, cab danê , wekî
 ser kerî-sûriya , garanê da girtine, dibin. Ew hespê siyar bû çû. Çe'vê
 xûşkê qerimî, bira nehat. Ewa rabû, derkete derva.

Erd-esman Nurê nahebîne ,
 Çe'vê xwê deşta Gelho digerîne.
 Peyakê li deştê dibîne.
 Dest davê , sol-gora ra nagihîne,
 Deyil-dawê xwe hiltîne,
 Xwe pêşiya peyê digihîne.
 Nûrê dibe: -Peyayo, ha peyayo...
 Teyê haj siyarê mala bavê min tunîne?

Peya dibe: -Nûrê, ha Nûrê...

Minê haj siyarê mala bavê te tunîne.

Nûrê dibê: -Ne peyayê şeran-de'wan î,

Kenê ber devê keç-xortan î.

Peyê got, wekî xûşkê, welleh çiqasî jî te'na min xî, ez haj siyarê mala bavê te tunenim. Binê Nûrâ çi divê, peya çi dibîze :

-Peyayo, peyayo, ha peyayo...

Serê min dêranê serê deqa û reqa ne,

Hamê Mûsê daniye warê Riha ne,

Zeft kiriye milk-maşê hevt sinceqa.

Ew peyayê mizginiya siyarê mala bavê min bida min da,

Ez ê pêşkêş bikim ceniya zikê Adilayê, menegiya berî.

Herke qayîl bûye, qayîl bûye,

Herke qayîl nebûye, ez ê pêşkêş bikim

Deqa orta her du memika.

Peyê go: -Nûrê, ha Nûrê...

Siyarê tu divêjî,

Siyarê menegiya hêşînboz a çançanî ye,

Li kaniya Qamûşlixê sê derba birîndar e,

Yeke li renê rikêfê ye, ewê ziyan tunîne,

Yeke milê bazbendê ye, ewê xem tunîne,

Yeke paşpîlan e, can-cegerê wî hilçîne.

Xêr-xaşî te barî,

Kevir-kuçik Nûrê barî.

Menegî kişand ji çîmîn e,

Berê xwe da kaniya dor pûngîn e.

Li êl-obê dike gazî ne,

Hê li deşta Gelho şêr-cengê qal tîne .

*...Zimanê kurdî-zarê kurmancî gelek dew-
lemend û mezin û payedar e. Ji her nîşî
helbest e, lawik, heyran, istiran, serpêhatî,
çîrok û lîztîk dagirtiye. Kurd ji biçûkayî de
zarokên xwe hînî wan tiştan dîkin.*

Cîgerxwîn

IV

Kilamên Evîntiyê

Kalê û du keçik

Rojekê kalek berxê xwe bere berojê çiyê kiribûye. Jor da li çêm dinêhêre, tîna xwe didê du keçik devê şewlê qirşa berav dikan. Kalê xwe xwe ra dibê, ku ez ê herim ji wan keçikan ramûsanekê bistînim. Kalê tê dest pê dike kilamê davêje ser keçikan.

Kalê dibê:

-Qirşê vê domamê, qirşê sêlê,
Kesek tune bişîdîne, bide piştê.
Ez ê herim bişîdînim, bidime piştê,
Kula dila ra qasekê rûnê li teniştê.
Lê gidiyê lê, lê domamê, lê, lê...

Keçik dibê:

-Ere kalo, kalê hizhizî ,
Te li sêrî aqil rizî.
Çend sal e emir dikî ber vî pezî,
Wekî eşqa dila keçka çardeh salî tu dixazî,
Tu yê ji hubê, bengîtê bivî derzî.
Kalo lo, lo, bêmalo lo, lo...

Kalê got:

-Herê lê delalê, ez ê pênc sala şivanê miya bîme,
Hevt sala şivanê pezê nêr bûme,
Pê ra qaçaxê sê dewleta bûme,
Îsal bûme berxvanê berxa,
Seva rinda, bedewa.
Gidiyê lê, lê domamê, lê, lê...

Keçika dinê got:

-Lo şivano, îdî tu yî kal î,
Emirê xwe da hevtê-heystê salî,
Heta sivê sîngê te ji belxemê, kuxikê nave xalî.
Kalo lo, ji keçika te ra nave can bermalî.
Kalo lo, lo, bêmalo lo, lo...

Kalê dibê:

-Lê domamê lê, şekirê Şamê lê,
Usa nîn e, tu were kalê bistîne,
Paşê te'ma malê têr e tijî bivîne.
Gidiyê lê, lê domamê lê, bermaliyê lê, lê.

Keçik dibên:

-De lo kalo, lo, lo,
Em ê nakin kalo,
Em ê bikin cahilê taxê xwe ra,
Mal di gund da, mîna berxeke ber kozê da,
Nemîne pey hevala.
De kalo lo, lo, bedhalo lo, lo...

-Kalê dibê:

-Lê hevalê, were bike kala,
Bixwe mala,
Neke cahilê aqilvala.
Royê sê cara te bikute,
Nemîne ji hevala.
Lê gidiyê lê, lê domamê, lê, lê...

Qazî

-Qazî qurban, te li çava burî çend in,
Pêwir bilind e, mêzîn bend in.
Sîng-berê qaziya min,
Mînanî kaxiz-qelemê Semerqend in.
Merî bide destê panzdeh xorta,
Çanzdeh keçika, hevdeh kala, heyjdeh pîra,
Şevêk şevê payîza,
Roke ji rojê bahara,
Bike neke neyê xandin.

-O lo gede, ez ne qazî me, qaz im,
Tu nîfira neke, ez e cahil e bermiraz im,
Ne mîna keçik-bûkê van sala hoqe, hoqebaz im,
Ez ê aqila aqilbaz im.
Royê danzdeh hevê mîna te,
Têne derê mala bavê min,
Min dikirin, min dixazin.

-Qazî qurban, Qersê vir da Qaqizman e,
Nerm e nermistan e,
Batim e nehiya danzdeh kurmancan e,
Ez ê xerc-xereca berav dikim, barê extirman e,
Besî min qaziya min e hevt salan e.

-Qazî qurban,
Bazîd e niqeniqa kerê êşekçiyane,
Heleb e ciyê tucaran e,
Mûş e ciyê diravan e,
Tewriz e taxek êzdî ye, yek musulman e,
Meleşgir e gir e ciyê rind-bedewan e,
Wan e ciyê me'siyan e,
Ez qaziya xwe va destê hev bigirin,
Herine mala Şêx Mehmûd e.
Dest neşûştî bikevine serq-sefan e.
Qaziya min jinebî ye,
Danzdeh ziman perwerdekirî ye.

Domam

-Domam, qudûmê çokê min domam,
Berdilka ber çe'vê min domam,
Welleh min ê serê zermemikê te dîtîbû.

Keçîkê got:

-O lo gede, were bêbextiya neke,
Bêbextî yê bextê te welgerîne .
Ez ê nizamim merivê mîna te,
Rû dinê heye, ya tune.

Xort got:

-Domam, wextê ez ê ro nêçîrê hatibûm,
Tu yê ber palgonê sekinîbûyî,
Destê te da teşiya mûşîn bû,
Wê hingê serê zermemikê te dîtibû.

Keçikê got:

-O lo gede, were bêbextiya neke,
Bêbextî yê bextê te welgerîne,
Eger te yê serê zermemikê min dîtine,
Were bêje çika çi ne, çi nîn e?

Xort got:

-Domam, wextê ez ê ro nêçîrê dihatibûm,
Tu yê ber bêriye sekinîbuyî,
Gopalê zêrîn destê te da bû,
Şimika zîvîn lingê te da bû,
Miya qerebeş serê bêriyê revîbû,
Delmê te ji hev çûbûn,
Sed sîw şeş bişkê te qetiyabûn
Min ê wê hingê serê zermemikê domama xwe dîbû.

Keçikê got:

-Lo lo gede, were bêbextiya neke,
Bêbextî yê bextê te welgerîne,
De, bêje nav nîşanê memikê min çi ye, çi nîn e?

Xort got:

-De lê, lê domam, domam,
Serê wan sor e, kokê wan sipî ne,

Ortengê wana xalxalî ne,
Mîna tiriye sirincî ne,
Dimisê Rewanê direvîne,
Birincê Ulexanê,
Zerdalê Ordîbatê,
Goştê berxa,
Mîna sersîngê peza nêr e.

Keçikê got:

-Lo lo kuro gede, bêbextiya neke,
Bêbextî yê bextê te welgerîne,
Herge tu birçî yî bide aliye çayxanê ye,
Herge tu deyndar î bistîne deynê di xelqê ye,
Herge tu xûndar î bistîne xûna di xelqê ye,
O lo gede, ji min dilê te çi dibêye .

Xort got:

-Domam, ez ê ne birçî me; xwe bidime aliye çayxanêye,
Ez ê ne deyndar im, bistînim deynê di xelqê ye,
Ez ê ne xûndar im, bistînim xûna xelqê ye,
Ez ê heme Hesongê kurapê domamê me,
Îsal hevt sal e şerê di Romê me,
Weleh îşev pê ra mêvanê sîng-berê domamê me.
De ware domam, domam,
Qûdûmê çokê min domam,
Birûska ber çavê min domam,
Berdilika dilê min domam,
Domam, domam, dîsa domam.
Heso û Xanim

-Heso lo, Heso lo, Heso lo...
Îşev şev e şev, şilî ye,
Gohara qiranê pêz av-herî ye,
Were nav sîng-berê min zeriye ye.

Heso got:

-Xanim nave, welleh nave,
Min ê nanê ber destê diya te xariye,
Helal e, heram nave.

Xanimê got:

-Heso lo, Heso lo, Heso lo...
Ez ê birîndar im,
Were qasekê bal min rûnê,
Birînê min bide ber derziyan e.

Heso got:

-Xanim, nave, welleh nave,
Min ê nanê ber destê diya te xariye,
Helal e, heram nave.

Xanimê got:

-Oro Heso, wekî nayê,
Nav sîng-berê min zeriye,
Ez ê herime aliyê dîwanê.

Bavê xwe ra bêjim:

-Bavo, Hesogê sêwî bi gunda bû,
Dêmê xwe sîngê min xirab kiribû.

Heso got:

-Hes kî here aliyê dîwanê,
Bira bavê te min bikuje,
Xûna min ser riya bive gol e,
Goştê min bive xurê teyr-tûyan e,
Bêrîvan bên herin,
Bêjin: -Heso, rabe,
Rehme gora te be.
Welleh nave, billeh nave,
Min ê nanê ber destê diya te xariye,
Helal e, heram nave.

Jina çê

Kuro gedê, ez ê ne li vê me, ne li wê me,
Ez ê tavî barana, tevî bê me.
Ez ê gongilê rûyê erdê me,
Li ser Wanê, gola Tetwanê me.
Xuzila ji paşayê mêrê dewra berê da,
Bibûya carî eded bigota:
-Destê jina çê bigirin,
Ji kotî mêra berdin.
Bidine terkiya van camêra,
Dîsa ez ê kilê çe'vê gedê-lawkê xwe yî,
Şengesiya rekî çê me.
Were lo lo, were lo lo, were lo lo.

* * *

Kuro gedê, li me hatiye bazirganê van hinara.
Li me hêwêriye kavi lê gunda ber perê van zinara.

Xuzila ji paşayê, mêrê dewra berê da

Bibûya carî eded bigota:

-Destê jina çê bigirin,

Ji kotî mêra berdîn,

Bidine terkiya van şenga siyara.

Were lo lo, were lo lo, were lo lo.

* * *

Kuro gede, pê ra li me hatiye baziganê van laza,

Li me hêwiriye kaviî gunda ber perê van zaza.

Xudê ji dê-bavê min ra qe hilnede,

Destê min negirtin nedane xortekî çardeh salî,

Ez girtim dane destê van canbaza,

Xuzila ji paşayê mîrê dewra berê da,

Bibûya carî eded bigota:

-Destê jina çê bigirin,

Ji kotî mêra berdîn,

Bidine terkiya van camêra,

Were lo lo, were lo lo, were lo lo.

Wî lo lo

Wî lo lo, wî lo lo, lo lo, lo lo...

Lê dînê, bire zeriye me meşiyane ber avê,

Dêre sipiyê, kondele reşê, enî deqê.

Kula dilê min ra çima daye navê.

Wî lo lo, wî lo lo, lo lo, lo lo...

Poşman im, zeriye,

Poşman neve, wî gede.

* * *

Wî lo lo, wî lo lo, lo lo, lo lo...

Lê dînê, ez ê navê te nizanim,

Ber eşqa te ra divêm,

Lê Periyê, lê Perîşanê.

Şêbiskê , şe, morî-mircanê,

Ser xalî bistan da,

Jor da hilşayane .

Wî lo lo, wî lo lo, lo lo, lo lo...

Poşman im, zeriye,

Poşman neve, wî gedê.

* * *

Wî lo lo, wî lo lo, lo lo, lo lo...

Lê dînê, ez ê naçime Erdîşa kavi, na welle Taşmerkezê,

Meşa vê telesê meşa werdekê, xodûma qazê.

Wî lo lo, wî lo lo, lo lo, lo lo...

Poşman im, zeriye,

Poşman neve, wî gedê.

* * *

Wî lo lo, wî lo lo, lo lo, lo lo...

Lê dînê malê me danîne,

Li zozanê Mêrganî, Gulava,

Ez ê xelqê têlî delal ra ketime,

Vê şeva payîza kêf-heneka.

Heta hîva gundê me serî da,

Mêzîn, Pêvir hat derbaz bûne yalî ava .

Wî lo lo, wî lo lo, lo lo, lo lo...

Poşman im, zeriye,

Poşman neve, wî gedê.

Hecî Nûrî

Lo, lo, lo, lo kuro, kur malo...
Tu yê diçî waletê xerîbiyê, xerîbistanê,
Mal-halê xwe bidî min ra bînî
Du qol zêrê seriyan î Mehmûdî,
Ji xwe ra bînî du kevirê qîmetî,
Terkekî dor bi kubar çîtinî :

* * *

Lê, lê, lê, lê Muhubetê...
Ez ê çûme waletê xerîbiyê, xerîbistanê,
Li Mûsûlê, Mûselayê,
Hêdî hêdî hatime waletê Rewanê,
Min ê destê xwe havîte kîso,
Kîsekî vik î vala.
Minê got: -Xudoyo, ha bi Xudoyo,
Dinê da kasivbûnê çêtir e
Halê vê mirinê.

* * *

Lê, lê, lê, lê Muhubetê...
Dilbirîn ez im Muhubetê,
Kete bîra min da dostekî bavê min î kevin,
Navê wiya Hecî Nûrî bû.
Ez ê rabûm çûme mala Hecî Nûrî
Hecî Nûrî got: -Kuro, kurmalo ,
Tu yê vê sivengê xêr î?
Min ê got: -Hecî Nûrî, xêr ji xêrê bihuriye,
Ez ê îsal sê sal e ketime waletê xerîbiyê, xerîbistanê.

Xelqê têlî kubar delal
Min teme kiriye du qol zêrê seriyan e.
Hecî Nûrî destê xwe kire cêva xwe da,
Du zêrê firansî ye Reşadî dane min da.

* * *

Lê, lê, lê, lê Muhubetê,
Ez ê dilekî şa ketime kûçê van zergara .
Min ê bazara zêrê xelqê,
Têlî kubar delal vê sivengê dikir.
Lê, lê, lê, lê Muhubetê,
Min ê nihêrî peyak va ye wê da têye
Na welleh peyagê aliyê me ye.
Min ê got: -Zergaro, zergaro, ha zergaro,
Ez ê ber dîn û dewleta te ketime,
Tu yê çêrka xelqê têlî delal negaharî ,
Ez ê herime pêşiya peyê ye,
Ji yalê malê û têlî delal bikim cava xêrê ye.

* * *

Ez ê çûme pêşiya peyê ye,
Min ê got: -Peyayo, ha peyayo,
Peyayê aliyê me yo,
Tu yê bide min da ji aliyê malê,
Û xelqa têlî kubar delal cava xêrê yo.
Peyê got: -Kuro, kurmallo,
Mal sax-silamet e,
Yanga tu divêjî,
Îro sê roj in, sê şev e,

Xazginî mala bavê da rûniştine,
Ringîniya def û zûrnê ye.
Min ê got: -Peyayo, ha peyayo,
Peyayê aliyê me yo,
Tuyê hela neçe
Ez ê li te bikim dua Xudê ye.
Têkeve çoka te ava serê çiya û belekiya ,
Sêla te darîn be,
Xarina de pesarî be,
Ji hevt ewlada,
Ewladeke te ye keçik hebe,
Teyrê simîn lê xe çe'va derxe,
Me'rê kor jî bimêjîne,
Te yê çawa neda min da cava xêrê ye.

*Folklor a kurdan bû neynîka emir-jiyana
cim'etê, ya ku rabûn-rûniştandîna cim'etê,
xwestin û meremên wê, xeyset û heleqe-
tiyên meriya dide kivşê.*

Ordîxanê Celîl

V

Dilok

1.

Xezal canê, Gilîdaxê şax-şîlan e,
Cî-mekanê pez-kûviyan e.
Warên salixê gede-lawikê xwe bidim,
Ew kurê jinebiyan e.

2.

Xezal nabe, Xezal nabe,
Gelî kûr e bê av nabe.
Dil kafir e sulman nabe,
Keça bedew bê yar nabe.

3.

Dilê min sêla bistê ,
Tejiya lawikê min leyst doxa ristê .
Nêçîreke Qero qedînê,
Qira sivê li ser piştê.

4.

Xezal canê, te li çe'va hêsira,
Xuzila kotîmêrê te bimira.
Xudê tu bi helalî, bi zelalî,
Qismetê canê min kira.

5.

Dîlber canê, evan dera warê me ne,
Zozanê me pê da pê da doşûrme ne.
Wan xezala vir da bînin,
Ew zeriya ji malê me ne.

6.

Çûme hêsiya bilind nav şivana,
Li min têye sewta bedewa, bêrîvana.
Ez ê qerefîlekê kawa xwe ra girêdim,
Bist-şirikê wê dakevine ser koka dirana.

7.

Navê gede-lawikê min Dewrêş e,
Hespê xwe tewilandiye dewla êş e.
Helke hûn gede-lawikê min nas nakin,
Ew yekî bejinzirav î qelûnkêş e.

8.

Lawiko, te ez xastim nerevandim,
Kirime desmaleke çîtîn.
Zenda zer alandim,
Nava her çar malê me da ez çikandim.

9.

Sê tişteke hat dinê min tevayî,
Divên: yek mirin e, yek xelayî, yek huba dila.
Mirin bê, merî yê bimire;
Xelayî bê, merî yê bi pincara çolê bidebire;
Huba dila şkestinê,
Tu car ser şêx-mella nacebire.

10.

Keleş kawê, di ser me ra Xudê yek e,
Biniya me da hêlîna teyrê perbelek e.
Evan deran cî-warên me ne,
Keçikê canê, ez û tu ne, şerm neke.

11.

Keçikê qurban, ser ra-ber ra,
Şal hêşîn e ji bejina te ra.
Derê mala bavê min ra neyê-neçe,
Nezer pîs e ji bejina te ra.

12.

Gede-lawikê min sekiniye der dîwanê,
Gede-lawikê min qemer dike ji xudanê.
Ez ê heyrana bejin-balê,
Zarê şîrîn, xeberdanê.

13.

Delal-lawikê min ji Erdîşê,
Boz kutaye bi qawîşê.
Min ê ji koma bav-bira şerm nekira,
Têxista nava xwe dergûşê.

14.

Xorto, dilê min dilê te ra,
Gede-lawiko, îro ga bişîn malê me ra.
Zozanê Axmûxanê hêşîn dîkin,
Ji ken-henekê min û te ra.

15.

Hey dil, hey dil,
Ez ê naçime baxê bê gul.
Bira Xudê hasil neke,
Tu car, tu car mirazê bê dil.

16.

Îro lawikê min diçe gomê çêke,
Berf û baran tev hev lê ke,
Gelo îşev lawikê min ê,
Destê xwe sîng-berê kê dêlê ke.

17.

Evî şivanî hêkehêk e,
Qiranê nêriya sturî dîk e,
Wayne biniya mala bave min da,
Lawiko qurban, şîv, şevîn ke.

18.

Gede lawikê min şivanê pezê zayî,
Dev û lêva bizmar dayî.
Bira bixwe îsal pê ra,
Serê axê heqê dayî.

19.

Te li wara û li warkoza,
Tewlekê bide hêşînboza.
Serê kekê Elî, bavê Evdî,
Xalî nave ji dew û doza.

20.

Bejina lawikê min kinik e,
Mîna guleke bi gupik e.
Çawa nolî gulekê,
Devê gêlî hêşîn dike.

21.

Dîlber canê, ew gelî bû ez ketimê,
Xewa min hat ez raketim.
Min marûmî hevraz banzda,
Welleh nizam çima nizm ketim.

22.

Hespê gede lawikê min qemer-qule ,
Min ê tewlek dayê gul bi gul e,
Xelqê gotiye: Lawikê te,
Ne tu tişt e; min gotiye: Min qebûl e.

23.

Dilê min dilberê dara dev gêlî da,
Çilkê darê hêşîn bûne bi sêrî da.
Tiliya min çe'vê dê û bavê ra,
Mêrê dîtî keçikê ra.

24.

Lê lê, van erd û esmana girmegirm e,
Delalê min sekiniye ser çe'la gênim e.
Aliyê malê dunê da hay, hay,
Bejin-balê da satûn lawikê min hakim e.

25.

Lawikê min ne hakim e, ne axa ye,
Dibên îro ber dîwanê çok vedaye.
Ji kesera dilê min ra,
Kîsikê dirava hemû şabaş daye.

26.

Hatiye nava mala tût-qeysî,
Min ne kirî, ne pirsî.
Xezal canê dû min ra,
Qewil-qirara nede bemû kesî.

27.

Ez geriyam çe'vkanîka li vê neqevê ,
Sîdana kawê sipî dike tirê şevê.
Xuzila şevêkê, şevê payîza,
Nava sîng-berê xezala xwe têketama xewê.

28.

Delalê, te li çe'va, li hêsira,
Xuzila kotîmêrê te bimira,
Min evdalî rokê rojî bigirta,
Êvarê fitra xwe xuliyê vegirta.

29.

Min şelekê kirî bi devekê,
Morî pê da kir barê extekê .
Yê orta du dila, çar çavan xeber de,
Kula xirab têkeve mala bavê.

30.

Gede-lawikê min xeyîdiye bav-birê,
Daye ser rênga vê Îdirê.
Min ê koma bav-birê şerm nekira,
Gede-lawikê xwe bihaniya ber çadirê.

31.

Te çe'vreşê kaniya kila,
Min ê sîb sê gulî jimirî orta mila.
Ez ê keleş kawa xwe bixazim dê-bavê,
Nedan ez ê birevînime kilîsê nava fila.

32.

Keçikê qurban, devê te ne devê dîna,
Pozê te qelpaxê zîna.
Ez ê te mala bavê xwe ra,
Têkime kereke sergiya .

33.

Gede, devê te ne devê kilamika,
Ba tê bayê qelemnika .
Ez ê êl-eşîra mala bavê te,
Qurbana êl-eşîra xwe kim heta koka.

34.

Çi keçika li hemberê,
Min cot kilam avîte serê.
Eger tu kihêl î jor da warê,
Eger tu bergîr î ber kapê xwe mexelê.

35.

Gede lawiko, tu diçî min bîr neke,
Navê min qaşa gustîla xwe ke.
Wekî welatê xerîbiyê têkevime bîra te,
Derxe qasekê ser da temaşe ke.

36.

Navê gora lawikê min "Gul" e,
Min çêkiriye bi tiliya kul e.
Heçî kesê bêje nerind e,
Bê: Yara min çêkiriye min qebûl e.

37.

Te av aniyê ava meyê,
Cêrê xwe daniyê bîn vedayê.
Were ramûsanekê min kerem ke,
Çolbê gundê me razayê.

38.

Te av aniyê av cewê,
Cêr sivikê tirê kewê .
Ramûsanekê min kerem ke,
Çolbê gundê me razayê.

39.

Kerî pez, garana vê piştê,
Dilê min jimirî bi nivîştê.
Hûn herge lawikê min nas nakin,
Yekî bejinbilind qeme piştê.

40.

Lawikê min siyar bûye boza gir e,
Boz bin da hûr hûr dixingire ,
Delalo, tu hêratiya bikire,
Bavêje ser zîn, bira toz negire.

41.

Lawikê min rabû ce'nî zîn kir,
Dewlek daye har-dîn kir.
Lawikê min gulên me hîştin,
Çû, şîlanê xelqê bîn kir.

42.

Ketime Çaxirbega kaviî cot kanî ne,
Yek şor e, yek şîrîn e.
Cerde Şiko ser me da girtiye,
Heval-hogirê min revîne.

43.

Gede, min cav şand tu nehatî,
Rê-dirb li me bûne qatî .
Ez ê bi ser gede-lawikê xwe ra,
Heram bikim ava vî welatî.

44.

Pezê lawikê min hezar e,
Lê hezarî bê jimar e.
Gede-lawiko, de kerem ke,
Em herine qasekê mal e.

45.

Dilê min kanînga dor bi qicî ,
Refê kewa hatin lê xericî.
Xuzla min ewî merî hatî,
Çe'vê xwe dî, bi dilê xwe zewicî.

46.

Qelûnkêşo, titûnxuro,
Tu diçî welatê xerîbiyê,
Te çima şeyê tuncika min xwe ra biro,
Hetanî xerîbiyê hatî,
Av û hêsira rûyê min evdalê kul kiro.

47.

Gede-lawiko, min qira li qira ,
Gede-lawiko min hat qeme piştê ra.
Xorto, ka qewil-qiyarê par vî çaxî?
Te yê sala îsal pê ra ter kira.

48.

Vê sibê baran barî ser şîlana,
Kevir-kuçik barî der cînara.
Heçî kesê têkeve orta du dila, çar çe'va,
Hevt sala bikşîne êşa dev-dirana.

49.

Lawiko, mala me jî, mala we jî,
Me tev çandiye kundirê bejî.
Tu diçî welatê xerîbiyê,
Nabêjî keleş kawê, xatirê te jî.

50.

Heylo dilo, heylo dilo,
Gûza koro bê kakilo.
Dibê paka xasto,
Pîsa xwe ra biro.

51.

Gede, ez ê belekî bûm,
Li ber çiya bûm.
Tava sibê, bayê êvarê dabû,
Ez ê xweberê heliya bûm.

52.

Serê Gilîdaxê bi mij e,
Kew dixûne, bilbil dihênije.
Kê dîtiye, kê bînaye,
Xal lê xe xarziya bikuje

53.

Heylo dilo, bengî nebe,
Bengî dibî, poşman nebe,
Heçî gava tu poşman bî,
Axiriya te xulî te be.

54.

Kaltî-pîrtî roja reş e,
Qîztî-xortî gula geş e.
Mirazê bédil çawa mirîşka ser kurkê rabe,
Per-baskê wêya bimaşe .

55.

Gede-lawikê min derê malê peya bû,
Tûncika ecemî ser namilê diş diş bû .
Heçî roja çe'vê min çe'va nakeve,
Ez hesab dikim can-cegerê min çurmîş bû .

56.

Gede lawiko rê ji dila naçe dila,
Şewitiye çemê Mexînê, baqê gula,
Min ser gede lawikê xun sond xariye,
Ez tu car nakebime tu paşila.

57.

Kerî pezê çendî wa ye,
Nêriyê nav da mîna ga ye.
Pêşiyê ajotî gede-lawikê min e,
Dû ajotî girtiye kul-ta ye.

58.

Ez ê berjêr çûm, hevraz hatim,
Orta gund da rastî gede lawikê xwe hatim.
Vî kurmalî avrûke çe'va da min da,
Çawa notlî topa Romê ez hingavtim .

59.

Dilê min kanîga Alecixê,
Kew sekiniye ser cocixê .
Heçî kesê têkeve orta du dila,
Bira derxe îlancixê .

60.

Lawikê min derket konê mezin,
Kolos xar kir reben ez im.
Lawiko, eger cindî-bedewa dixazî,
Ware bivîne yek jî ez im.

61.

Lawiko qurban, pezê hanê pezê kê ye,
Gede cano, pêşiyê berde bira bêye,
Heçiyê çûye, çûye; heçiyê maye,
Qelenê min zeriye ye.

62.

Ez ê sêv im, sêva ter im,
Qerefîla panzde per im,
Ji derdê gede lawikê xun,
Qudûm tune ez bigerim.

63.

Kaniyê gundê me dudu ne,
Ya wê da tê yara min e.
Ez ê delala xwe cara îcarîn,
Birevînim ya kuştin e, ya fermana serê min e.

64.

Lawiko qurba , dilê min dilê te ra,
Neyê, neçe êla me ra.
Dê û bavê min muhibeta me bizanibin,
Wê pirsê nepak bêjin te ra.

65.

Gede lawikê min nav Tahar e,
Qevza qeme karîbar e.
Lawiko cano, ware mala bavê min,
Sûretekî min ji te ra sêv e, yek hinar e.

66.

Lawikê min vê sivê berjêr meşiya,
Qevza qemê karîbar bû ji ber kişiya,
Ji kaniya gundê me vedigeriyam,
Çe'vê min pê ket dilê min êşiya.

67.

Evî Erezî guşeguş e,
Kevirê ortê tim duruş e,
Kê dîtiye xwe dîtiye, kê nedîtiye
Gede lawikê min bejinbilind î çuxreş e.

68.

Te av aniyê, ava kaniyê,
Cêr sivikê, dêre sipiyê.
Ez ê kawa xwe ra bînim,
Birincê Ûlexanê, goştê miyê.

69.

Ez ê xanîkî çêkim li vê dûzê ,
Ez ê pê da kim kakilê gûzê.
Ez kawa xwe tê da razên,
Her sê mehê ser payîzê.

70.

Ez ê gul im, gula sor im,
Qerefila panzdeh mor im.
Kîngê navê gede lawikê min tê,
Baskê min tune pê bifirim.

71.

Gede, bejina te dareke nav dara,
Hêşîn dike devî beyara,
Gede herge nayê mala bavê min,
Were malek, malê van cînara.

72.

Te çemo av hindiko,
Darê gundê me bi dendiko.
Îsal çendî çend sal e,
Ketime derdê yeke kofî niko .

73.

Te çe'vreşê, bûrî qurê ,
Zêra hilde bide jorê.
Ramûsanekê min kerem ke,
Bira dilê min da neçe gorê.

74.

Ne li vê hatinê, ne li vê çûnê,
Hêsirê min pir bûn, bûne hêsirê xûnê.
Gede lawiko, xatirê xwe ji min bixaze,
Bira nekeve dilê min derdê xerîbbûnê.

75.

Lawiko, te ez xastim qet nebirim,
Ez birincê ser êgir im.
Tu çi merîkî bêkar bûyî,
Qenca xast, xiraba xwe ra birim.

76.

Pezê nîvro ber bi mal bû,
Koz filitî beradan bû.
Lawikê min merûmê tenê bû,
Nav da tengezerî bû.

77.

Çi dareke rex gêlî da,
Her belgeki ser da sî da,
Şeriyet jî qebûl nake,
Keça hevde salî bidî mêrê bî da.

78.

Te qemerê, min tev dayê,
Zer xizêma lêv kutayê.
Ez terka te nakim,
Heta dergûş nevê dayê.

79.

Xuzla di mêrgê da,
Stuyê xwe xar kiriye aliyê rê da,
Ayê min dê-bavê min ra qe hilnede,
Ez ê danzdeh saliyê da dame mêr da,

80.

Pezê lawikê min, pezê komê,
Qesav hate dora zomê.
Xuzla ez berdîreke pal-pûl bûyama,
Gede lawikê xwe ra biçûyama Erzirûmê.

81.

Lawiko qurba, vî zinarî li me sî kir,
Bişkok vebû sîng sipî kir.
Xwedê baîsa ra qe hilnede,
Orta me da bekeqomsî kir.

82.

Gilîdaxa ber bi dunê,
Sûret sor bûne xal ketinê.
Par vî çaxî memikê kawa min tune bû,
Îsal pê ra hatine ber ketinê.

83.

Ez ê dûza geriyam li pesariya ,
Ez hatime bal şivana nav keriya.
Lawikê min ne li wir bû,
Huba dilê min jî firiya.

84.

Bêrîvanê, bêrîvanê,
Çe'vê reş e kildanê .
Îdî hevde-heyjde saliyê,
Sûret sorê ramûsanê.

85.

Kawê, kaniya gundê me merek e ,
Warê ez tu têkevîne kêf-henek e.
Xelqê bekeqomsî ku me divîne,
Pişta xwe min da ke şer ke.

86.

Lo kalo, min kal kiro,
Derê malê bi desmalê av lê kiro.
Lomanî xelqê ra , der-cinara,
Bi xwe ra cake cahil kiro.

87.

Li me daye stêrka xûl e,
Tavê daye ser tirba Şêx Resul e.
Kê dîtiye, kê bînaye,
Jin cahil e, mêr kal e.

88.

Ha bostano, bostano,
Ha bostano, beyaro,
Li bintara gundo,
Min lê çandiye xeyaro.

89.

Ha bostano, bostano,
Ha bostano, hindiko,
Li bintara gundo,
Min lê çandiye dendiko.

90.

Dêlikê wê da here,
Palan-pûltê wê da here.
Tu ne layîqî min î,
Yanga min enî kever e.

91.

Kopek , lawikê min xeyîdiye,
Tu bizanive beranê min ji malê ye,
Çûye hubrê , hubrê bîne,
Qesasê serê te ye.

92.

Ro çû miqara ,
Sî davêje zinara.
Dengê pêz, dengê berxa,
Dengê teyra mîna zengila.

93.

Navê ceniya gede lawikê min Xezal e,
Ez ê bisik-guliyê xwe têxime dax-hevsar e.
Çûnê nava êla, dosta, dujmina,
Bira bêjin çi siyarekî pergar e

94.

Navê ce'niya gede-lawikê min Xezal e,
Qerefila pozê xwe jê ra têxime ne'l-bizmar e.
Çûnê nava êla, dosta, dujmina,
Bira bêjin çi siyarekî pergar e

95.

Gede-lawikê min hate mala bavê min,
Qesta agirê cixarê, te ji min xaste,
Hergê min koma bav-bira şerm nekira,
Minê cotê memika bida desta.

96.

Lê dînê, xwe ba neke,
Derê mala bavê xwe gêzî neke.
Ramûsanekê li min evdalî kerem ke,
Orta heval-hogira da min poşman neke.

97.

Gede-lawiko, te kiras qîçko , qeme ber ra,
Neyê-neçe derê mala bavê min ra.
Cahil î çaxê min delalê da,
Nezer pîs e ji bejna te ra.

98.

Lê dînê, min navê te bîr kiriye,
Ez ê eşqa te ra bêjim: Nav Newatê,
Qilçikê bavêje ser hêratê.
Heçî kesê orta min te xeber de,
Mala bavê wan here ber mîratê.

99.

Gede-lawikò, dilê min,
Kevirê herî hewa,
Ser ra firî refê kewa.
Ez ê duakî bikim Rebê Alemê,
Nêçîra gede-lawikê min neçe badilhewa.

100.

Lê dînê, min ê navê te bîr kiriye,
Ez ê eşqa bêjim filan-bêvan,
Warê em ê destê hev bigirin,
Herina mala bavê te mêvan.

101.

Te qemerê, min tev dayê,
Zer xizêmê min av dayê.
Ez tu car, tu car terka qemerê nakim,
Heta lorik deylê negire nevê dayê.

102.

Ro derketiye ji mizgevtê,
Tavê daye ser malê, şirikê sehetê ,
Heçî kesê destê min,
Destê lawikê min xe wê here cinetê.

103.

Hespa gede-lawikê min filitî,
Êl-osman lê xevitî .
Koma bav-bira şerm nekira biçûyama pêşiyê,
Xelqê bigota: Dezgirtî bû, dil şewitî.

104.

Ez ê Rewanê ra têtê xim,
Çirê daynim, mûmê vêxim,
Ez ê bejina satûn lawê xwe ra şelekê bikirim,
Gulika pê da, pê da lê xim.

105.

Heçî kesê yar di gund da,
Şev û ro xem di dil da.
Notlî sîtileke çar çemil ,
Agirê qereçaliyê gur bin da.

106.

Gede-lawiko, qurban,
Tu yê diçî welatê xerîbê,
Min jî bive xwe ra,
Ez ê bi gêhê biçinim ce'niyê te ra.
Heçî kesê dost e ji xwe dost e,
Lê heçî kesê dujmin e,
Bira bigire kul-merez e.

107.

Lê lê zeriye, serê xwe bişo ser da, ser da,
Kefa sabûna reqê hilşîne,
Ser sîng-berê zer kever da.
De tu were ramûsanekê,
Ji sîng-berê kever, xal-xeta,
Min evdalî Xudê di kerem ke.

108.

Dengê min hurmetê,
Bira bela ve nav cim'etê.
Kê dîtiye, kê bînyaye,
Bûka rû bi xêlî,
Bive qismetê mêrê metê.

109.

Ez kew im, kewa di mêrgê da,
Stûyê min xar bûye aliyê rê da.
Gune stûyê dê-bavê min ve,
Hela hevt saliyê da,
Serê min dane ser balgiyê xerîbiyê da.

110.

Pezê gede-lawikê min hezar e,
Di gomê da zarezar e.
Gunê min stûyê rûsipyê gund ve,
Ne dar e, ne dardar e.

111.

Bejina kewa min, bejina dara,
Eniya kever, eniya zara.
Kewa min siyar kirin birine xerîbiyê,
Siyar, siyar bûn; dengbêj çûn pê ra.

112.

Te qemerê rû xûşxûşê
Zozan xaş bûn deşta Mûşê.
Tu yê par vî çaxî qîz bûyî,
Îsal pê ra ketî ber dergûşê.

113.

Pezê gede-lawikê min hezar e,
Hezarî bê hesab, bê defter e.
Gede-lawikê min xeyîdiye,
Çendî çend roj in nayê mal e.

114.

Kerî pezê li vê piştê,
Nêrî nav da kiştekiştê,
Ez ê pezê gede-lawikê xwe,
Bijimirim bi nivîştê.

115.

Te qiras qîçko, ser ra – ber ra,
Neyê-neçe derê mala bavê min ra,
Xazgîniya bişîne mala bavê min,
Ez ê bûktiyê bikim malika te ra.

116.

Çi palekî li biçinê ,
Ez ê çi kim malê dunê.
Heta sax vim li rûbayê dunê ,
Bîra min naçe heta roja mirinê.

117.

Gede-lawikê min şivanê pezê nêr e,
Der-pêşîra girtiye qilêr e.
Heçî kesê kincê gede-lawikê min bişo,
Ser min him minet e, him xêr e.

118.

Kiras-derpiyê van cahila,
Ez ê bişom kula dilê xwe ra,
Bi sabûna reqê,
Bavêjim ser pêjderê çadira.

119.

Gede-lawikê min şivanê pezê xesî ,
Ez dû te ra qewil-qiyara nadime tu kesî.
Gede-lawikê min li xerîbiyê,
Tena ava gola, nanê tisî.

120.

Çi dareke devê çêm da,
Qotik ser sêrî da.
Dê, bavê min,
Ez dame mêrê bî da.

121.

Gede lawikê min şivanê kavira,
Kavir berdane dev beyara.
Ez ê kiras, derpiyê te,
Bişom kula dilê xwe ra.

122.

Çi palekî rast-besta,
Gîha hûr bû pale westiya.
Ez ê xwe qurbana tilî,
Û pêçiyê her du desta.

123.

Baran barî ser şîlana,
Kevir-kuçik barî der-cînara.
Heçî kesê orta du dila xeber de,
Bira bikişîne êşa dev-dirana.

124.

Min ê agirê şamê dada,
Min ê gulînka xwe berda.
Ez ê nizam êtîm gede,
Kavirê deyna ku da rada .

125.

Te qemero, qeme ber da,
Qeme girêda, kemer ser da.
Bira lawikê min î şivan bihata,
Ez ê kerem kim ravim ber da .

126.

Hela binihêre kerî pezê çendî wa ye,
Qir têkeve nav gişkî cêwî zaye,
Miya gede-lawikê min e pal e pûl e
Nav da stewir maye.

127.

Bejina lawikê min tê bişkê,
Ez ê huba dilê xwe ra,
Kemberekê bikirim bidime piştê,
Huba dilê xwe ra rûnê teniştê.

128.

Evî zinarî me sî kir,
Bişkok vebûn sîng sipî kir.
Gede-lawikê min lê da,
Min ê rûnişt zarînî kir.

129.

Te qemerê salme salme ,
Sûret sorê qizil alme ,
Sê mehê zivistanê,
Orta min gede-lawikê min da,
Bûye bîst çar sal e.

130.

Navê gede lawikê min Tahar e,
Qevza qemê cewar e,
Şevêkê têkeve paşila min maqûlê ,
Memikê min te ra yek sêv e, yek hinar e.

131.

Îşev şev e, şev şilî ye,
Gahara pezê gede-lawikê min,
Girtiye av-herî ye.
Min ê go: Pezê xwe bikşîne,
Bin konê bavê min î reş î erebî ye.

132.

Gede-lawikê min sekiniye der dîwanê,
Gede-lawikê min qemer dike ji xudanê.
Ez ê heyrana bejin-balê,
Zarê şirîn xebêrdanê.

33.

Gede-lawikê min ji Erdîşê,
Boz kutaye bi qawîşê.
Min ê ji koma bav-bira şerm nekira,
Têxista orta xwe dergûşê.

134.

Gede-lawiko, dilê min dilê te ra,
Gede-lawiko, îro ga bişîne malê me ra.
Zozanê Axmuxanê hêşîn dikin,
Ken-henekê min, te ra.

135.

Hey dil, hey dil,
Ez ê naçime baxê bê gul.
Bira Xudê hasil neke,
Tu car, tu car mirazê bê dil.

136.

Lawikê min diçe gomê çêke,
Berfê, baranê tev hev lê ke.
Gelo îşev lawikê min ê,
Destê xwe sîng-berê kê dêlê ke.

137.

Vî şivanî hêkehêk e,
Qiranê nêriya sturî dîk e.
Wayne binya mala bavê min da,
Gede qurban şîv-şevîn ke.

138.

Le dînê, vî zinarî me sî kir,
Min bişkrok vekir, sîng sipî kir.
Heçî kesê hatî-çûyî dîtînê,
Yê bêjin keç-xort bûn laqirtî kir.

139.

Hate mala bavê min çi mêvanekî ezîz e,
Şûna taştê gede-lawikê min ra çi caîz e.
Ez ê cotê zer-memika bidime gede-lawikê xwe,
Bira bive vê payîzê van qira pê bileyîze.

140.

Sêv im sêva Erzihanê,
Hol bûm çûme ber dikanê.
Gede-lawikê min nexaş e,
Nizam kê derman dayê.

141.

Gede-lawiko, dernayê ser kuçîkê ,
Kevira nevêje vê cûcîkê.
Min ser lawikê xwe ra sond xariye,
Tu wextî zêr nadime ber tûnçîkê .

142.

Hîva gundê me hîva sava ,
Hîv li min, te xeyîdiye naçe ava.
Tilî-pêçiyê te çe'vê dê-bava,
Sala îsalîn tu xwe ra negirtin zava.

143.

Siya vî zinarî çi mezin e,
Sê xerîba xwe ra bin e.
Yê bejinzirav î xal-xet lê ne,
Ewa gede-lawikê min e.

144.

Du zeriya xozanê galegal e,
Yeke dêre sipî ye, yeke kurtik al e.
Yeka dêresipî hay, hay,
Yeka kurtik al dilê min xwe ra bire mal e.

145.

Çi kanîga pêş merekê ,
Cote keç derketine ji malekê.
Ya mezin bira ji xwe wê da here,
Ya biçûk ez helandim bi carekê.

146.

Çi kanîga dor bi çîm e,
Keleş kawê, tasê hilde ez tî me.
Herkê tu memikfiroş î,
Ez alincî me.

147.

Çemo, çemê Payê,
Berjêr diçe ber bi Kerbelayê.
Lê lê, te çima serê ceniya min berdayê,
Esker çûyê ez jê mayê.

148.

Dilê min hêlûna gogerçînê,
Gogerçînê xwe daye ser hêlûnê.
Satûn lawiko, dîtina min, te,
Bû dîtina Mem û Zînê.

149.

Zozanê me neçêrandin,
Xam berdîra dûv gerandin.
Keçê aliyê me,
Xortê aliyê we helandin.

150.

Satûn lawikê min biçinçiyê biçina dasê,
Min go gede qurban, dasa xwe lê xe bi hewasê .
Ez ê gede-lawikê xwe ra bipêjim,
Birincê Şerûrê, goştê qazê.

151.

Herê dînê, te li pîkî , min li pîkî,
Warê em ê herine bal qazîkî, bal lêpîkî .
Kê dîtiye, kê bînaye,
Du serê çê herine ser balgîkî.

152.

Here dînê, te go belê, min go belê,
Warê em ê herine birca kelê.
Têkevîne kêf-heneka,
Hetanî stêrka sibê me derê.

153.

Qaz im qaza mêrgê da,
Devê qazê gurzê gêhê da.
Ay-zarê min nemîne dê-bavê min ra,
Serê min dane ser balgiyê xerîbê da.

154.

Te çivîka serê benda,
Xuzla min zimanê te bixanda.
Jina çê dikeve destê mêrê kotî,
Welleh ne tê kuştinê, ne tê berdanê.

155.

Gelî kûr bû, ez daketim,
Qirş e hûr bûn ez pê ketim.
Bilind firîm,
Hevt tilînga nizim ketim.

156.

Satûn lawo, ware mala me ber bi ro ye,
Ez ê gede-lawikê xwe ra daynim nan û to ye.
Kalebavê min razaye,
Pîredayka min îro li kireşo ye.

157.

Hîv derketiye hîva sava,
Hîv qerimiye naçe ava.
Xuzla ew roj bê,
Ez bivime bûk, tu zava.

158.

Te delala reş e tarî,
Min tu hebandî nav malê alekalî.
Bavê go ez nadim bi hezarî,
Dê go ez ê bidim sêva sor e nîvekarî.

159.

Herê dînê, ser da ber da,
Çiya bilind e rê di ber da.
Kaw-kubara min bahata der da,
Kitana sêrî sipî, ba kira gulî ser da.

160.

Dilê min kanîga sîrê herîreşkê,
Min pişta xwe da stêr, kil da meşkê.
Gava ez çav kalê hevtê salî dikevim,
Qidûmê çokê min, şûşa dilê min pê ra dişkê.

161.

Haylo kalo, min kiro,
Bi dcsmalê av lê kiro.
Min ê kalê heyştê salî,
Xwe ra cake cahil kiro.

162.

Te geliyo, bi mesîlo ,
Gîha rabûye bûye xesîlo.
Kê dîtiye berdîrekê pal-pûlo,
Bikeve ber beranê kal î pîro.

163.

Dilê min hêlûna teyrê bazî,
Lê firiya cotê quling, refê qazî.
Gede, te can-cegerê min helandiye,
Tu qurhestûya çi dixazî.

164.

Gilîdaxa ber bi dinê,
Kosedaxê xal ketinê.
Memikê delalê par vî çaxî tune bû,
Îsal pê ra hatine ber qama gestinê.

165.

Dew dikilêm, dew nabe,
Rûn li meşkê bela be.
Kewanî qotikê ketiye ranabe.

166.

Dew dikilêm heywanê,
Avê tînim fincanê.
Hesen rûniştiye duwanê ,
Koçero duxwe qeyxanê ,

167.

Dew dikilêm, dew nabe,
Kewanî xewa xwe da bû,
Bûk ji xemla xwe da bû,
Heve rûnê wan hebû,
Ew ji meşka me da bû.

168.

Dew dikilêm, dew nabe,
Rûn dikilêm, rûn nabe,
Dew meşkê bela be,
Dew ser serê kewaniyê da bela be.

169.

Dewê me dewê çêla sor ,
Meşka me meşka çêla sor,
Malxwe ra hêkerûn e.

170.

Dew dikilêm, dew nabe,
Dew nêhêrê bela be.
Wexta xwesiya te rabe,
Por li sêrî bela be,
Delîl halê min ça be .

171.

Dew dikilêm, dew nabe,
Goştê golika sava be,
Li ser birinc bela be.
Wexta lawkê'm xewê rabe,
Delîl halê'm çawa be.

172.

Kewaniyê, sersistê,
Kilek li meşkê xistê,
Kêran, kutek tev şikestê .

173.

Dewê me ji teyrokê,
Rûnê me ji teyrokê,
Ya dikilê Şemamokê.

174.

Dewê me dewê çêla sor
Rûnê me rûnê çêla sor.
Dew dikilên dor bi dor.
Rûn para Rodiyê min,
Dew para Hafizê kor.

175.

Navê kewaniyê Kew e,
Kurma dêw da mewemew e.
Navê kewaniyê Almast e,
Kurma toraqê da kastekast e.

176.

Wê meşkê, wê darê,
Meşkê bibine bin darê,
Sofîno, werine hewarê.

177.

Kil-kil, kil-kil, kil-meşkê,
Kilek li meşkê xistê.
Dew dikilêm, dew nabe,
Dew li meşkê bela be.
Kewaniyê sersistê,
Hiriya par îsal ristê.

178.

Dewê me dewê nêriyê tît ,
Wî nêriyî fitefît,
Kewaniyê xwe egît.

179.

Kewaniyê milsistê,
Kilek li meşkê xistê,
Para xwe lê derxistê,
Kûçika eman dalastê,
Nexwaşê, te çima negot: Kute, tibistê .

180.

Dewê me dewê çêlekê,
Kurma xwe daye kêlekê.
Dew dikilêm, dew nabe,
Dew li meşkê bela be,
Gune stûyê gundiya be.

181.

Dew dikilêm kolanê,
Avê tînim fîncanê,
Rûn para Seyranê,
Dew para Gulanê.

182.

Kêrintîkêşo , qule qule,
Kêrintiyê bikişîne eşq-dil e,
Serê kêrintiya te zengil e,
Kêrintiya xwe destê xwe bigire.

183.

Çayîra bavê min mezin e,
Pala girtiye serobin e,
Serhonaz î birê min e.

184.

Dayê, gunê min nîbû,
Bavo, gunê min nîbû,
Şîr li bizinê tune bû.

185.

Keça ra meçe, keç e ter e,
Jinebiyara meçe jinebî digere,
Dayîka lorikê ra here, zû vegere.

*êjaya zargotina gelê kurdan himlî nava wê yekê da
ne ku ew çavkanîke dewlemend e bona lênihêrandi-
na gelek pirsên çand û dîroka kurdan, wan pirsê yên*

ku hemû aqara kurdzaniyê hildane nava xwe.

Celîlê Celîl

VI

Pêkenîn û Şîret

da
di-
ên

11

Bûk

Rojekê axê gazî kasibekî gund kir got:
-Filankes, gundê me da, keç tunenin, were em herine welatekî mayîn keçikekê kurê min ra bixwezin, bînin.

Mêrikê kasib ev yek bihîst, got:

-Pak axa, em herin, belkî usa bû ku min jî keçikek kurê xwe ra anî.

De, axê bi hebûna xwe karê xwe kir, mêrikê kasib jî bi hebûna xwe û rê ketin, çûn.

Ewana çûn, derketine welatekî. Axa kete welêt keçê dewletiya, bega, axa, bedewa, rinda geriya; mêrikê kasib jî keçê kasiba. Belê, çend roja şûn da axê keça axakî kurê xwe ra xwest, yê kasib jî keça yekî kasib û ewana tevayî vegeyan.

Riya wan dûr bû, êvarê ser kanîkê danîn. Axê arxalîxê xwe derxist, danî erdê û gote bûka xwe:

-Bûkê can, kerem ke rûnê.

Bûka axê hat ser arxalix rûnişt.

Mêrikê kasib ji potê xwe derxist û got:

-Bûkê can, kerem ke rûnê.

Bûka kasib aqil bû, potê xwezûrê xwe ji erdê hilda, dawêşand û avîte navmîla wî.

Axê ku ev yek dît, got:

-Filankes, kî zane were em bûkê xwe hev biguherîn. Diniherî ser bûka min çiqas zêr-zîv hene, gîşk te ra.

Mêrikê kasib awa bersiv da:

-Na, me her kesî weke fêmdariya xwe xwe ra bûk aniye, eva yek, ya duda, kirina bûka min hêjayî malê dinê ye. Ew yek ne tê kirînê, ne tê firotanê. Bila ber kes xêrê ji bazara xwe bibîne.

Ez ê pê şorbê vexwim

Carekê gundiyek diçe li malekê dibe mêvan. Kevaniya malê mêvîn ra şorbê tîne, lê kêvçî ji bîr dike.

Mêvan xwe xwe ra dibêje: "Ka hinekî sebir kin, belkî kevçî kete bîra kevaniyê." Lê mêvan dinihêre îdî şorbe sar dibe, dibêje:

-Xûşkê, xûşkê, ca kerema xwe min ra kêrê bîne.

Kevanî bi ecêb dipirse:

-Mêvanê delal, tu yê çi kî kêrê ? Tiştêkî usa ber te tune, wekî bi kêrê jê kî, bixwî.

Mêvan bi hemdê xwe dibê:

-Ez ê guhê xwe jê kim, bikim kevçî û pê şorbê vexwim.

Bêtifaqî ji mirinê xirabtir e

Rojekê kurê yekî bi şabûn hat, gote bavê xwe:

-Bavo, çavên te ronî, dibên dujminê me miriye.

Bavê li kur nihêrî û got:

-Kurê min, ew ne tiştê çavronayê ye. Ew rê, riya mirinê pêşiya me hemûya ye. Merî bi mirinê şa nabe. Çawa baran barînê, derê hemûya dibare, mirin jî derê her kesî ye. Lê ku te bigota, wekî bê tifaqî

ketiye nava mala dijaminê me, ez ê şa bûma. Kurê min, bîra xwe da xweyî ke ku ji mirinê xirabtir, bêtifaqî ye.

Cotkar

Cotkarekî kal hebû. Rojekê ji wî dipirsin:

-Cotkaro, qe lawê te tunenin, çira alîkariya te nakin?

Cotkar dibê:

-Şukur bi Xwedê hevt kurên min hene. Tenê yê herî biçûk hinekî baş e. Ew dîcedîne alîkariya min bike, lê belengazî him kerr e him jî kor e.

Miko

Miko dordar bû. Navê wî derketibû. Digotin, wekî dordarekî mîna Miko tune. Zivistanê, şevên sar diçû dikete firinekê, li ciyê germ radiza.

Sibê zû hişyar dibû, bilûra xwe derdixist û difitandê. Vê demê kî dihate ber firinê, Miko ew digirt û dibire qereqolê digot min diz girtiye.

Gotî bêsebir nebî

Go, xortekî ga bar kiribû û diçû êş. Ewî ga dikuta, wekî zû bigihîje êş. Danê nîvro, rê da rastî kalekî hat û pirsî:

-Kalê, ez ê çi wextî bigihîjime êş?

Kalê got:

-Lawo, wekî aha herî, tu yê sibê êvarê bigihî aş.

Kalê aha got û hîşt, çû. Kalê çûnê şûn da xort xwe xwe ra got: "Wekî usan e ez gotî diha lez kevim." Ewî dîsa ga da ber şiva. Hinekî şûn da ga mexel hat û xort kir-nekir ew ji ciyê xwe ranebû. Sibetirê

dîsa danê nivro kalê hat wir ra derbaz be, xort dît û got:

-Xorto, te gotina min fem nekir. Wekî te ga nekuta, hêdî hêdî biçû-yayî, naha tu zû va gihîştibûyî eş. Gotî merî çî dike bê sebir nebe.

Diçime tewlê

Go, padşakî şêir dinivîsî. Rojekê ewî hemû şairên welêt berav kir û wan ra çend şêirên xwe xwend û paşê pirsî:

-Gelî şaira, bêjin binê şêirên min çawan in?

Gişka destê xwe hev xistin, lê şairekî got:

-Padşa sax be, şêirên te gellekî sist in, bême'ne ne.

Navê wî şairî Ehmo bû. Padşê emir kir, wekî Ehmo bibine tewlê û dêrî ser da mift kin. Çend roj derbaz dibe padşa dîsa şairên welêt beşter dike û şêirên xwe dixûne, dîsa gişk destê xwe hev dixin. Padşa dibêje, herin şair Ehmo bînin. Padşa şêirên xwe ye nûh wî ra dixûne.

Ehmo dibê:

-Padşa sax be, şêirên we ye wê rojê ji yên îro rindtir bûn.

Padşa hêrs dikeve û dibêje:

-Zû bikin Ehmo bibine tewlê.

Çendekî şûn da padşa diçe welatekî dinê. Li wir, ew çend şaira gazî bal xwe dike û dibêje:

-Ez ê we ra çend şêira bixwînim, lê rast bêjin, ka binê şêirê min rind in, yanê na? Ez ê xeleta we jî bidim.

Ewî şêirên xwe xwendin û şairekî nav'eyan got:

-Padşa sax be, me ra tiştek ne pêwîst e. Em sen'etkar in, şêirên pak ra pak dibêjin, yên pîs ra pîs. Seba şêirên rind dilê me dişewite. Lê şêirên te xwendî ne şêir in, gilî-gotin in. Qe hûn nizanin hang-bangê şêira çawa dibe? Di riya Xwedê şêira nenivîse, here padşatiya xwe bike.

Ewana padşa didine bawerkirinê, wekî ew nikare şêira binivîse.

Wedê ew vedigere welêt, sibetirê dîsa şairên welatên xwe beşter dike, dîsa wan ra şêirên xwe dixûne. Ehmo jî nava wan da bûye. Dîsa gişk destên xwe hev dixin, dibên şêirên te rind in, bi qewat in. Lê Ehmo radibe dêrî va derê padşa dibêje:

- Ehmo, şair, ku da diçî?

Go:

-Padşa sax be, ez diçime tewlê.

Padşa go:

-Tu vegere, pêş da were.

Ehmo paş da vedigere. Padşa dibê:

-Tu were lap bal min, rex min bisekine, bila evan şairên derêw herine tewlê.

Paşê padşê dereqa seredana xwe da qal kir û got, wekî ew ji vir ha da tu wextî şêira nanivîse.

Dewran ya we ye

Rojekê Mîro xûşka xwe va ji gund diçûne bajêr. Usa dibe ewana tèn ber koç-sera padşê ra der-baz dibin. Kurê padşê çav bedewiya keçikê dikeve qerfê xwe bi Mîro dikeve û dibêje:

-Lo lo, ne tu tiştê, ewê keçikê vira bihêle here!

Mîro bi hemdekî fire dibê:

-Qure nebe, kurê padşê, îro heye sibê tune.

Kurê padşê bi ken û bi qerf dibê:

-Rastî jî tu yî bêhiş î! Ez qerfê xwe bi te dikim, dibêm xûşka xwe bihêle here, tu jî dibêjî, îro heye, sibê tune. Çi îro heye, sibê tune? Hemû tiştê me heye, Binê ev koç-sera, ev der-dor, ev mirovana gişk ye me ye. Lê çî te heye, rûto!

Mîro tê derxist kurê padşê serra ye, ewî tişteke fem nekir, lema jî got:

-Kurê padşê, ez ê nêta xwe te ra şîrove kim, te fem kiriye fem

ke; na, here bavê xwe ra bêjê, ew jî serederiyê dernexe, herine bal rimdar . Min te ra got, wekî îro heye, sibê tune. Ew yek dewran û wede ye. Îro dewran û wede ya we ye, ne ku hemû tişt. Diqewime sibê çerxa felekê usa bizivire tiştêkî we ser tiştêkî nemîne. Tu kes ya dunê nizane.

Kurê padşê qe nuqu nava mitala nebû û xwest êrişî ser xort bike. Lê tu nebêje wezîr dûr va sekiniye guh dide ser xebardana xort û kurê padşê, ew pêş da tê û dibêje:

-Kurê padşê, sebir ke. Min guh dida ser xebardana we. Ew xort giliyê pirr qîmet dibêje. Hema vê demê padşa wê da tê u dipirse:

-Wezîrê min, çi bûye, çi qewimiye?

Wezîr meselê padşê ra qal dike.

Padşa hinekî dikeve nava mitala, paşê dest davêje beriya xwe kîsê zêr derdixe dide xort û dibê-je:

-Xorto, tu rast dibêjî, ev çi ku heye ne ya me ye, lê dewran-wede ya me ye. Here bila Xwedê weke hişê te bext bide te.

Wekî min zanibûya...

Mirovekî ji hevalê xwe ra got:

-Welleh kî ku çav rûyê te dikeve, wê rojê ew têr nîn naxwe.

Hevalê wî lê vegerand û got:

-Wekî min zanibûya rast e, ez ê her sibe bihatama, li deriyê we xista.

Kewanî

Mêvanek tê mala yekî, êpêce wede derbaz dibe.

Mêrik gazî kewaniya xwe dike û dibêje:

-Lê lê, tu navêjî gelo mêvanê me birçî ye, yanê têr e?

Mêvan dibêje:

-Spas, min têr xweriye û ez hatime.

-Ca rabe çayekê bo me çêke, -malxweyê malê kewaniyê ra dibêje-.

-Bi Xwedê qaz di papûrê da tune, lê çay jî hebûya min ê biçûya şekir ji cîrana bixwesta.

Pez

Nexweşek tê bal doxtir û jê ra dibêje:

-Şeva xewa min nayê, doxtir.

-Ne cara dinê min te ra got, dema dikevî nav nivînan birek pez bîne ber çavên xwe û wana yeko yeko bijmire. Wê gavê xewa te yê bê.

-Doxtir, çi birek, çi du bir, çi sê bir... Ez hema dijmirim, hey dijmirim. Pêşiyê heta dehan dijmirim, paşê sed, hezar, sed hezar. Wê şûn da dikevime nav wan, hiriya wana yeko yeko dibirim, dibim hiriye difiroşim. Kêfa min xweş dibe; hê xewa min tê, ew jî sibe ron dibe.

Gundî û bajarvan

Rojekê gundîkî qe bajar nedîtî tê, dertê bajarekî pir mezin. Ew diçe nava bajêr digere û li ser avayî, qesrên bilind metel dimîne. Ha li vir, ha li dera hanê, tê dertê ber avayîkî pir bilind. Mêrik bi ecêb dibêje:

-Errriiik, lawo ev çi avayîkî bilind e lo. Kuro, gelo evana çend xanî danîne ser hev?

Paşê xwe xwe ra dibêje: "De ka ez wana bijmirim."

Ber wî avayî disekine dijmire: yek, du, sê... nod û neh (99). Bajarvanekî bi fen-fêl evê yekê dibîne û tê cem wî û dibêje:

-Kuro tu çima van xaniya dijmirî? Lê tu nizanî ku destûr tune xaniya bijmirin.

Gundî bi posîde dibêje:

-Na, bi Xwedê min nizanibû destûr tune.

-Wekî tu nod û neh manatî nedî, ji ber ku te nod û neh qat jimirî-

ne, ez ê te bidime girtinê.

Mêrikê reben radibe nod û neh manata dide wî bajarvanî û bawer dike ku bi rastî jî destûr tune xaniya bijmirin.

Pişti ku bajarvan diçe, gundî ber xwe da dikene û dibêje:

-Kîh, kîh, kîh. Ew çi mirovekî bêhiş e, min sed xanî jimirîn; lê heqê nod û nehan da wî.

Dîk

Go du dost hebûn. Yek li aranê, yek li gundê çiya dijî. Rojekê dostê ku li çiya dima hate mala dostê xwe, çend roja ma. Ewî tê derxist wî ra çawa pêwîst e hurmetê nakin. Lê dostê wî hatinê wiya ese yanê karek, yanê berxek ser jê fikir. Nebû, dostê ji gundê çiya hatî gili ber dostê xwe ra avît, wekî qe na dîk ser jê ke. Lê ewî xwe wan erda daneynî.

Êvarê wedê cî danîn razên ewî got:

-Na, ciyê min ber şemîkê daynin, ez ê sibê berbangê herim.

Xwedanê malê got:

-Qe tiştê usa dibe, jorê razê, berbangê dîk bangdanê rabe here.

-Na, ciyê min ber şemîkê daynin, dîk bang daye daye, bang nede jî wê rê da bang de.

Sibê ron dibe. Pez-dewarê gund diçe bajonê, lê cîran dinêre kul-fetê mala cîran ranabe, pezê wan gomê da, çêlek tewlê da maye û xwe xwe ra dibê: "Ka herime mala wan, Xwedê nekirî tiştek bûye." Tê mal û ber şemîkê dibêje:

-Xwedê xêr ke hûn çima xewê da mane?

Xwedanê malê dibê:

-Ne hê dîk bang nekiriye.

-Canim dîkê çi, roj hatiye navrojê. Şivana pez birine, gavana dewar.

Malxweyê malê zû radibe, direve derê holika mirîşka vedike û dinihêre dîk tune, dest xwe da vedigere mal û dibêje jinê:

-Dîk tine.

Jinik dibê:

-Xwelî serê te kim, ne êvarê dostê te yî kurd got: “Dîk bang daye, daye, bang nedaye jî, wê rê da bang de”. Te qemîştî dîk nekir, wî ra ser jê nekir, ewî jî qenc kiriye, dîk hildaye biriye.

Êge

Xortek bi erf-edet ji mala bavê xwe cêhê dibe. Roja cêhêbûnê bavê xort gazî çend porsipî û rispiyan kiribû, wekî bal wana kurê xwe cêhê ke.

Bavê rabû got:

-Gelî qewm-pismam, cîrana, ez ewqas cî-nivîn, ewqas pez-dewar, ewqas fero-fotik didime kurê xwe yî mezin. Bila ew cêhê be, here bibê xwedan mal-hal, ez ê kurê duda, paşê yê sisiya... bizewicînim. Naha, bila kurê min rabe bêje ji min razî ye, yanê na? Mal da çavên wî ser tiştêkî heye, yanê na?

Xort rabû got:

-Bavo, ez ze’f ji te razî me. Lê çavên min li tiştêkî ye, ditirsim bixwezim tu nedî.

-Na, lawo, xwestina xwe bêje?

-Mala me da êgek heye, ewê jî bide min.

Gişk kenîyan û bavê rabû êge anî da kur. Kur hate destê bavê:

-Bavo, ev jî henekek bû min kir. Kurê çê wê ça ke malê bavê.

Zirt prokûror

Go, yekî golîkek dizîbû û wî digirin. Roja sûdê prokûror radibe, dibêje:

-Du sal kela !

Yê golîk dizî, dibêje:

-Zirt prokûror, min golîkek diziye, du golîka bidim, îja du sal çi ye?

Elbehel

Heso têrê tijî ceh dike, kerê bar dike, bi xwe jî siyar dibe û berê xwe dide êş. Rê va têr qul dibe ceh hêdî hêdî dirije. Lê Heso qe tê dernaxe. Gava digihîje ber êş dinihêre hebê cehê ye dawiyê hildişe, ew bi dengê bilind dibê:

-Heso elbehel tê derxist, wekî têr qul bûye.

Penêr jî heye, nan jî ...

Heso ber keriyê pezê xwe bû. Wextekî nihêrî kerî pez bê xweyî tê, tevî pezê wî dibe. Pêşiyê şa bû, paşê xwe xwe ra got "ca rabim van der-dora binihêrim, binê ev pezê kê ye?" Heso hinekî vir da çû, hinekî wê da çû, nihêrî bin zinarekî da yekî telaşekî dirêj erdê veleziyaye. Heso nêzîkî wî bû, ser da qîriya ew meriv ranebû. Piyê xwe va pişt a wî xist, ew meriv dîsa ranebû, hinekî şûn da Heso fem kir ew miriye.

Heso xar bû nihêrî hevinek stuyê merivê mirî da ye, destê xwe kirê, dît nan-penêr tê da heye. Rika Hcso girt, rabû şiva xwe hilda û got:

-Naha şivekê, duda qafê vî xim, yê bêfem ê bêjin Heso neheq e. Lo, mala te bişewite, nanê te jî heye, penêre te jî heyê, tu çima miriyî?

Gustîl

Heso ra kurek bû. Lê tiliyên wî ser hev da qat bibûn, timê mîna kulmekê bû. Kurik bû 6-7 salî dîsa tiliyên destê wî venebûn.

Rojekê Heso hespekê siyar bû û kurik da terkiya xwe, hat derkete daristanekî. Bav-kur ji hespê peya bûn, bavê gote kur:

-Lawo, Xwedê xweş here, neçe, ez ê te vira bihêlim herim.

-Çîma, bavo?

-Lawo, tu seqet î, min tu birî ser şêx-mella, ser hekîm-loxmana, lê tiliyên destê te venebûn. Ne tu dikarî şivê hildî, ne çekê hildî.

Bav xar bû hate rûyê kur, pişta xwe wî da kir, gavekê-duda çû, kur para va gazî kir:

-Bavo, bavo, paş da vegere!

Mêrik paş da zivirî ku kur destê xwe vekirîye. Ew nêzikî kur bû, nihêrî kefa destê kur da gustîleke zêr heye. Pirsî:

-Lawo, ev çi ye?

-Bavo, wedê ez ji diya xwe bûnê, min ev gustîl ji destê mamarê derxistiye. Bav kur hemêz dike, hildide tê mal.

Şîrê keran

Berê axa, beg, xanim, xatûn berav dibûn şevên xwe bi gilî-gotin, laqirtiya derbaz dikirin. Begekî li San-Pêtêrbûrgê xwendibû hatibû. Digotin kesek ji bin gilî-gotinê wî dernayê. Lê beg dibihîze kurdek heye, navê wî Heso ye, dibên ew jî bin giliya da namîne. Beg teme dide hemûya ew kurd hatinê van dera wiya bînine cem min.

Rojekê beg ra dibên Hesoyê Kurd ji navberiya Kurdistanê hatiye vira.

Beg dibê îro ewî bînine êvariyê.

Heso tînine êvariyê. Dibên rîdansipiyê êvariyê jî hebûye. Ew ra-dibe dibêje beg:

-Beg sax be, hûn ê hev ra gilî-gotina bêjin, lê ez pêş da dibêjim, bila nava we da xirabî çênebe.

Beg dibêje:

-Lo, ev kurdê serê çiya çi ye, wekî bi gilî-gotina min girêde, mat ke.

Heso tînine êvariyê. Beg dibêje:

-Kurdo, çend zarên te hene?

-Beg, sax be 9 zarên min hene.

-Ve zivistanê tu serê wan çawa xayî dikî? Qe doşaniyê te hene?

-Na, bego, çêlekeke min heye, ew jî îsal stewir e.

Beg bi qure qure simêla xwe badide:

-Hela binihêre tu kurdekî çiqasî bêfe'm î. Tu çima nayêyî bal be-
gekî mîna min û doşaniya naxwezî?

Heso dibê:

-Beg, Xwedê te ji mirovatiyê kême neke!

Beg destên xwe hev dixe, gazî xulamê xwe dike:

-Kuro, Heso hilde here nava kerên me. Çend kerên zayî bide
vî kurdî, bila bibe hetanî baharê bidoşe, bila zarên wî bê sipîtayî
nemînin.

Heso hêdîka ji ciyê xwe radibe, destê xwe bi ezet-hurmet dide ser
sîngê xwe, ber beg temene dibe û dibêje:

-Beg sax be, tiştê nabe, ez ê keran bibim rojê sê cara bidoşim,
şîr buxun û em gişkê rojê sê cara destên xwe ber bi erşa bilind kin
bêjin:

-Ya Xalîqê Mezin, bila ev şîrê keran bibe xêra dê-bavê beg.

Ûradnîk

Rojekê Heso tê mala dostekî xwe mêvan. Sê roja dimîne, xurê wî
dibe pelûr, pişrûk. Roja sisiya ber êvarê ûradnîk tê dertê mala dostê
Heso. Dostê wî radibe pezekê ser jê dike, dixun-vedixun, dîsa Heso
dewsa tiştêkî danaynin.

Heso şev nivê şevê radibe dikeve oda ûrad-nîk tê da razayî û pa-
paxê wî hildide, hêdîka tê, dikeve oda keçan-bûkan. Ew hêdî-hêdî
diçe ser nivînê bûkê. Bûk hişiyar bûnê, destekî davêje hêta bûkê,
destekî va papaxê ûradnîk davêje ser bûkê û zû dertê, tê nava cî-ni-
vînê xwe da rehet vedileze.

Dibe qîreqîra bûkê. Radibin çirê vêdixin, dinihêrin papaxê ûrad-

nîk dêstê bûkê da ye. Mêrê bûkê şivekê hildide dikebe oda ûradnîk hema xewê da wî dide ber şiva.

Dibên, dengê vê qalê diçe digihêje padşe Nîkalê .

Şêro

Du şivan ber kerî pez bûn. Kurê yekî jî bal wan bû. Ewî her ro kurê xwe dişande nava baxê tiriya. Şivanê dinê dibê:

-Tu were her ro kurik neşîne diziyê. Rojekê xwedanê bêx wê belakê bîne serê Şêro.

-Lo mala te ava, navê kurê min Dilo ye, lê gişk jê ra Şêro dibên. Tu hew dizanî badilhewa jê ra Şêro dibêjin.

Şêro diçû dikete nava bêx, bin kolên tiriya da xwe vedişart, tirî berav dikir, bavê jî dûr va digot:

-Can Şêro, can!

Rojekê jî ew çûnê diziya tiriya, xwedanê bêx ew girt, kire hewar, çendê dinê jî hatin, Şêro dane ber şîla , peyna . Bavê Şêro vir da wê da diçû-dihat bi desta va çokên xwe dixist û digot:

-Wey mala min şewitî Şêro kuştin! Wey mala min şewitî Şêro kuştin!

Şivanê dinê ji zû zû digot:

-Canim badilhewa wî ra Şêro negotine! Tişteke bi Şêro nayê, ze'f ze'f wê du-sê parxanê Şêro bişkênin!

Xarin dew e, hereket jî ev e

Axa dixwest zeviya xwe bidirû. Pale lê pêwist bû. Çû gazî pala kir û got:

-Eva zeviya min e bidirûn.

Pala zevî nivî dirûtin. Wedê firevaniyê axa pala ra dew û nîn dişîne.

Hinekî şûn da axa tê dinihêre, wekî pale rûniştine. Dibê:

-Gelî pala, hûn çima runiştine?

-Axa, xarin dew e, hereket jî ev e.

Axa tê mal jina xwe ra dibê:

-Pale karê nakin, gotine min “wekî xarin dew e, hereket ji ev e”...

Malxweya malê hê rabû pala ra goşt, penêr, nan şand. Pala nan xarin û rabûn; bû şingêşinga dasa destê wan, zevî dirûn.

Rûvî û Gur

Rûvî û gur daristanê da hev ra bûne destebirakê hev. Gur gote rûvî, wekî daristanê da xarina te heye, lê ez birçî dimînim. Rabe here min ra tişteki peyda ke, yanê na, ez ê pirtiyê guhê te bihêlim.

Rûvî da ser rê, çû fêza gundekî, nihêrî kerek wir diçêre. Go:

-Kerê bira, were em herine daristanê, li wir gîha ze’f e, a davêje bejna min.

Kerê da pey rûvî hatine daristanê. Gur çav kerê ket, şabûna reve-rev ber bi kerê hat. Ker tirsîya dîsa vege’rî fêza gund.

Dîsa gur ser rûvî hêrs ket û got “wekî tu neçî kerê neynî ez ê te kerî kerî kim.”

Rûvî da ser rê hat rastî kerê hat.

Go:

-Were em herine daristanê.

Go:

-Do hindik mabû gur min bixwe.

Go:

-Welleh ew xalê te ye, ew şabûna ber bi te revî.

Ev gilî ketinê hişê kerê, dîsa da pey rûvî, hatine daristanê.

Evê derbê gur nerm nerm ber bi kerê hat. Gur devê xwe bire stûyê kerê, kerê tirê gurê wî maç ke, çawa xalê wî. Gur dev avîte qirika

kerê û xwer.

Gur têr xwer çû razê, lê gote “rûvî, gava tu pirtîkî bixweyî ez ê te bikujim.” Gur xwe ra raza. Rûvî rabû bêgav ma, mejûyê kerê para va qul kir, xar. Gur rabû medê wî neçû goşt, go “bisekine, ez ê mêjûyê kerê derxim, bixum.” Nihêrî mêjû tune gote rûvî:

-Te mêjûyê kerê xweriye.

-Gurê bira, -rûvî bi fêlbazî bersîva wî da, -wekî mejûyê wî hebûya qe ew di hate vira.

Xirpo

Li bintara gund goleke kûr hebû. Zarên gund dihatin wê golê da av xwe dikirin . Zaran bi qerf yekî ra digotin Xirpo. Hey bi qest pesinê wî didan: “Hay Xirpo awa mêrxas e, Xirpo ji tu tiştî natirse, ewî çar gurçikî ye.”

Rojeke havinê zaran golê da av xwe dikirin Xirpo jî hate wira. Zaran dîsa pesinê wî dan:

-Xirpo bixweze wê ji vî sere golê here wî serê golê. Ka qe xozneberê mîna Xirpo hene?

De usa gotin, usa bilandin , Xirpo usa pesinandin, ew bi xwe jî ser xwe metel ma. Ewî xwe xwe ra got: “Rastî jî, ez yekî usa me”.

Xirpo usa di xwe da werimî, qure bû, rabû ser xwe, qe kincê xwe jî dernexist, xwe avîte golê. Tifalî hema carekê, dudu kire bilqebilq:

-Wey li min bavo!

Cotkar

Du diz ro da digerin tişteke nakeve destê wan. Tê ku herine mal, dinihêrin mirovek cot dike. Dizek dibê:

-Kuro, were em gakî vî cotkarî bidizin.

Yê dinê dipirse:

-Çawa?

-Tu derê ser topikê hanê, hey xwe ra bi dengê bilind bêje: “Ez metel im! Ez metel im!” Ez ê jî xwe vira veşêrim, wekî dinê çî te pê neketiye.

Ewana usa jî dikin. Hinekî şûn da cotkar ga dide sekinandinê û xwe xwe ra dibê: “Ca herim bal wî mirovî, binê ew çima hey dibê: “Ez metel im, ez metel im!” Ka binê ew metelê çî ye”.

Cotkar berê xwe dide hevrêz here bal wî, yê ku dibê, ez metel im, ez metel im. Dizê dinê diçe gaki ji nîr vedike û piş newalê da qulobanî dibe . Cotkar tê digihije dizê dinê, dipirse:

-Eva wedekî dirêj e tu dibêjî ez metel im, ez metel im, Lo birao, tu metelê çî yî?

Diz radibe bi ezet-hurmet selamê dide cotkar û dibêje:

-Welleh êpêce emirê min heye, lê min nedîtiye mirov gaki va cot bike? Ez ser wê yekê metel mame!

Cotkar vedigere, dinihêre rastî jî gak tenê ye, dibêje:

-Birao, hema ez bi xwe jî metel im.

Hesp

Yek jina xwe dikute. Qîreqîra jinikê bû, li cîrana dibe hewar-gazî. Du-sê cîran diçine hewariyê, jinikê ji destê xort derxin û yek dipirse:

-Lo, Xwedê mala te ava ke bêjim, ava neke bêjim, tu çima vê feqîrê awa dikutî? Çima çî kiriye?

Xort bi hêrs dibê:

-Ne hûn rind dizanin heylo mala bavê ku ye? Ez sibê berbangê hespê siyar bûme çûme gundê ku mala bavê min lê dimîne, nîvro jî vegerîme. Hespê him xwe daye, him jî westiyaye. Ez hê hespê peya bûme, jinik dibê, “naha jî ez ê hespê siyar bim herime mala bavê xwe”. Mala bavê wê jî êpêcekî dûr e, ez dibêm “bila hesp rehet be, sibê siyar be here mala bavê xwe”, ewa dibê “na”.

Cîranê lap î nêzîk dipirse:

-Ka hespa we kanê? Te hesp kengê kiriye? Qe hespa we ber çavên

min nakeve? Xort bi hêrs dibê:

-Hûn jî hema aqilê jina min da nin. Ez mesele dibêjim, ez ê hespê bikirim, zîn kim, siyar bîm herime mala bavê xwe, bêm, jinik jî dibê "hema tu ji hespê peya bî, ez ê wê deqîqê hespê siyar bîm herime mala bavê xwe".

Cîran bi wan dikenin, diçine malê xwe.

Deh pez

Yek tine, deh peza dide kirîvê xwe yî Heso û dibêje:

-Kirîvo, van deh pezê min jî tev pezê xwe ke bibe zozanê, aranê da dimînin kok nabin . Xêr-xweşî payîzê ez ê bêm pezê xwe bivim.

-Ser her du çavên min, -Heso bersiva kirîvê xwe dide, - lê ez ê pezê te nebim, ez ê pezê kê bibim!

Payîzê kirîv bi du-sê camêra va tê mala Heso, wekî pezê xwe bibe. Heso dibê:

-Ez serê kirîv kim, roja em ji aranê derketin, sibetirê em gihîştme bintara çiya. Tavî-baranê, zîpikê usa lê kir, dê ewledê xwe davît, sê pezê te ketine ber zîpikan qe kêrê ra negihandin, mirar bûn. Mane hevt pezê te. Îsal li zozanê hinek pez ta ketin , hinek kullekê ketin. Pezê kirîvê min him tayê ketin, him kullekê, sê heb jî usa mirar bûn. Mane çar. Ew heçar pezê kirîvê min rind kok bibûn, ez şa dibûm, min xwe xwe ra digot: "Kirîvê min ê payîzê duda ser jê ke, xwe ra têke qelî". Ne bi xêr şevêkê xewê li min zor kir, ez dikevime xewê. Wextekî rabûm keriyê pêz herikiye, ji guharê çûye. Guran sê pezê te pirtî pirtî kiribû. Ez bi serê kirîvê xwe ma yek. Ew yek jî wedê dagerê hêl jor da hat, pîkî wê seqet kiriye. De ew peza seqet jî heqê min.

Kirîvê Heso û camêrê hatî bi wî dikenin. Heso sikûmê xwe da-dixe û dibêje:

-Erê, kirîvo, kurdekî belangaz ketiye destê we, hûn pê dikenin. Pê bikenin, ez ê mirovê mîna we ye maqûl ra çî bêjim.

Kalê

Rojekê ji kalekî dunêdîtî pirsîn:

-Dunê da ra çi nabe ?

-Dunê da, -kalê bersiv da, - ra sê tiştî nabe: yek serêşê, yek çavêşê, yek jî ewledê xirab. Raste, dû-dermanê çavêşê, serêşê heye; lê serî êşyanê nikarî jê kî, çav êşyanê nikarî derxî, ewledê xirab jî ne tê kuştinê, ne tê firotanê.

Her sehetekê hukumê wê heye

Go, padşê zalim qest gazî hoste-ne'lbend kir, got:

-Sibê şeqê ez û pênsid siyarî va têne mala te mêvandarî. Tu gotî me ra ezet-hurmetê bikî û pênsid hespên siyara ne'l kî. Hoste-ne'lbend kete fikir û zikira.

Padşê bi xezeb pirsî:

-Çima dengê xwe nakî?

-Padşa sax be, -hoste-ne'lbend bi kulzikî bersiva padşê da, - ew yek ji qewata min der e, feqet tu yê bêtir were. Lê her sehetekê hukumê wê heye. Padşa bi hoste-ne'lbend kenîya:

-Evî gêj çi dibêje?

Sibê, şeqê bersiv dane hoste-ne'lbend, wekî padşa dibê:

-Bele, her sehetekê hukumê wê heye, bila ew rabê bê, jina min miriye, tabûtê çêke.

Xulam

Ezrêhîl hate maleke dewlemed. Mer-jin û xulamê wan mal bûn. Ezrêhîl got:

-Ez hatime îşev ji vê malê du mirovan bibim.

Gişka, mer-jinikê çavên xulîm nihêrîn. Xulîm got:

-Him çi çavên min dinihêrin, yek ez, lê yê dinê?

Neaniye, nabe jî...

Go, du dost hebûn, yekî rabû ga cil kir û berê xwe da mala dostê xwe. Hema ew gihîşte derê mala dostê xwe, ga da ber şiva.

Dostê wî ji malê derket û pirsî:

-Camêr, tu çima ga dikutî?

-Welleh, min rûn lê kir neanî, qelî lê kir neanî; eyarê pêner lê kir neanî.

-Ey dostê qenc, qe gê mekute, neaniye, nabe jî...

Deyîn

Go, du dost rastî hev tên, kêf-halê hev dipirsin û yek ji yê dinê dipirse:

-Hal, wext, qe çawa derbaz dikî?

Go:

-Ez deynê xwe didim, deyin didim.

Go:

-Welleh, te sergirtî got, min tiştê fem nekir.

Go:

-Ez deynê xwe didim, yanê dê-bavê xwe xweyî dikim, deyn didim, yanê zarên xwe xweyî dikim, wekî ewana paşê min xweyî kin. Ez bi xwe jî pak derbaz dikim.

Dê bi bîr anî

Xortek dizewice. Destgirtiya wiya, tişt pê nedibû, nikaribû mêrê xwe ra xurek hazir kira.

Rojekê ewa xurek gellekî şor dike û êvarê wextê tevayî rûdinên wî xurekî dixun, ji kevçiyê pêşin hêşir ji çavên bûkê dibarin. Xort dinihêre kulfeta wî digirî, jê dipirse:

-Jinik, çima digiriyî?

-Diya min e rehmetî kete bîra min.

Xort jî ku kevçîkî-duda xurek dixwe, hêsir ji çavên wî jî tîn. Vê carê jin jê dipirse:

-Mêrik, tu çima digiriyî?

-Qet diya te ye rehmetî kete bîra min jî û wekî ewê wedê da tu hînî şuxul-emel bikirayî îro ne ez, ne tu nedigiriyân.

Dujintî

Go, yekî bi jin û zar hebû, lê dîsa dixast bizewice.

Rûsipiyê gund ev yek bihîst, rabû çû mala wî merivî. Ewî rabû, wekî rûsipî ra hurmetê bike, lê rûspî nehîşt, got:

-Lawo, min bihîstiye, wekî tu dixazî hêwiyê bînî ser jina xwe. Naha ez ê bûyerekê bêjime te, wê şûn da tu zanî, hiz dikî bizewice, hiz dikî nezewice. Ez xortiya xwe şivanê begekî bûm. Du kerî pezê beg hebû, lê sekî wî. Navê sê "Qolo" bû. Sibê zû min keriye pezê ku min diçêrand, dida pêşiya xwe, alîkî da diçûm, şivanê hevalê min jî keriye xwe alîkî mayîn da dibir. Min alîkî gazî "Qolo" fikir, şivanê hevalê min jî alîkî. Belengazî "Qolo" him direvî cem min, him direvî cem şivanê dinê, kutasiyê hilkehilk "Qolo" diket û nav her du keriye pêz da diket, paşê me çiqasî dikire gazî, îdî ew ji ciyê xwe ranedibû. Ne vir da dihat, ne wê da. Lawo, rind fem ke, wekî mêrê dujin kutasiyê dikeve halê "Qolo". Min bûyera xwe got, wekî dinê tu zanî, ez çûm.

Pey bûyera kalê ra mêrik gellekî poşman dibe. Îdî hêwiyê nayîne ser jina xwe.

Lê kurê te yê çî bike?

Go, aşvanek hebû, qe qencî nedikir. Ew rojekê satircemî bû. Aşvan zanibû, wê bimire gazî kurê xwe kir:

-Lawo, îro da tu yê dewsa min aşvantiyê bikî, ez ê bimirim, lê gişkê çêra gora min bikin.

-Çima, bavo?

-Ji ber ku wexta dihatine êş, hê arvan nehêrayî, min şehed distend.

-Ê, bavo, ez ê usa bikim, kî bê êş rehmetê li te bîne.

-Lawo, tu yê çi bikî?

-Hema min nihêrî yek arvan tîne êş, ez ê ber dêrî bibirrim, hema derva şeheda êş bistînim.

Aşvan hinekî kete mitala û paşê kêlimî:

-Te usa kir, lê kurê te yê çi bike?

Her du jî zûr bûn rûyê hev nihêrîn.

Te çi zanibû?

Êvarîkê da leca piyanîna lêdaya bû. Yekî ze'f rind piyanînê dixist. Gişka wî ra destên xwe hev xistin. Ji nava mirovan yek çû, nêzikî piyanînê lêdayî û destê wî girt hejand û got:

-Birayê kurd, eferim, sed car eferim, te rind lê dida.

-Lo lo, tu min nas dikî, te çi zanibû ez kurd im?

-Xênî ji te piyanîno lêdaya stola bin xwe ber bi piyanînoyê dikişand, lê te piyanîno ber bi xwe dikişand.

Bû pirqapirqa herda jî kenîyan.

Riya qurfê kîjan e?

Pîrek û keça wê hebû. Havînê gişkan karê zivistanê dikir, lê pîrê digot, wekî heta zivistanê ez ê bimirim, keçikê jî got, ku ez ê herime mêr.

Zivistanê derî birrî, berfê lê kir. Ne pîrê mir, ne keçik çû mêr.

Mal da jî ne ar hebû, ne arvan, tî-birçî bûn. Wana hê herekê mê-

zerek girêdan û derketine kuçê pirsîn:

-Riya qurfê (başaxê) kîjan e?

Gurê sere çiya bî, lê tenê nîbî...

Giva maleke bi pergal hebûye. Rojekê malxweyê malê kulfeta xwe ra dibêje:

-Jinik, van cîrana hetika me biriye. Çi wan kême be, tên ji me dixazin. Were, em ji vira koç kin, herin dûrî gundiya bijîn, bila kesek dora me tunebe. Rojekê yek tê derziyê dixaze, yek tê elekê, yê mayîn tê tişteki mayîn dixaze.

Belengaza jinikê nikare tişteki bêje, bar dîkin û diçin...

Rojeke payîzê malxweyê malê gênim dadigire, here aş.

-Jinik, ca bijûnê bîne, derê têran, çewalan bidirûm.

Vir da bijûn, wê da bijûn, kulfeta malê bijûnê nabîne û tê mêrê xwe ra dibêje:

-Mêrik, bijûna me unda bûye.

-Unda bûye, unda bûye, here ji mala cîranekî bîne.

-Ka cîranên me çi dîkin, mêrik?

-Êêê, rast gotine, gurê serê çiya bî, lê tenê nîbî.

Ewana careke mayîn mala xwe bar dîkin û tene cem cîrana.

Şêr û mişk

Lana şêr û qula mişk rex hev bûn. Şêr usa kubar kubar diçû-dihat, qet bine piyê xwe jî nedinihêrî.

Rokê, wextê şêr hat derbaz be here, mişk kete nava lepê wî. Şêr xwest mişk bihincirîne, mişk ber şêr geriya:

-O, rebê min, rebê min! Min ji bin piyê xwe aza ke ez ê rojekê kêrî te bêm.

Bû pirqepirqa şêr, keniya. Usa keniya, wekî çok lê sist bûn, mişk

ji nava lepê wî derket, revî.

Çendekî şûn da, nêzîkî qulika mişk zarîna şêr hat. Mişk bi tirs serê xwe derxist û nihêrî. Nihêrî, wekî mîna nexweşekî hevt sala nalenala şêr e. Mişk çû-dît ku şêr ketiye tela nêçîrvan. Mişk pirsî:

-Şêro, birako, çi bûye?

Şêr bi posîde:

-Ez ketime telê.

-Qe belangaz nebe, ez ê te xilaz kim.

Mişk werîsê telê bi diranê xwe hêdî hêdî qetqetî kir, birrî, şêr ji qezîyayê xilaz kir. Wê şûn da, wextê şêr rastî mişk dihat, ber wî temene dibû.

Weqes berx kî ye biçêrîn?

Erf-edetê kurd weqes (ewqas) dewlemend e. Him jî ji hev rindtir in.

“Beranberdan” jî, ji wan erf-edetanan e. Wextê “Beranberdanê” şayîyeke mezin derbaz dîkin. Li şayiyê “Beranberdanê” beran dixemilandin. De strûyê beranan gul-gontaz, kitanên reng bi reng girêdidan. Keç-bûk, zar-mezin saykê (gişk) bi şabûn berav dibûn.

Ji aliyek dengê zurnavanan, ji wî aliyê din va miyan, ji wî alî beran dianîn. Kalekala pez-beranan, ken-henekê xort-keçikan, dengê kilam, def-zûrna...Te digot ji şabûnê herd (erd) diheje. Ji wî derê parekî dûr jî, pir çaxî li ser kaniyan qasik û beroşê de bi goşt tijî dike-liyan. Paş (pey) van şayîyan ser desterxanê şayiyê xwerin-vexwarin dibû. Rojeka aha da li gundê Bozdî (naha Bozlû), nehiya Laçînê, lawikekî ku berx diçêrandin mêze dikir, mêze dikir û dest pê dikir digiriya.

Ji wî pirs dîkin ku tu çiman digirî?

Ew bi giriwayî dibê:

-Mêze kin weqes pez tê beranê. Ev pez ku zan, kî ye berxan biçêrîn, elbetê ku ez.

*“Serfîniyaziya mêrê kurd civakiyê da ci û rewşa wî
êpêceki jinê va girêdaye.”*

M. B. Rûdênko,

VII

Hêjaya karîbarên gel di çi da nin?

Nîgara jina kurd nava beyt-serpêhatiyan da

Rûpêlekî dîroka kurdan zargotina wê ye dewlemend e bi pirçiqil dixemilîne. Çawa hatiye eyankirin , wekî curên nivîsara kurda ye pêşin ji sedsaliya VIIan gîhiştiye me. Lê dijwar e bidine kivşê gelo zargotina gel ji çi hênê hatiye efrandinê ? Gelo kilama ewlîn kê hev aniye, kê straye? Kê mesele-meteloka pêşin ji ber xwe derxîstîye û mora riya bi sedsaliyan lê daye?

Bersîva van pirsana ferz bin jî bila sergirtî bimînin, lê bila ew yek bê kivşê heylo vî gelê hên çi hunurandiye . Kî ku dixwaze ziman, wêje, dîrok, etnografiya, erf-edetê gelê kurdan va mijûl be, cara ewlîn gotî ew zargotina vî gelî rind bizanibe. Ji ber ku emir-jiyîna vî gelî, dîroka wê ye kevnare ya dewlemend nav vê xezinê da hatiye parastinê. Zargotina gelê kurd him hên e, ji ber ku kurd xuluqiye ew jî xuluqîne, him jî dewlemend e. Xwedayê Mezin, xwezayê ji hebûna xwe sîniya zargotinê ye zêrîn e tijî rewayî her kurdekî kiriye.

Wê sîniya zêrîn da beyt-serpêhatî, kilamên reng bi reng, dilok, mesele-metelok, çîrok, gilî-gotinên bi şîret, bi şêwrdar hene û bi xêliya sed saliyan va hatine xemilandin. Bi nêta me heta naha çiqas folklorzanan, wêjezanan, dîrokzanan, ulmdaran, nivîskaran û helbestvanan ji wê bedewiyê çirpandine , li wê xêliyê mêze kirine, ser hev da anîne hela hindik e, hindik.

Wedê mirov pey lêkolîn-lêgerîna zargotîna gelê kurd dikeve dibîne ku, rê-buhurên Kurdistanê geriyayî, ulmdar, pêşekzan, nivîskarê li Kurdistanê qesidî timê ser dewlemendiya vê zargotinê heyr-hijmekar mane û hineka ewana ji undabunê dane xilazkirin. Bi gilîkî mayîn êpêçe çiqilê vê xezinê berav kirine û dane weşandinê. Bi bawerîke mezin dikarin bêjin, wekî sertaca vê dewlemendiyê ew beyt-serpêhatiyên bi rengîn in.

Ew “Siyabend û Xecê” ye, “Ker û Kulik” e, “Mem û Zîn” e, “Sêva Hecî” ye, “Eliyê Xarziya” ye, “Zembîlfiroş” e, “Dimdim” e, “Xatê Xanim” e û gelek gelekên mayîn in.

Ji hêza meriya der e, wekî nava gotarekê da derheqa van gişkan da mitalên xwe ron kî ser kaxaza. Em ê ji vê behrê dilopekê hildin û weke zanebûna xwe raberî xwendevana bikin.

Nava zargotinê da nîgara jina kurd cîkî hêle, cîkî berbiçav digire. Ji ber ku hê zarotiyê da ewa xwe davêje paşîla emir-jiyanê; buhust buhust mezinbûnê, rastî kevir-zinarê jiyanê hatinê, diwariya der-dora li wê war, zor kirinê, piyê xwe dike zengûya zînê kihêlê, piştî xwe dikute çiyayên bilind, dest dide destê bavê, birê mêr û wan bandûran pêpes dike û bi serfiniyazî ser wan ra derbaz dibe.

Lema jî paşwextiyê dewatan da sergovend e, meclîsan da zarîrîn-şêwrdar e, rojê oxirmê giran da piştovan, şeran da mîna amazonka ye jina kurd. Çawa hatiye gotinê menîke serbilindiya jina kurd ew bûye, wekî seranser Rojhilatê da jinan rûbend girtine, lê jina kurd timê rûvekirî bûye, hemû tişt bi çavên xwe dîtîye, bi guhên xwe bihîstîye, bi dil hatiye hebandin. Lema jî gotine: “Şêr şêr e çi jin e, çi mêr e”, “Jin stûna malê ye”, “Jinê dil kir, dîwar qul kir”, “Mêr çem e, jin gol e” û yên mayîn.

Gelê kurd nava beyt-serpêhatiya da, çîroka da, mesele-meteloka da, kilam-diloka da çiqasî jî nîgara jina kurd nitirandiye, lê tu qey dibêjî ew gişk hindik bûye. Bona peykelê jina kurd daha bilind bê xanêkirin, gel dest avîtiye miqama. Usa kiriye, wekî seba qedirgirtina jina kurd li dewatan, li şayiyan biçûk-mezin, keç-xort, risipî-porspî dest bidine hev, goveka govendê bidine firekirin, saz-

bend qaydê “Kofi”yê lê de, ewana jî bixingirin , bireqisin.

Gelê efrandar badihewa navê miqamê daneniye “Kofi”. Kofi çawa kolos, çawa papax nîşana nav-namûsê ye. Tiştêkî zendegirtî ew e, wekî dema leystika miqamê “Kofi”yê, govend giran giran pêş da diçe, govendgirtî gîşk serê xwe berjêr dikin. Eva yeka rûmeta here bilind e boy nefsa jina kurd, him jî em zanin hemû mirovaya dunyayê ber dayîkê temene dibe.

Cî ye bê gotin jina kurd bi xwe efrandar, hevaniya zargotinê ye here zane ye. Dema boy azayê, boy serbestiya weten mêrxasê mêrxas mir-inê, şehîd ketinê, ew yanê mêr e, yanê bav-bira ye, yanê xal e, ap e, yanê kurxal e, kurap e, yanê jî wetenhiz e; lema jî jina kurd hema li ser şînê kilamê bi qewimandinê ra dide girêdanê û bi van benda va dest pê dike: “Dayê, dêranê, xûşkê dêranê”, “Xûşkê porkurê”, “”De lo, bavo”, “De lo, birayo”...

Lê her ku wede derbaz dibe, ser kilama ewlîn e xuliqandî da bû-yerên jiyanê ye qewimî, qewimandinên zemîn ser da tê zêdekirinê û beyta duh îro dibe efrandarîke êpîkî ye mezin û gel ewê sal bi sal, qurne bi qurne xwe ra dide jiyanê. Lê gotî bê gotinê riya jiyana jina kurd, bext-mirazê wê gellek cara mîna jinên Rojhilatê ye mayîn keti-ye nava dûmana dewrê, zîpîkê, şilî-şilopaya zemîn ewa kutaye. Aha, nava dilokekê da ew şîna wêya rind tê kîvşê.

Ax, felek, xuzla di mêrgê da,

Stûyê min xar bûye aliyê rê da.

Ahê min erdê nemîne,

Çawa ez dame kalekî hevtê salî da.

Ev çarrêz şedetiya wê yekê ye, wekî timê jiyan jina kurd ra hev nehatiye bibe xwedanê bextê xwe. Lê tiştêk zelal, eyan e, wekî şayî-şîn, destanîn-kêmasiyên jiyanê, bi tevîbûna jina kurd derbaz bûye. Lema kurdzana eyan M. B. Rûdênkoyê gotiye, wekî di jiyanê da gellek cara serfîniyaziya mêrê kurd beqî jina ye.

Belê, usan e, di hinê pirsan da ewa bi kirina xwe ya hêle va fêza mêra disekine. Mesele, porkurkirin, gulîjêkirin nava kurda da ede-tekî gelekî giran e.

Boy her merivê mirî por-gulî nayê jêkirin. Dê-xûşk, bav-bira qewm-lêzirn, der-cîran gotî rind bizanibin seba kê gulî tê jêkirin. Gulîjêkirin bi şêwr tê derbazkirin. Giregir, risipî-porspî beşdar didin, pirsê hildidin, datînin hê biryar dikin, wekî gulî bê jêkirin û kincê mêrê mêrxas va bê dirûnê. Yanê na, sibê xelq ê bi nav-nûçika bê serê por, gulîjêkirê:

-Lêlê, serê te çêl kim, hela ewî ne tu tişt çî bû ku te boy wî gu-liyên xwe jê kir.

Lê wekî boy mêrê nav-deng, boy mêrê mêrxas, yê ku boy azaya weten bûye şehîd gulî hatiye jêkirin, ew jina, ew keça wê da hatinê gişk ji ber wê radîbin, rê didinê, ciyê we timê li bilindciya ye. Ew nefsdar timê mîna çiyakî bilind î destnegîhîştî tê xanêkirin. Nîgara jina kurd daha rind, daha bilind, daha zelal nava beyt-serpêhatiya da hatiye parîzandin. "Ker û Kulik" da Werdek, Perîşan û jina Emer Axa; "Dimdimê" da Asime, Kûher, "Mem û Zînê" da Zînê, Perî, "Xatê Xanim" da Xatê Xanim, "Siyabend û Xecê" da Xecê, "Eliyê Xarziya" da Hacê, "Memê û Eysê" da Eysê, "Zembîlfiroş" da Banû Xatûn bi her alî tene hizkirin û hebandin.

Van beyt-serpêhatiyê jorîn da nîgara her sîte -xatûnekê cêhê cêhê ye. Her yek xwedanê xesiyetekî ye, riya emirê her yekê, dunê-dîtina her yekê ne mîna hev e. Bona wana jiyan ne rûnê helandî ye.

Lema ulumdarê alman A.T.Şvêygêr-lêrxênled riya kara jina kurd ya giran aha ser hev da tîne: "Jina kurd ji berbangê, hetanî êvarê li kon, li derva dixebite; zarê xweyî dike, xurek hazir dike, çeka paqîş dike, hespa mêrê xwe yî hizkirî qeşav dike. Wextê mêrê wê ji nêçîrê bi serfiniyazî hatinê, yanê jî, ji şêr bi mêrxasî vegeîrîne gewlezê gula yî pêş da hûnayî dike stuyê hespê wî. Jina kurd ser şuxul-kar timê şa ye, her ku ewê teşî ristinê, yanê jî nexş ser nexşa da tevnê xistinê, dengê kilama wê ye şîrîn nava hewa paqîş da bela dibe."

Awa, beyt-serpêhatîyan da rind tê xanêkirin, wekî di jîyanê da

jinên kurd gişk ne mîna hev in. Werdek, Kûher û Xecê mêrxas in, bi cul'et in; Zînê, Eysê bi aqil, bedew in; Perî bi şêwrdar, mirovhiz, mêvanhiz e; Benû Xatûn bi tivdîr, bi cul'et e; Xatê Xanim boy azaya weten şerkar e, mêrxas e.

Nîgara her jinekê nîgareke tew e û ewê di nava xwe da zulma dewrê, dijiwariya kaşekaşa jiyanê, rastî-nerastiya zemîn ser hev da civandiye. Mînak, nîgara dayka Werdek. Werdek serkariyê li qebîla xwe dike. Ewa him mêrxas e, him bi hiş-aqil e, him bi tivdîr e. Ewa miqabilî nerastiyê, miqabilî zulma axê şer dike. Folklorzanê kurda yî eyan, rehmelêbûyê Heciyê Cindî dibêje, wekî beyt-ser-pêhatiyan da şerê azadariya gel dijî zeftkarên dereke cîkî berbiçav digire. Emer Axayê Millî her du kurê Werdekê dişîne riya nehatê. Ewana diçin, wekî ji Erebestanê hespa Bêcan bînin, wekî keça Emer Axa Perîşanê Kulikê bira bistîne. Werdek evê yekê temil nake û kincê şer xwe dike, çekê hildide û hespê siyar dibe, rikêfî derê mala Emer Axa dike û bi dengêkî şorişger dike hurmînî :

Te xirab be koçik û sera,
Teyê berê xarziya daye xala.
Şerê xal-xarziya usan e,
Notlî derdê bê derman e.
Emer Axa, te bimore kur e,
Te yê berê xorta dayê germ, germistanê,
Qûm û qûmistanê,
Te yê dunya li min kiriye hêlekan e.

Dayîka Werdek ewqasî zulma bega, axa dîtiye, wekî ev duniya bê serobin ber çavên wê biçûk bûye, mîna hêlekanê teng bûye. Îdî ewa, daha rast nûnera gel, di nava zulmê da, bindestiyê da tab nake , kêr hatiye hestû asê bûye û lema jî bi destên xwe dixweze neheqiyê minê ke , binax ke. Emer Axa ber vê jina şerkar aciz dibe. Ev yeka dide kîvşê, wekî miqabilî zordestiyê û dek-dolava, gel rabûye şer-kariyê. Emer Axa ber dengê dayîka Werdek, ber cul'etbûna wê, ber

de'wkariya wê çok vedide, ji ber ku dengê dayîkê dengê gel e, êriş a wê yekbûn a gel e.

Bona kur xwe riya zordestiyê negirin dayik hemû tiştî dike. Te tirê Werdek pêş da tê derdixe, wekî ev oxir ê reş bixemile. Lê kur giliyê dê nakin.

Kutasiyê dê dinêhêre kur ê herin, namekê birayen xwe ra dinivî-se tema kurên xwe dide wana. Çawa Heciyê Cindî dide kivşê xênî ji mêrxasiyê, Werdek xwedanê xesiyetekî mayîn e jî. Ew jî ew e, wekî ewa sed carî dipîve, carekê dibire, dûr ditiye.

Di şerê nav xal-xarziya da Kulik pey mêranî-mêrxasiya nedîtî ra giran tê birîndarkirinê. Ew rind tê derdixe ku wê bimire wesiyetê xwe dike:

-Kerro, birao, ez ku mirim meytê min ser hespê nebe. Ciyê min ser devê dayne, hêkekê jî bide destê min. Yek ji pêş da were gustîla Perîşanê têkime tiliya te.

Kerrê bira dixweze weteya wesiyetê wî pirs ke, lê Kulik dunya xwe diguhêze. Ker bi kulman va serê xwe dixê, lê îdî dereng bû. Him jî dikeve mitalan, Werdeka dê ji wî weteya wesiyetê Kulik pirs ke, lê ew ê çi bêje?

Belê, hewar digihîje dayîka Werdek ku Kulik hatiye kuştinê, Kerr hespa Bêcanê tîne. Çav li Werdekê sor dibin, xwe xwe ra dibê, yeqîn dema giran Kerr ji pişt a Kulik reviyê; lema ew hatiye kuştinê, ez ê Kerr bikujim.

Dayîka Werdek pêş kewrîn va tê. Kewran disekine. Kerr wesiyetê Kulik dê ra qal dike. Dê her tiştî fem dike. Kulik bi wî wesiyetê xwe va xwestiyê bêje: "Dayê, hesp bona mêrxasiyê ye, deve bona barbirinê ye. Min mêrxasî kir, lê dawiyê da bûme barekî giran. Dunê jî mîna hêkekê gulover e, him ji bê kelik e. Min bi mêranî, bi mêrxasî û bê xoftî dunê qevz kir, da destên xwe, ew jî pey mirina min ra tişteki vik î vala ye. Gustîla Perîşanê bona wê yekê kiriye tiliya Kerr, wekî ew Perîşanê bistîne, yanê na hinekê dinê ew ê bistînin û wê bêjin, Kerr vê oxirê -da çû, lê me kêf ajot."

Dayîka Werdek Kerr efû dike.

Şîrovekirina wesiyetê Kulik careke mayîn dide kivşê, wekî jina kurd dunêdîtî bûye, haj ulmê dunê hebûye û boy gulvedana wê, boy mirovayê keda xwe nehêwişandiye . Lê de tu were Emer Axê xayîn, dil bi xilt naxweze Perîşanê bide Kerr.

Ve demê Werdek xwe xwe ra dibêje: “Wekî ji hevt bira şeş birê min, kurekî mîna Kulik miriye, naha ne wextê şînê ye. Bihêle, Perîşanê Kerr ra bistînim, dewatê bikim paşê şînê bikim. Vê demê te tirê du dilê dayîkê hene, yekê da şayî ye, yekê da şîn e.

Beyt-serpêhatî him bi dewatê va, him bi şînê va kuta dibe. Lema gel gotiye: “Şîn û şayî birê hev in.”

Gel nîgara Werdekê çawa mêrxasek, çawa dayikeke dilrehm, dayîkeke xemxur, zane, zehmetkar xuluqandiye. Bi serî Werdekê em dibinîn, wekî jina kurd ne ku tenê teşîrê e, emenî-xalîçe, têr-xurc çêkiriye, gore hûnaye; lê ewa xwedanê hişbendiya kûr e, amedekar e, serkar e; bi gilîkî, tê kivşê jina kurd nefsdara dîrokê ye.

Bona vê nêtê mak kin , nêta kurdzanê zane V. F. Mînorskî ser da zêde kin. Ulmdarê hêja çendî çend ecara nava kurdan, li wira maye û bi emir-jiyîna wan va bûye nas. Ew pirtûka xwe ye “Kurdan” da dinîvise, wekî ez bi xwe bûme şehedê wê yekê, ku Edîle Xanimê çendî çend sala serkarî li qeza Hekariyê kiriye.

Beyt-serpêhatiya kurda ye pir hizkirî yek jî “Mem û Zîn”ê Memê Alan e. Sedsalî pey sedsaliyan derbaz dibe, gelê kurd wê motîvên nûh va dixemilîne û bi xwe ra dide jiyînê. Heciyê Cindî daye kivşê ku evê beyt-serpêhatîyê erf-edetê gel pak daye xayîkirin, wê ra tevayî dîroka gel bi bedewî û bi efrandarî nav xwe da ser hev da aniye.

Ev beyt-serpêhatî him ya mêrxasiyê, him ya evîntiyê ye. Alîkî evîntiya Mem û Zînê ye bextreş, bêmiraz, alîkî mêrxasiya Qeretac-dîn, Erfan û Çekan mîna birceke destnegihîştî hatiye hûnanê. Wedê qewimandinê folklorê dîrokê ra gav daye, ewana zo bûne, rabûn-rû-nişandina gel, kirina dewrê ye qenc û xirab mîna neynûkekê hatiye kivşê. Wê ra tevayî, ew zargotina dibe rûkî dîrokê.

Bi vê nêtê “Mem û Zîn” çavkanîke dîroka gelê kurdan e.

Qewimandinê beyt-serpêhatiyê hîmlî li Cizîra Botan têne derbazkirin. Dîrokzanê kurda yî sedsaliya XVI Şeref Xan Bidlîsî “Şeref-namê” da derheqa bajarê Cizîrê da, derheqa wê yekê da, wekî hîmê bajêr ji aliyê kê hatiye danîn, derheqa pêşdaçûyîna bajêr e paşwextiyê da, derheqa weteya navê bajêr da û derheqa birc, kelên Cizîrê da bi her alî elametiya dide .

Dibêjin, qewimandinê dîrokê diwekilin . Qirna XVIIa beyt-serpêhatiya “Dimdim”ê ser qewmandinê dirokê hate xuliqandinê. Qurna XXa “Xatê Xanim” hate efrandinê. Ew her du dastan dewr-wedê xwe ra girêdayî ne; lê çiqasî firqî hebe, ewqas jî mîna hevbûn heye. Nêta me ne ew e, wekî em ser wan gotina lêkolîna bibin. Ev kareke cuda ye. Lê bi tomerî her du dastan yên şerkariyê-azadariyê ne. Her du beyt-serpêhatiyên da jinên kurd him mêrxasiyê dîkin, him dayîkên hizkirî ne. Pey şerê giran ra, wedê Şah Abbas bi hemû hêzên eskeriyê va êrişî ser kela “Dimdim”ê dike û Xanoyê Çengzêrîn dibîne jimara leşker ne weke hev in, dujmin ê kelê bigire, emir dike, wekî bila kela nekebe destê dujmin, bi xwe kelê diteqîne. Di aliyê mayîn da dujmin dibê ku vê navberiyê da kurdan gişka qir kin, ji rûbayê dunê bidine hildanê. Vê demê jineke kurd e bi hemile derdikeve ser dîwarê kelê, kela teqandinê, bayê teqandina kelê wê jinikê dûr dûr davêje. Dibên, paşê ewa jinika diwelide, jê ra kurek dibe û wê şûn da kurd hev zêde dibin.

Bi zanebûna me vira qel du nêt daniye pêşiya xwe. Yek ew e, wekî kurd tu dema bi carekê va nayê qirê, zû yanê dereng wê bigihîje azaya xwe; yek jî qedirê jina kurd bilind kiriye û xwestiyê bêje mêrê kurd bi şûr, jina kurd bi kirina xwe va bona azayê zo ne, (cot in), yek ji yekê nayê cudakirinê. Ev yek nava nîgara Xatê Xanimê da jî rind hatiye nitirandinê. Ev dastana ya şerkariyê-azadariyê ye. Kurê Xatê Xanimê boy azaya gelê xwe tê girtinê; ewa pêşiyê bona kurê xwe tê meydana şêr; lê paşê dinêhêre Împêriya Osmaniye hemû gelê kurd kiriye hebsa bindestiyê. Lema jî ewa mîna dayka Werdek ya ku qurna VI.-VII. miqabilî zordesta şer kiriye, ev dayka sedsaliya XXa daha

bi cul'et e, daha bi hukumdar e. Xatê Xanim ne ku boy azaya kurên xwe, lê boy serbestiya hemû girtiyên kurdan şerkariyê dike, gel dora xwe dicivîne, serkariyê dike û dice'dîne ewana bibine xwedanê keda xwe, emir da neyêne zêrandinê, ji şeverêşkê derêne ronahiya.

Gofî neyê bîrkinê nava beyt-serpêhatiyên kurda ye hub-hizkirinê da jî mîrxasî heye. Nava wan beyt-serpêhatiya da "Mem û Zîn", "Siyabend û Xecê", "Sêva Hecî", "Zembîlroş", "Memê û Eyşê" û yên mayîn hub-hizkirin ser hîmê sê qewla hatiye danînê.

Bedewî, evînfî, yek jî cul'etbûn. Awa mînak, Zînê, Xecê, Banû Xatûn usa bedew in dunê da himberî wana kesek tune. Mêzîna evîntiya wana usa hatiye kişandinê, te tirê para wan mîna hev e. Zînê Memê hiz dike; lê destgirtiya merxasekî Cizîra Botan Çekan e, Xecê bi hezar têlên dilê xwe va ser Siyabend bengî ye; lê destgirtiya kurê Mîrê Ereban e. Banû Xatûn evindara Zembîlroş c, lê jina Mîr e. Ewana her sêk jî, ji tu tiştî natirsîn, ser xofa bindestiyê-radestiyê ra gav didin, pêpes dîkin, berê- da tê derdixin, wekî kuştin-mirin pêşiya wan sekiniye, lê bi cul'et dest didine destê evindarên xwe.

Hemû beyt-serpêhatiyên gele kurd da nêteke ro-robariyê heye, ew jî ruhê şerkariya boy azayê, serbestiyê ya boy hub-hizkirinê û nav-namûsê ye.

Nîşana mîrxasiyê

"Hesp miraz e", "Hesp û jin namûs e", "Hespa çê bira ye", "Hespa bin xwe nade kurê xwe jî siyar be", "Hespa çê qamçiyên xwe naxe", "Siyarê mîrxas hespê ruhê xwe ra naguhêre". Gel bi dehan mesele û metelokên awa derheqa hespê da efirandiyê: Ji ber ku bi sedsalîyan kurdan boy azayî-serbestiya xwe, şerkariya di nava qebîl û berekan da di ser piştê hespê biriye. Nîgara hespê mîna nîgara mîrxasan hatiye efirandinê, hatiye nijandinê. Nîgara hespan, hizkirina wan a di nava zargotina gelê kurd da bi efirandarîke heyr-hejmekariyê va hatiye nitirandinê. Badilhewa nîn e, wekî kurdan navê beşekî efirandariya bi qurna daniye "Kilamên Siyaran". Gava êvarîkê, meclîsekê da dengbêj dibêjê kilameke siyara bistirêm, bêjim, biçûk û mezin wê

deqîqê tê derdixin, wekî qewimandineke dirokî wê bê holê, kirina hespê çê, meydana şêr wê bê ber çavan ra derbaz be.

Bona nêta xwe mak kin em ê ji kilama siyara “Hamê Mûsê” ya ku weke poyêmekê ye, çawa mînak çend rêza bidine kivşê. Roja duj-min êrişî ser êla Berazan dike Hamê Mûsê, mêrxasê wê êlê, xûşka xwe Nûrê ra dibê:

-Nûre, tu xûşka birangê xwe bî,
Bike-bilezîne,
Xwe aliyê malê ra bigîhîne,
Kilîtê devê sandoxê xîne,
Deste kincê efata,
Ji kekê xwe ra derîne.

Nûrê dibe:

-Keko, ez qurbana nav-dengê te me,
Ez ê nizamî çekê efatê çî bi çî ne?

Hamê Mûsê dibê:

-Kulikê serê wan hemedanî ne,
Na welleh devetûkî ne,
Cote engalê Helebê dorê alandî ne,
Evê milê wan gulavdûnê Misêrî ne,
Şelê wan e hêşîn e Mahûdî ne,
Kiras-derpiyê wan sipî ne misqalî ne,
Rimê destê wan qemekî ne,
Serê rima îlandîlî ne,
Ortê wan sedefî ne,
Qîmetê wan sed bîst şeş mecîdî ne,
Menegiyê wan hêşîn e xalxalî ne,

Guhê menegiya kevçîkî ne,
 Simê wana kodikî ne,
 Navtengê wane qedlî ne,
 Civtê wan e kêwrîşkî ne,
 Gerdenê wan erîn-nîvekê ji nav pîla derketî ne,
 Zînê wan stembolî ne,
 Gemê wan diyarbekirî ne,
 Heçî gava mêrê-mêrxas,
 Ningê xwe dike zengûya zîn e,
 Li meydana mêrkuştinê,
 Bira dikeve, bira haj ciniyazê birê tu nîn e.

Vê poyêma epîkiyê da, usa jî di yên mayîn da xênî ji şerkariya azadariyê, dew-doza miqabilî dujmin, hal-hewalê roja reş, wekî gel hev ra neqayîlbûnên êl-eşîr, ber û qebîlan, erf-edet, çand, ya sereke riya mêr, mêrxasan, ya ku bi qewmandinan va kimkimî ye, çekên wan, serbilindaya wan e ser piştê kihêlan hev ra nedana girêdanê, ev gişk bi giliyê bedewîtiyê va nedana nitirandinê zargotina me yê nîvcî bima û tu dema ewê qurne bi qurne dîrokê ra gav nedida. Belê, di nava zargotinê da nîgara mêr-mêrxasan, riya jiyana wana û ya kihêl-hespan usa hev ra hatine hûnandinê yek ya mayîn digihîne bilindciya.

Di beyt-serpêhatiya “Mem û Zîn”ê da Bor, “Ker û Kulik” da Bêcan, Sosik, “Eliyê Xarziya” da Hoko û yên mayîn da nîgara hespan bi hewaskarî, bi mezinayî, bi hizkirineke kûr va hatine nîrxandin.

Gava folklorzanê kurda yî bi nav-deng Heciyê Cindî derheqa mêrxasên dastanên kurdan da gilî dike, pîrsa hespa ra girêdayî edetkî hên dide kîvşê dinivîse, wekî kilamên siyaran da mêrxas û hesp mîna ruhekî hev ra girêdayî ne. Gellek cara jîyan û mirina mêrxasan hespê ra girêdaye.

Wedê mêrxas dimire hespa wî dibe tevgelekî şînê. Wî edetî, wê

ewlekariyê ra dibêjin “Kotel”.

Roja şînê, hespa mêrxas zîn dikin, desmaleke reş davêjine ser zîn, gemê didine destê xortekî û ew dinihêre mirov wê da têne hewariyê, ew hespê destkêş dike ber bi wan diçe. Mirovên wê da hatî ev yeka dîtîne bi şîn-girî dibêjin:

–“Birao, birao”, “Koraya te” û hema wê demê kilamê davêjine ser mêrxas. Dengbêj, kilamhevanî qewimandina, nerastiya dewrê, zordestiyê, bindestiyê mêrxasiya mêrxas ra dide hûnanê û diqewime ew bi xwe jî nizane ku dîrokê dixuliqîne. Bi wê yekê va jiyana mêrxas, riya wî ye şerkariyê dibe rûpelekî dîroka gel. Her lêkolîneke kilamên siyaran mirova dibe derdixe salên dîrokê ye cuda cuda, him jî weyneka ber, qebîl, êl, eşîran, kirina wana zelal tê kivşê. Me jorê navê poyêmeke gel “Hamê Mûsê” kişand. Cî ye em dîsa çawa mînak, çend rêzan ji wê kilamê bidine rêzê û ser rawestin.

Delî delê, delî delê...

Siba me sibeke şîrîn e,

Êla Beraza êleke rengîn e,

Dîkê nîvê şevê li me dike qîrîn e,

Hamê Mûsê birre giregirê Beraza,

Konê reş î erebî da rûniştî ne,

Ber palê wan balgiyê tûkî ne,

Îşev êvar da qaleke giran danîne.

Kitêba dîrokzanê kurda yî nav’eyan Şeref Xan Bidlîsî “Şeref-namê” em rastî navê êla Beraza tên. Ew kitêba, ya ku bi rûsî sala 1967a hatiye weşandinê di rûpêlê 314a derheqa vê êlê da hatiye nivîsarê. Wedê qewimandinê kilaman û beyt-serpêhatiyan di dirokê ra têne girêdanê ew dibine peykelên dewr-zemanan.

Mêrxasî, altindarî, serfîniyaziya mêrê çê, hêza tîr-kevan, şûrê destê wî, berî her tiştî rev-beza hespê ra, rewş pergariya berzîn, zîn, gema bi heytehol ra girêdaye. Nîgara hespên ku beyt-serpêhatiyan

da hatine efirandinê siyarê xwe ra him serfiniyaziyê tîne, him jî dibe sedemê bedbextiya wî. “Mem û Zîn”ê da Bor çendî çend cara mîna mirova dikêlime û siyarê xwe ji qezayê, ji riya şaş-çewt dide xilaz-kirinê. Lê beyt-serpêhatiya “Ker û Kulik” da him Sosik, him Bêcan dibine sedemê mirina mêrxas. Kulik seranser jiyana xwe, mêrxasiya xwe ser pişt a Sosikê derbaz kiriye û ser pişt a wê berê xwe dide Erebestanê, wekî hespa Bêcan bîne û bi mirazê xwe şa be. Lê bi mixeneti Sosikê ava golegeniya da av didin û roja şêr ewa nikare wî ji meydana şêr bide xilazkirinê. Hespa Sosikê ra girêdayî em ê bice’dînîn ser du pîrsa, ser du girêfîka vekin. Sibê zû Kulik ku ji xewê radibe, dinihêre Sosik merixiye, ew bi kulma serê xwe dixê, diqîre, gişk ji dengê wî vediciniqin.

Ew dibê, wekî hespa kihêl temamiya emirê xwe, jiyana xwe da tu dema mexel nayê, yeqîn Sosik yanê nexweş ketiye, yanê jî ava golegeniya vexariye. Kerrê bira ji tîrsa xwe, Nemetê Îsa ji mixenetiye Kulik didine bawerkirinê, wekî na, usa nîn e, Erebestan e, em riya dûr hatine, hesp westiyaye. Kulik bawer dike.

Siyarê çê, mêrê mêrxas çî ku hespê ra girêdaye ze’f rind dizane, lê tê xapandinê.

Memê jî wedê Bor siyar dibe ber bi bajarê Muxrezemîn diçe rê va tê derdixê Bor bin da rind nabeze, qamçîkî, duda li wî dide. Bor dikêlime:

-Mal neşewitiyo, eşqa Zînê serê te ketiye, eva sê roj in tu min dajoyî, lê piyê min di qeydê dane.

Memê wê deqîqê ji Bor peya dibe qeyda piyê wî vedike, dinihêre hindik maye qeyd bigihîje hestûya. Digirî, ber xwe dikeve, bi desmala destê xwe va piyê Bor girêdide û riya sê roja, dan nîvekê diqedîne.

Pîrsa dinê. Gava Kulik giran birîndar dibe, rind tê derdixê, ku wê bimire dibê:

-Kerê bira, Sosikê rake, wayne ber çavên min ra derbaz ke.

Wedê Sosikê tînin ber çavên wî ra derbaz dîkin, ew para va bi şûrê xwe her du piyên Sosikê ye paşîn jê dike. Kerr êrişî Kulik dike,

dibê:

-Ez ê bi şûrê xwe te qetqetî kim, te çima usa kir? Kulik dibê:

-Birao, bisekine, bila mîna dêwê hevtserî çav li te sor nebin. Ez ê bimirim, yek jî tu dinihêrî Sosikê ji ava golegeniya av wexariye, ewa naçe dernayê mal. Tu yê Sosikê van dera bihêlî, dujmin ê mîna yabiya li wê siyar bin, wê qerfê xwe li wê bikin.

Nav-dengê hespê, weke nav-namûsa jinê tê parastinê. Mêrê kurd tu dema naxweze navê jina wî xirab derê, mêrê kurd usa jî naxweze hespa wî ye çê bin wî da bilukume, bêxweyî li wê siyar bin, ew yek ê wî ra qirêjê bîne, nav-dengê wî, mêraniya wî erdê xe.

Pêwîst e em edetekî kurdan yê hên î hên jî bir bînin.

Gellek cara dujmin ji dujmin heyfa xwe awa hildaye. Dujmin di bîne, wekî hespa dujminê wî bi nav-deng e, wî ra siyanet aniye, firsendê digere, hespa dujminê xwe yanê didize, yanê cîkî xewle digire dêlbijînê wê, qarçik, tuncika wê kur dike û ber dide. Sibetirê êl-eşîr bi wê yekê dihesse, nav-nûçika tînine serê xwedanê hespê. Xwedanê hespê wê qayîl biya, wekî ewledêkî wî bikuştana, ne ku ew yek bihaniyana serê hespê wî. Bi wê yekê va dujmin derbeke giran digihîne dujminê xwe.

Pêwîst e ew yek jî bê ser zara ku tu dema dêlbijîna hespa netutişt, ya yabî nabirin, kur nakin.

Wekî dîdemeke rojên oxirmên giran ji dastana "Eliyê Xarziya" bînine ber çavan, şîrove kin çawa di erf-edet, rabûn-rûniştandina kurdan da, di nava alava xeleqên qewimandinên qewimî ra hesp derbaz dibe û çawa hêjaya hespê bi tu tiştî ne tê kirînê, ne tê firotanê, hindik dimîne nîgara hespê jî ya mêrxas bilindtir bê girtinê, careke mayîn tê peyîtandin ku çawa nîgara hespên kihêl dibe ya ruhê gelê kurd.

Têlî Hemze deste siyaran va diçin, wekî Eliyê Xarziya ji kelê derxin, kurê wî Temo para va tê, bona siyara bicêribîne ka binê çi dike?

Temo xwe pişta çiyê digihîne,

Gullekê ser siyara diteqîne,
Xênî bavê û Ûsivê Cazê,
Siyarê bavê yekî navîne.

Têlî Hemze dibê:

-Lawo, fêza me esmanê hêşîn e,
Evan deran gêdûkên xirxalî ne,
Min ê evan dera sê cara qaçaxî dîne,
Gede, tu îro bavê xwe necêribîne.

Temo tê derdixê bavê wî hêrs bûye dibê:

-Keko, her çar qulba kim, her du dîna kim,
Agirê Elî Xarziya serê min ketiye,
Serê min dêşe, halê min tu nîn e,
Mîratê Hoko min direvîne,
Xweberê gulla ser çoka min diteqîne.

Rind tê derzkirinê ku Hoko hespekî kihêl e, siyarê hespê bi rev-beza hespê ra bi şa-eşqê, pesinê wî dide. Sedî sed bawerî ew e, wekî hespê Temo yekî kullek bûya, siyarê wê ewqasî ruhdar nedibû, qestbende gulle nedavît. Wekî mirov mêrxasiya mêrê çê pareve ke ser sê paran: parek ya mêrxas e, yek ya çekê destê wî ye, yek jî ya hesp-kihêla wî ye.

Siyarê kihêlê ji nava xeleqa şêr bi serfiniyazî derketinê şûn da daha gellekî pesinê hespa xwe dide, ne ku pesinê xwe; lema jî kirina hespan, nîgara wan a di nava kurdan da bûye bûyereke şîrîn û bi sed saliya va tê qalkirinê.

Bona ku nîgara hespê tu dema ji nava jiyana kurdan nêyê hildanê, neyê bîrkirinê gel huba wê di nava hemû çiqilên zargotinê da efirandiye, nitirandiye.

Hespa gede-lawkê min filitî,

Êl-osman lê xevitî.

Koma bav-bira şerm nekira biçûyama pêşiyê,
Xelqê bigota dezgirtî bû dil şewitî.

Yanê jî:

Gede-lawko, qurban,
Tuyê diçî welatê xerîbê,
Min jî bive xwe ra,
Ez ê gêhê biçînim ceniya te ra.

Yanê jî:

Navê ceniya gede-lawkê min Xezal e,
Qerefila pozê xwe je ra têxme ne'l-bizmar e,
Çûnê nava êla, dosta, dujmina,
Bira bêjin çi siyarekî bi pergar e.

Dilokên awa ne yek in, ne dudu ne, lê bi dehan, sedan in ku pesnê hespa tê kirinê, mirov amede ye bona wî heywanî hemû tiştê qenc bike. Usa bike, wekî tu qusûr neyê ser hespê. Qusûra hespê, kêmasiya wê, ya siyar e. Lêkolînvane dîrok û êtnografiya gelê kurd yê berbiçav O. Vîlçevskî di kitêba xwe ye bi navê "Kurdan" da dinîvîse, wekî kurd hespan mîna heywanê doşanî û goştî pêk naynin, mîna ga, guhdirêja, deva bar nakin.

Ger em hemû gotinên jorgotî rorobarî ser hev bikin, em ê bêne ser wê hafiye ku bal kurdan hesp nişana mêrxasiyê, nav-namûsê ye, boy azayî-serbestiyê, rojên oxirmên giran ew mîna çiyakî, mîna birakî piştovanê siyarê xwe ye.

Nivîsarnasî

1. "Eliyê Xarziya" sala 1970 ji zarê Eliyê Ezîzê Rûto hatiye nivîsarê. Ew 75 salî ye, nexandiye li gundê Sêyidlerê, nehiya Xanlarê,

rêspûblîka Azerbaycanê dimîne. Ew gellek beyt-serpêhatiyên mayîn jî zane. Dengekî xweş î zîz lê ye, ser her gilî-gotinekê diricife, bi lewzekî şîrîn diaxife.

2. “Îsmayîl Axa”, “Hamê Mûsê”, “Elîko Lawo”, sala 1962a ji zarê Şêx Evdilbariyê Îsa Babayêv hatiye nivîsarê. Ew sala 1907a li gundê Qerehaciliyê, nehiya Surmeliyê, komela Tirkîyayê hatiye dunyayê. Sala 1926a ji destî zordestiyê, tîbûn-birçibûnê tevî bi hezaran malbetên kurdan koçberî Ermenîstanê dibe. Sala me ev kilamê jorgotî, usa jî gelekên mayîn ji zarên wî nivîsinê ew gundê Xalîsê nehiya Vêdiyê, Pêspûblîka Ermenîstanê dima. Em jî wî gundî da di-man. Me êpêce kilam, çîrok ji zarê wî nivîsîne. Ew dengbêjekî kûr bû, wê ra teyayî ewî Quran dixwend. Me derheqa wî da biranîn jî nivîsiye. Şêx Evdilbarî sala 1991ê li gundê Sêyidlerê, nehiya Xanlarê, rêspûblîka Azerbaycanê çû ser heqiya xwe. Rehma Xwedê li wî be!

3. “Kekê Nisret”, “Tahar”, “Kekê Ewlo”, “Domam”, “Jina Çê”” sala 1972a ji zarê Edînê Ato hatiye nivîsarê. Ew 40 salî ye, nîvxwendî ye, li gundê Sêyidlerê, nehiya Xanlarê, rêspûblîka Azerbaycanê dimîne. Ew êpêce kilamên govendê jî zane.

4. “Heydero Lawo”, “Elîngo Lawo”, “Kalê û Du Keçik”, “Wî Lo, Lo”, “Hecî Nûrî” sala 1973a ji zarê Koroxliyê Hemo hatiye nivîsarê. Ew 40 salî ye, nîvxwendî ye. Li gundê Şemşedînê, nehiya Xanlarê, rêspûblîka Azerbaycanê dimîne. Koroxliye Hemo dengbêjekî kûr e. Ew zargotinê rind dizane. Mirovekî bi nav î deng e. Merd e, xwedanê qedirekî bilind e. Ew ji wan kurdan e ku sala 1947a ji nefikîrinê hatine Azerbaycanê. Beqî wî bi dehan hêsîrên kurdan bûne xwedanê malbetên giran. Piştovanê bêkesa ye.

5. Ji diloka 1ê hetanî ya 26a û kilamên “Qazî”, “Heso û Xanim” Xatûna Hepo gotiye. Ewa sala 1930î hatiye dunê, nexwendîye. Me ji zarê wê him jî êpêce kilamên govendê nivîsîne. Xatûna Hepo li gundê Sêyidlerê, nehiya Xanlarê, rêspûblîka Azerbaycanê dimîne.

6. Ji diloka 27a hetanî ya 50î Almasta Îsa gotiye. Ewa 60 salî ye, nexwendîye. Almasta Îsa li gundê Nemetebatê, nehiya Yêvlaxê, rêspûblîka Azerbaycanê dimîne.

7. Ji diloka 54a hetanî ya 68a Gulistana Îsa gotiye. Ewa sala 1898a li Turkiyê hatiye dunê. Gulistana Îsa diya amedekarê vê be-revokê ye. Hê biçûktiyê da me zaran ji diya xwe bi dehan “Lûrî, de lûrî”, “Dilok” dibihîst, pê ra jî hêsirên çavên wê didît. Paşê, me zaran telî-tengasiya zemîn tê derxistinê, em pê hesiyan wekî sala 1926a malbeta me jî tê Ermenistanê, hê bûktiyê da destê dayîka me ji destê dê-bavê, xûşk-birê diqete û hetanî dawiya jiyana xwe dibe xerîba xerîba, wê ra tevayî koçekoç, nefikirîn dibe riya wê ye bi şilî-şilopê, ji destî tîbûn-birçibûnê derdê ewleda dibîne, dibe derdkêşê derdê giran.

8. Ji diloka 69a hetanî ya 96a Gozela Qado gotiye. Ewa 65 salî ye, nexwendiyê. Nehiya Yêvlaxê, gundê Nerîmanabatê, rêspûblîka Azerbaycanê dimîne.

9. Ji diloka 97a hetanî ya 104a me sala 1962a ji zarê Ku-bara Elo nivîsiye. 37 salî ye, nexwendiyê. Malbeta wana sala 1937a tevî bi hezeran kurdan ji Ermenistanê hatine nefikirînê, naha li bajarê Kok-Yangakê, rêspûblîka Qirgistanê dimîne.

10. Ji diloka 105a hetanî 125a Xezala Evdî gotiye. 60 salî ye, nexwendiyê sovxoza ser navê “28 Aprêlê”, nehiya Yêvlaxê, rêspûblîka Azerbaycanê dimîne.

11. Ji diloka 126a hetanî 146a Koroxliyê Hemo gotiye. Derheqa wî da binihêrin nivîsarnasiya 4a.

12. Ji diloka 147a hetanî 164a Gulperiya Lezgî gotiye. 60 salî ye, nexwendiyê. Ewa xanimeke zarşirîn e, xênî ji diloka epêce mesele-metelokên kurdî zane.

13. Ji diloka 165a hetanî 185a Tamara Refo amede kiriye.

Ferhengok

A

akademîk: (bi rûsî) akademîsyen, zanyar
alekali: navê malbatekê ye
alincî: (bi tirkî: alıcı) kiriyar, mîşterî
altindarî: serkeftin
apinc: eba
aqar: 1. mesafeya erdê, rûba, rûkal 2. qad, meydan
aqasî: ewqasî, haqasî
arxalîx: cureyekî kincên mêran e ku li navmîla xwe werdikin; eba, potik
av (li) xwe dikirin: xwe dişûştin
avan: xanman, apartman, bîna
avkêştî: şîlbûyî, avgirtî
avrûke çe'va: awireke çavan
awa: bi vî awayî, a wisan
ay/ah: maf, heq
azadarî: azadixwazî

B

badilhewa: 1. beytu, ber bi hewa 2. bere-dayî
baîs: sedemkar, xêrnexwaz
bajon: (bi rûsî) çêregeh, çol
balgiyê tûkî: balifên ji perikên balindeyan
balte: bivir
bandûr/bandor: tesîr
bavkotî: bav nebaş
bayê kotîbûnê: nişaneyên nexweşîya cuzamê
bayê qelemlika: bayê darên spingdarê, qelemeyê
behre: 1. sûd, fayde 2. par
bekeqomîsî: gerandina gotinan bi niyêteke nebaş
bekî: belkî
bela ve: belaw be
bela kirin: belavkirin
beleki: parçeyê berfê yê neheliyayî
belqîti: qeşmer
bengîti: evîndarî, hezkirin
beqî: 1. di encamê de 2. girêdayî ...
-beqî wî: bi destê wî, bi piştevaniya wî
berav dikir: berhev dikir
beradan: berdana karîk û berxan tev pêz
berdinivîsî: ji axaftinê derbasî nivîsandinê dikir
berede berede: 1. beredayî beredayî 2. eware eware

berek: 1. dever, herêm 2. hoz, tîre
bervok: berhevok, koleksiyon
bermiraz: berzewac
bernivîsar: 1. jibergirtin, deşîfrekirin 2. kopye
beşter dike: beşdar dike, kom dike
bê ser zara: bê ser zimana
bêfem/ bêfehîm: nefehma, nezana
bi kulzikî: 1. bi zikekî kulbûyî 2. bi awayekî nexwestî
bi mixeneti: bi xayîntî û kompo
bi posîde: bi xemgînî
bi qewat: hêzdar, xurt
bi serfîniyazî: bi serfirazî, bi awayekî serkeftî
bi tomerî: bi giştî
biçin: (bi tirkî) gihadirûn
biçinçiyê biçina: gihadiruyê çandiniyê, kêlindikêşê dirûtina mêrg û zeviyan
bidebire: îdare û debara xwe bike
bihincirîne: bipirçiqîne
bilandin: gotegot kirin, gotin dirêj kirin
bilukume: bikule, topal bimeşe
bimaşe: 1. bipêrite 2. birûçike, biweşe
binê: binêre
binêm: binêrim
binetar: bingeh, xebata destpêkî
bire xewnê xirab dine: gelek xewnên nebaş dîtine
birre: birrek/komek
bist: 1. saqa çêreyê 2. şîşa zirav, parçeyek hesinê ku pê êgir tev didin
bistan: memik, hingil
bist-şirik: saq û beçikên çêreyê
bive: bibe
bixingirin: bimeşin
bok: mezin, gewre
bulik bulik: yekîne bi yekîne, deste bi deste
bûrî: burî, birih
bûsat: pûsat, pergar

C

ca rave: îcar rabe
cab dan/cewab dan: agehdar kirin
cake/carke: dîsa
ce'nî: canî
cedandin: hewl dan, xebitin
cewar: cewher, gewher
cêhê: cihê, cuda

-cêhê dibe/cihê dibe: ji malê vediqete
 cêribandin: tecrube
 cêv: bêrik, cêb
 cocix: (bi tirkî: çocuk) zarok
 culêt/cur'et: wêrekî, cesaret

Ç

ça be: çawa be
 ça ke: çawa bike, çi pê bike
 çançanî: belekbelekî, xalxalî
 çariya kavi: çar-rêya xopan û wêran
 çarmedor: dorhêl, hawirdor
 çarrêz: çarin
 çayîr: çêregeh
 çek: silah
 çemil: çembil, qulp
 çenge zêr: kulmek zêr
 çê: qenc
 çêla sor: çêleka sor
 çêr: dijûn, gotinên nebaş
 çêrk: dijûn, gotinên nebaş
 çi kanîga: çi kaniyeke
 çi kî kêrê: bi kêrê çi biki
 çilkê darê: qilçikê darê, şaxê darê yî zirav
 çîman/çîma: çi re
 çîn-mêdal: rutbe, nişan û madalya
 çîrpandin: jê girtin, daweşandin
 çîtinî: ji qumaşê çit
 çolbê gund: gundê xirab
 çurmiş bûn: (bi tirkî: çürümüş) rizîn,
 peritîn
 çuxreş: potreş

D

da qafê xwe: serhişkî kir
 dadibari/dadibihuri: derbas dibû
 daha: pirtir, bêhtir
 -daha bilind: bilindtir
 -daha jî bilind: hê bilindtir
 daka: dayika
 dara azayê: dara azadiyê
 dardar: xwedyê daran
 davê: davêje
 daxdewran: dewrana bi dax û xirabiyê
 hatiye
 dax-hevsar: hevsarê hespê yê bi qotik
 dayîn: daynin, bidin
 de'wkarî: dozdarî; de'wkar: xwedan doz
 deb: edet

deranîn: hilberîn
 derbaz bûne yalî ava/derbasî aliyê rojavayê
 bûn: firiyar, çûn ava
 derê: derkeve
 dereqa: derheqa
 derm-dax ve/be: belawela bibe, ji hev de
 bikeve
 des kî: hez dikî, dixwazî
 dest xwe da: demildest, hema pê re
 desta: desteya, koma
 desterxan/destexan: sifre
 devê sêz: li nêzikî sazê qamişan
 devetûkî: ji hiriya hêştiran/deveyan
 devî-beyar: daristan û çol
 devko: devkî
 dewl: satil
 dewil-daw: pêşên dêreyî
 dewla êş: di aşan de ciye ku gênim
 berdidiinê û ji wir bi hemdê xwe
 dadikeve nava beraşan tê hêrandin
 deylê negire: deng jê dernekeve
 dêlbijîn/dêlbijî: pirça boçikê
 dêlnarinc: dêlzer, boçikzer
 dêmê: rû
 dêmokratiya: demokrasi
 dêran: belengaz
 derêw: derewîn
 dêriz: kavi, xopan, wêran
 di hindava xwe da: ji aliyê xwe ve
 dibêye: dibêje
 dibirûse: dibiriqe
 dibize: dibihîze
 dicatedine: hewl dide
 didem: dimen
 didine xweyîkirinê: didine rawestandinê/
 sekinandinê
 dik: çik, çikilandî, tîk
 dikebe: dikeve
 dikêlime: diaxive
 dimewicîne: digewizîne, lê hiltîne û
 digerîne
 dimis: doşav
 dinitirîne: dineqîşîne
 diqewime: dibe ku, mumkin e
 dirbûn: dûrbûn
 diş diş bûn: qelişîn
 dişevînîn: dişibihînin
 dişivîne: dişibihîne
 dive: dibe

divine: dibine
 diwekilin: dubare dibin
 dixingire: dilive û dimeşe
 dordar: nobedar
 doşani: ajalên dotinê
 doşûrme: nişan
 doxa ristê/risteyê: singê ku di erdê de hati-
 ye çikilandin û bendê neqîşandî yê ji hiriyê
 lê hatiye alandin
 dunê eyan: cîhanî, ji aliyê dinyayê ve
 naskirî
 dunêdîtin: cîhanbînî
 dunyalik: kar û barên dinyayê
 duruş: (bi tirkî) sekn, rawest, cesaret
 -duruş nekir: xwe ranegirt, newêrî, cesaret
 nekir
 duwan: diwan
 dûz kirin: sererast kirin
 dûz: besta rast

E
 edilandin: dewisandin, bi cih kirin
 efat: efe, zorbe
 efîrîn: afîrîn, berhem
 efrandin: afirandin, berhevkerin
 efrênîk: berhemên afirandî
 egle vin: egle bin, bisekinin
 elametiya dide: agehiyan dide
 elbehel: a niha, helbet
 elek: bêjing
 eman: feraq
 emek: (bi tirkî) ked
 emenî, xurc, fermaş, carcim: cureyên
 xaliçeyan e
 emir da hate miyaserkirinê: bi qanûnê hate
 bidestxistin
 enenekirin: nirxandin û nîqaşkirin
 engal: egal
 erîn-nîvek: cureyekî pîvanê ye (1.5 mêtro)
 evra: pîroz
 extirme: hespê xesandî
 exte: hespê xesandî
 eyan: 1. diyar, eşkere 2. navdar
 eyan kirin: diyar kirin

Ê
 Êl-osman: alê Ozman, dewleta osmanî
 êpîkî/epîkî: (bi rûsî) destanî
 êşalon: (bi rûsî) rêzevagonên trêne

F
 fero-fotik: feraq û aman
 fond: (bi rûsî) sazî, fon

G
 gahar/guher: şûna mexelê pêz
 gedetî: zaroktî
 gemî: keştî; gemîajotî: keştivan
 gereki: divê
 gewlez: gewlaz, gelwaz
 gêdûk: newala li nava çîyan
 gêhe: giya
 gêlî: awayê tewandî yê peyva "gelî", newala
 kûr
 gêris: awayê tewandî yê peyva "garis"
 gir: 1. kêrt, çîyayê biçûk 2. mezin
 girêfîk: 1. hişkegilê 2. pîrsgirêk, kêşe
 giva: qaşo
 gohara/guher: cihê mexelhatina pêz
 gongil: gilover
 gotî: dive, pêwîst e
 govek: navend, gewde
 gulavdûn: avzêrkirî
 gul-gontaz: xemlên rengîn
 gulînk/guling: guliya por
 gur-guman: 1. hebûn, serwet 2. bawerî,
 eman 3. şik û şubhe

H
 haft: encam
 hafiyê derxin: bigihêjin encamê
 Hafiz: 1. nave mêran 2. kesê ku Quran ji
 ber kiriye 3. kesê kor
 haj: hay ji
 haleta mawîzerê: fişengdanka tîfinga
 Mauzerê
 han/hanê: ha ji te re, ha hilde
 hang-bang: qafîye û melodî
 hebandin: 1. hez kirin 2. bawer kirin
 hebandî: 1. hez kiri 2. êwirandî, hewandî,
 sitirandî
 heçar: her çar
 heçiya: her çi ku
 helan: halan, olan
 heleqetî: pêwendî
 helke/herke: eger
 hema vê qîtê: hema vê lehzeyê
 heref: egît, êgin, mêrxas
 -herefê meydanê: mêrxasê navdar

herda: her duyan
herê: erê
herek: her yek
herekê: her yekê
herke/helke: heke, eger
hevanî/lihevanî: kesê ku li hev tine; hûnayî
heve rûnê wan: hebek rune wan
hevin/heban: tûrikê xwarina şivanan
hewas: kêfxweşî
hewal didin: diaxivin
heyn: dem, zaman, gav
heyr-hijmekar mayîn: bi heyret û teqdîr lê nihêrîn
heytehol: şadî û kamrani
heywanê doşanî: heywana dotinê
hêjake: hêjayiyeke
hêkehêk/hêyehêy: gazikirina pêz bi peyva "hê"
hêkehêk: gazikirina bizin û nêriyan bi peyva "hê, hê"
hêl: zinarê holbûyî, gindirî
hêle: bilind, biqîmet
hên: heyam, dem
hên î hên: geleki kevn
hêrat/hêratî: cureyekê destmalên jinan e
hêwêriye/êwiriye: sitiriye, bûye mêvan
hêwirandin: bi cih kirin, sitar kirin
hilçinandin: 1. çikilandin 2. neqîşandin
hilşayane: 1. hilweşiyane, rijiyane 2. daketî-ne, xwe berdane
himlî: bi awayekî bingeîn
hingavtin: rapêçan, nîşan girtin
hizhizî: 1. peritî û jihevketî 2. pîr û temendirêj
hînehîn: îskeîsk
hîva sava: heyva nû, hîva çardeşevî
Hoko: nave hespê
hol bûn/hot bûn: gindirin, ji jor de hatin xwarê
hormîn: hurmîn, dengê fermankî
hoste-ne'lbend: nalbendê hoste
hoz: 1. kerî 2. cihê keriyê pêz
hub: evîn
hubr: boyaxa nivîsandinê, murekeb
hucre: jûr, odeya mela û sofîyan
hunurandiye: huner pêk anîye
hurmînî: qirînî û gîrmînî

Î

îlancix: (bi tirkî: yilancik) cureyekî nexweşîyan e; kunêr/kînor
îlandîlî: (bi tirkî: yilan dili) zimanê maran, du şaxî, devçeçel
îna biki/îman biki: bawer biki
înstîtûta pêdagogiyê: enstîtûya zanistên perwerdekariyê
îskem: (bi rûsî) skêmlê, rûnişte

J

jêl va: ji jêrê ve, ji aliyê jêrê ve
ji bengîtê/ bengitîyê: ji eşqê
ji çimîn/çîman: ji mêrgê
ji gêvîn/gavên: lawê gavanan
ji kelefana/ji kelefeyan: ji avahiye wêrane hatî, ango zarokê zîneyê
ji şivîn/şivên: lawê şivanan
jorgotî: li jorê gotî; navborî

K

kanîg/kanîng: kanî (forma biçûkkirî ya peyvê ye)
kasib: xizan, feqîr
kasiv: feqîr, xizan, belengaz
kastekast: dengê zarîniyê yê kûçikan
Kavirê deyna ku da rada?: kavirên deynkirî bi ku de berda çêreyê/li ku diçêrine
kela efrandariya xwe: kel û fûrîna afirîneriya xwe
kela: zindana kelehê
kelik/kelk: sûd, fayde
kerî-sûrî: çend keriyên pêz
kevçikî: mîna kevçîyan
kewanî qotikê ketiye: kebanî bi nexweşîya qotikê ketiye
kewanî: kebanî
kewrîn: awayê tewandî yê peyva "kewran", karwan
kewşen: giyayek e
kêran-kutek: max û stûn, darê qalind ê ser banan û stûna li binî
kêrintî/kêlindî: aleta gîhadirûnê
kêrintîkêş: kêlindîkêş, kesê ku bi devê kêlindiyê giha û zeviyan didirû
kêwrişkî: mîna kêroşkan/kerguhan
kîjanê: a ku (tenê di vê rewşê de wê wateyê dide)
kilamhevanî: bestekarê stranê
kildan: şûşeya kilê

kimkimî: li ser hev kombûyî, tiji
 kireşo/kiraşo/kiraşo: cihê kincşûştinê
 kiri: standî
 koç-sera: koşk û qesr
 kodikî: mîna kodik û elbikan
 kofî niko: jina ku kofî xwar daniye serê
 xwe; kofixwar
 kok nabin: qelew û têrgoşt nabin
 kol: tûm, koma çirpiyan
 kolos/koloz: cureyekî kumên mêran e
 kolxoz: di heyama Yekîtîya Sovêta berê de
 koperatîfa gundiyan bû
 Kommerkeziya Partiya Kommûnîstiyê:
 Navenda Partiya Komunist
 kondele: cureyekî solan e, qûndare
 kopek: (bi tirkî) kûçik, tûleyê nêr
 kotimêr: mêrê nebaş
 kubra sivê: berbanga sibehê
 -kubra sivê ra: bi berbanga sibehê re
 kuçikê: kuçeyekê
 kulme: kulmek
 kul-ta: navên du nexweşîyan
 kurmal: kurê malê
 kurtik al: îşlik sor
 kutasîyê: di dawiyê de
 kute, tibistê: baneşaneke ji bo qewartina
 kûçikan
 kûçe: kuçe
 Kûçikçap: (bi farsî: kûçekçap) cureyekî
 çekan e

L

lan: cihê veketina şêr
 lap: 1. tam 2. pir
 laqirtî/laqirdî: henek
 lazim zanibûye: pêwîst û girîng ditiye
 lec: pêşbîr, pêşbazî
 lele: qeyd
 leqetî: 1. parçe, tike 2. hûrik û bermaye
 lewz: zar, telefuz
 lê bû hevteheyst: li ser bû tengasî, dora wî
 girtin
 lêpik: kesê ku lê dipê, mufetîş
 lîs: part
 lomanî xelqê ra: ji ber lome, gîlî û gazinên
 xelqê
 lorik: zarokê dergûşê yê ku jê re lorî tên
 gotin

M

mahûdî: cureyekî qumêş e
 mak kirin: baş çikiladin û têgihandin
 mak û pate dikir: xurt û perçin dikir
 mamar: jina ku li ser jinên ducanî disekine
 û zarokan diwelidîne
 manat: pereyê Azerbaycanê
 maqûl: 1. beraqil 2. canik, cenab
 marûm/mehrûm: bêpar
 marz: parêzgeh, wilayet
 mayîn: din
 -yê mayîn: yê din
 menegî: hesp an jî mehîna bezê
 meni/mehne: 1. wate 2. bihane
 mer: meneke pîvandina avê ye
 merem: daxwaz
 merixîye: veketîye (ji bo ker û hespan)
 merûm/mehrûm: bêpar
 mesene: nesekine
 mesil: cihê kişîna avê li devê çem
 metel/mehtel: ecêbmayî
 mewemew: dengê pisikan
 meyt: (bi erebî: meyyit) mirî, cinyaz
 mêvîn: awayê tewandî yê peyva "mêvan"
 mêzer: 1. pêşmal 2. dezmal
 Mêzin, Pêvir/Pêwir: du gerestêrk in
 mift kin: kilid bikin
 milk-maş/miaş: hebûn û mehane
 mîna hev bûn: wekhevî
 mînbaşî/binbaşî: (bi tirkî) fermandarê
 hezar leşkerî
 minê ke: jî holê rake
 mînistr: (bi rûsî) wezaret
 miqara: (bi erebî: mexarah) şkeft
 miqim: xurt, berk, mehkem
 misqalî: meneke pîvandinê ye (4.8 gr.)
 miştûk/muştûk: darcixare, qelûn/qeliyane
 monik monik: movik bi movik, bi hûrgilî
 mûdelî/modelî: cureyekî tîfîngan e
 mûşîn: cureyekî teşîyan e ku jî dareke
 bêgîlê tê çêkirin û şimşad e

N

nahebîne: nahewîne, hilnade nava xwe
 nakebime: nakevime
 navêyan: navdar
 navtîl: bertîl, rîşwet
 nefsdar: kesayet, şexsiyet
 negaharî: neguherî
 nêhêrê/nehêre: sîrsûm, aleta dewkiyandinê

nehêwişandiye: kêmasî nekiriye, teksîr
 nekiriye
 nehî: bajarok, nehiye
 nehiş: bêhiş
 nemkêş: cihê avhêsrî, şîlbûyî
 neqev: kanal, herqa fireh
 neqş û nikên: nexş û nîgar, rê û resm
 netutîşt: ne tu tişt, békêr
 nevê: nebêje
 neynîk: awêne, eynik
 neynûk/neynik: eynik, awêne
 nîfştî: nîvişt, nîvîs
 nijandin: lêkirin, hûnan, jenandin
 nîng: ling
 nîqenîq: nalenal
 nişa nîn: nişaste û tehma nên
 nitirandiye: neqîşandiye
 nîvekari: bi nîvî nîvî
 nîvriya undabûnê: nivê riya windabûnê
 nizam: nizanîm
 nolî: mîna
 notlî: mîna
 nuqu nava mitala nebû: noqî nava mitala
 nebû, bi berfirehî nefikiri

O

olecax e: (bi tirkî) dibe ku, mumkin e
 onbaşî: (bi tirkî) serkarê tîma hera biçûk a
 lêşkerî (10 lêşker)
 oro: lo
 ort: nîvek, navber
 orteng: navteng, navkêlk
 oxirme: karesat, bela
 -oxirmê giran: êrişên giran

P

padiron: (bi rûsî) fîşengên çekan
 padşe Nikalê: Çar Nikolay
 palan-pûltê: hey pалан kurtan giranê
 palgon: şaneşîn, balkon
 palik: 1. cihê rûniştinê yê li ser zîn û kurta-
 nan 2. (ji bo simbêlan) poşe, simbêlboq
 pal-pûl: kêlek qelew, pal kok
 papax: cureyekî kuman e
 papaxrêş: kumrêş
 papûr: cureyekî aletên ku bi gazê dixebitî û
 xurek li ser dihatê pijandin
 parên avtomobîla: parçeyên erebeyan
 parizandin: parastin

per: 1. bask 2. rûpel 3. pirça balindeyan 4.
 kêlek, کنار
 perbelek: basikbelek
 perç: 1. werm 2. hêrs
 pesarî: kermê, qelax
 petek: tasa li binê çirayê
 peyag: peya(k), mirov
 peyil-daw: pêşên dêre û fistanan
 peyitandin: îsbatkirin
 peykêl: peyker, heykel
 peyn: pehîn, pîn
 pê pê: pê bi pê, gav bi gav
 pêjder: pêşder, pêşiya dêrî
 pênsid: pênc sed
 pêpes dike: binpê dike
 pêş merekê: li ber kadinê
 pêşk: pişe, huner, xislet
 Pêwir/Pêvir: gerestêrkek e
 piçeng: binçeng
 pîkî: 1. piyekî 2. aliyekî
 pîrqapîrq: dengê kenînê
 pirtî: parçe
 piş newalê da qulobanî dibe: li pişt newalê
 digindire/hot dibe
 pişezan: hunermend
 piyanîna lêda: piyanojen, kesê ku li piya-
 noyê dide
 povêst: (bi rûsî) romana kurt
 poyêm: (bi rûsî) helbest
 poyêz: (bi rûsî) trên
 president: (bi rûsî, inglîzî) serok, serok-
 dewlet
 prokûror: (bi rûsî) dozger
 pûte zêr: kodîkek/elbikek/kûpek zêr (pûtek:
 16 kg e)

Q

qal tîne: gur û geş dike
 qal û ceng: qar û şer
 qal: buyer, serpêhati
 qalbûyî: 1. gihîştî û baş pijiyayî 2. di pişe-
 yekî de qertbûyî
 qar: xeyd, sitem, zordestî
 qarçîk: koka boçîkê
 qaş: kaş, hevrazê bi teht û kevir
 qatî: qetqetî
 qatix: (bi tirkî: katık) mast
 qeda/qeza: bela
 qelet kiriye: şaşî kiriye

qelpaxê zîna: pişti ku zîn ji têxte tê çekirin
 bêlgi didine ser wî qelpaxî (bi tirkî: kapak)
 qelptî: sextekari, hîlebazî, bêbextî
 qeme: cureyekî xenceran e
 qemekî: mîna qemeyan devçengel
 qendilî: mîna qendil û mûman zirav
 qerebeş: (bi tirkî: karabaş) reş û enîbeş
 qereçalî: (bi tirkî: karaçalî) dara dirîreşkê
 qerefil: qurnefil
 qeretû: 1. reşemirov 2. pel-potên ku li
 ber bostanan diçikînin da ku teyr-tilûr jê
 bitirsin
 qerewil: nobedarê payînê, çavdêr
 qesas: 1. mêrkuj, qatîl 2. serbir, celad
 qesidî: 1. mêvan 2. muhtac 3. asêbûyî
 qest: qestîka, bi derewînî
 qesta: qestîka, bi derewînî
 qestbende: bi qestîka, bi derewînî
 qewil-qiyar: soz û qîrar
 qewimandin: bûyer
 qewrik: qewartî, lanetkiri
 qeyd-çîdar: zincir û bendê kindir ê diavêjin
 her du piyên hespê da ku nikariye bireve
 qeyxane: hêkerûn
 qeziya: bela
 qicî/qiçî: cureyekî çêreya xwarinê ye
 qilçik: (bi tirkî: kılçık) dasiyê simbilan
 qiniyat: raman, hizir, fikir
 qir/kirr: çoltera bi kevir û kuçik (piranî li
 dora çiyayên teqiyayî)
 qira sivê: qiraviya sibê, qeşaya ku ji ber
 sermê bi dar û giyayî ve digire û bi hilatîna
 rojê re dihele
 qiran: qir ketî navê, qir pê ketî, mirarbûyî
 qizil alme: (bi tirkî: kızıl elma) sêva sor
 qîçk/qîçik: rengê zer ê leymûnê
 qol: 1. îmza, şanênava 2. (bi tirkî: kol) mil
 qotik: 1. cureyekî nexweşiyên kujer e 2. ta û
 şirikên rengîn
 qotika fîno: jora fesê osmaniyan
 qulap qulap: dûmana cixareyê gum bi gum
 qulav qulav: komên dûmanê, gûlp bi gûlp
 qule: hespê dêlkurt ê ku dide zîtikan
 qur: rengê gewr
 qurba: qurban
 qurf (başax): simbil
 qurhestû: ("kuru/hişk" [tirkî]+hestû [kur-
 dî]) hestiyê hişk
 qurne: sedsal

qusandin: kurt kirin, kêmkirin
 qûş: qayîş, kember

R

ra çi nabe: çareya çi tune ye
 rastesere nivîsarê: nivîsandina pexşanê de
 ravim ber da: li ber rabim
 renê rikêfê: ranê ku zengûyê li newqê dixê
 û hespê dide bezandin
 rewa kirin: xelat kirin, diyarî kirin
 rêdaksiya: sererastkirin, redaksiyon
 rêniş: rênişandêr, editor
 rêspûblika: komar, cumhuriyet
 rêzbêjan: rêzehevok
 rîdansiþî: rîhsipî
 rimdar: muhafîz, silahdar
 ron kî/bikî: eşkere bikî
 ronahidîtî: weşandî
 rorobarî ser hev bikin: bicivînin û binirxî-
 nin
 rûbayê dunê: rûyê erdê
 rûbend girtin: rûyê xwe pêçan
 ruhdar: zindî, candar
 rûkî: rûyekî

S

sabûna reqê: sabûna nû ya hê dest pê
 neketiye
 saçax: (bi tirkî: saçak) rişî, şirik
 salme salme: (bi tirkî: sallama sallama/sal-
 lana sallana) qure qure
 satircemî: nexweşiyêke hinavan e
 satûn: bedew û hezkirî
 sax ve: sax be
 sed sîw şeş: 136
 sedefî: (bi erebî) bi rengê sipî
 sedrê sêksiya (beş) nivîskarên Kurdistan:
 serokê Beşa Nivîskarên Kurd
 sekesis(z): (bi tirkî) bêxîret, bênamûs
 senetkar: pişekar
 senaya komirê: hilberîna komirê
 sêntyabr: meha îlonê
 senzûra: Rêveberiya Sansûrê
 serfîniyazî: serfirazî, serbilindî
 sergî: sergîn, kerme
 serhonaz: serhozan, pêşengê koma kêlin-
 dikêşan
 serq-sefa: (bi erebî: zewq û sefa) kêf û şahî
 serra: hişsivik

serwêrê parê: serokê beşê
 seva te: ji bo te
 sîdan: sîwan, şemsiye
 sikûmê xwe daxistin: mirûzê/rûyê xwe tirş
 kirin
 simîn: sîmîrg
 sipîtayî: 1. rewşa rengê sipî, sipibûn 2.
 hilberînên şîr (şîr, mast, toraq, penêr, rune
 nivîşk)
 sirincî: şkestî, posîde, xemgîn
 sîtê: sitî, xanîm
 siveng da: ji sibehê de
 siyanet: rûmet
 siyarê qitîkê: siwarê kulê, gelekî lezgin
 sovxoz: di heyama Yekîtîya Sovêta berê de
 rêveberîya hebûna gundiyan bû
 stekana qawê: îskana qehweyê
 stol: mase
 sûd: dadgeh
 sulman: misilman
 sûs: rewekeke tehmîxweş e

Ş

şabaş: diyarî, xelat
 şax: çiqil
 şebeq: şeweq, şevq, berbanga sibehê
 şedetî: şahidî
 şehed: 1. şahid 2. bac
 şel: şal, şalwar
 şelex: barpişt
 şelte: tetqal, parçe
 şengê siyara: çelengê siwaran
 şengexort: xortê çeleng
 şevger: şeveder, kesê bi şev li derve dimîne
 şevîn: çêrandina danê şevê
 şexte: kana komirê
 Şextê Têhranê: li aliyê Têhranê
 şêbîsk: jina qure ya ku bîskên xwe şeh dîke
 şikilkişandin: dramatîze kirin, wêne girtin,
 sêwirandin
 şîle: sîle, şeqam
 şîrikê sehetê: xemla saetê
 şûşebend: camekan

T

ta ketin: nexweş ketin
 tab nake: sebr nake, xwe ranagire
 taxbûr taxbûr: ji yekîneyeke leşkerî mezin-
 tir, tîp bi tîp

te qêmişî dik nekir: destê te neçû dik
 te tirê: tu dibêji qey
 tekeyax: (bi tirkî: tekayak) 1. bi piyekî 2.
 cureyekî çekan e
 telaş: 1. darê ku 10x10 cm hatiye birin 2.
 tayê ris ê wekî xortimê li hev pêçayî 3. xem
 û endîşe
 tele: dafik, kemîn
 teles: teres
 têlî: bedew û hezkirî (jin)
 têlîn: awayê tewandî yê peyva "talan"
 tê ra dît: munasib dît
 temene dibe: ji bo rêzgirtinê xwe xwar dîke
 temil nake: tehemul nake
 tengazerî/tengezarî: aciz, canbêzar
 terk: (bi tirkî: terlik) cureyekî kumên
 havînî ye
 terkesalî dunê: kesê ku kar û barên dinyewî
 terikandine, terkeseerê dinyayê
 tevgel: tevger, bûyer
 tew: tam, bêqûsûr
 tewilandin: ji bo ku ajal biçêre kap kirin û
 girêdan
 têxnîka: teknoloji
 tiling: tili, pêçî
 tîna xwe dayê: dêna xwe dayê, lê nihêrî
 tipe: tipek/yekîneyek
 -tipe siyaran: tipeke (desteyeke) siyaran
 tirê: got qey, wisa hesiband
 -tirê kewê: mîna kewê
 tît: rind
 torîvan: edebiyatzan
 tûncîk/tûncîk/çûncîk: porê pêşîya sêrî,
 porê li fêza eniyê
 turxana topê: desteka topê

U

ulm: zanist
 ulmdar: zanyar, alim

Û

ûradnîk: (bi rûsî) heyama Çarîtiya Rûsyayê
 serokê deverekê

V

vê sîvê: vê sibê
 vegerînê pênçî selem bîstîne: piştî vegerînê
 pênçî selefî bîstîne, pênçiyekî bi faîzê

bistîne
verê kir: şand

W

walet: welat
wan erda daneynî: xwe bi nezaniyê dayna
warê wira: were wir
warên: werin
wayne: bine
-wayne xar e: binin xwarê
wê ra tevayî: digel wê
wede: zaman, dem
-wedê dagerê: dema veqera ji zozanan
-wedê firevaniyê: dema firavînê/navrojê
wekiland: dubare kir
wekokên ronahîdîti: mînakên tomarkirî û
weşandî
welgerîne/wergerîne: biqulipîne, serobino
bike
Werê Dêma: Warê Dêma
weşevanî: weşangerî
wete/wate: mehne
weten: welat
wetenhiz: welatperwer e
weynek: mînak
weynek: rol

X

xalçê, bavçê: xalê wî qenc, bavê wî qenc
xanêkirin: xuyakirin
xavik: 1. nepijîyayî 2. navika hespê ya zirav
xêlî: dezmala ku diavêjin ser sere bûkê
xênî ji te: xêncî/ji bilî te
xêr-ay: xêr û heq
xerclix: xercî, diravên mesrefê
xesî: xesiyayî, xesandî
xevitî: xebitî
xewle: tenê, tenha
xeylan: xeyalan
xezeb: hêrs
xilt: bermayeya bêfayde, gildîn
xirxalî: xipxalî, tenha
xizêm: xemla bêfilan
xodûm: (bi rûsî) meş
xozneber: ajneber, melevan, sober, avjen
xuberê: jixweberê, xwe bi xwe
xuliqandî: afirandî, berhevkirî, hûnayî
xuluqiye: derketiye holê
xun: xwe

xûşxûş: xûşexuş
xweberê/jixweberê: xwe bi xwe
xwey kirin: xwedî kirin

Y

yabî: hespa hêmin a ku kî digihêjê lê siwar
dibe
yal: alî
yalîkî: li aliyekî
yanga min: ya min, evîndara min
yanga: ya ku aniha
yaşîk: (bi rûsî) çaviya maseyê, qutî

Z

zavod: fabriqê
zax: şkeft
zeftkar: dagirker
-zeftkarên dereke: dagirkerên biyanî
zemîn: awayê tewandî yê peyva "zeman"
zendegirtî: ecêbmayî
zergar: zêrkar
zêndî: zindî, sax
zêrandî: êş û jan kişandî, îşkencekirî
zêrekî deha: zêrê kelle yê herî mezin

Endamê Yekîtiya Nivîskarên Azerbaycanê Ahmedê Hepo ev xebata xwe li ser heşt beşên sereke ava kiriye: Di beşa yekem de beyt-serpêhatiya mêrxasê kurd Eliyê Xarziya heye û bi terzê dengbêjan hatiye tomarkirin. Di beşa duyem de çîroka bi navê Dundulçûk heye ku hinekî dişîbihe çîrokek ji Çîrokên Hezar û Yek Şevê. Kilamên mêrxasiyê yên bi navên “Îsmayîl Axa”, “Elîko Lawo”, “Kekê Nisret”, “Tahar”, “Kekê Ewlo”, “Heydero Lawo”, “Elîngo Lawo”, û “Hamê Mûsê” di rêza sêyem de cih digirin. Herwiha di beşa kilamên evîntiyê de jî stranên “Kalê û Du Keçîk”, “Qazî”, “Domam”, “Heso û Xanim”, “Jina Çê” û “Hecî Nûrî” valahiyeke berbiçav dagirtiye. Di tevahiya berhemê de 185 dilok hene ku her yek jî ya pêşiya xwe xweşiktir e. Çil pêkenî û şîretên berhemê çêjeke taybet didine wêjeya kurdî; hem rûyê mirovî geş dîkin hem jî hişê guhdarî kaşî nava deryayeke ramanê, ibretgirtinê dîkin. Nivîskarî tenê numûne berhev nekirine; herwiha derbarê nîrxandina numûneyên folklorî de jî du gotarên lêkolînî amade kirine. Di beşa “Hêjaya karîbarên gel di çi da nin?” de berhevkarî hewl daye ku tekstên tomarkirî û bihîstinên xwe bi rêbazeke wêjeyî binirxîne. Mirov dikare gotarên “Nîgara Jina Kurd Nava Beyt-Serpêhtiyan da” û “Nîşana Mêrxasiyê” wekî du xebatên zanistî binirxîne ku lêkolînerî jî gelek çavkaniyan sûd wergirtiye. Di dawiya berhemê de beşa nivîsarnasiyê heye ku bîbliyografyaya salixdarên nivîskarî tê de hatine destnîşankirin.



PDF:

Enstîtuya Kurdî ya Qefqasyayê

Web:

<https://www.ensiklopediyakurdi.com/>

Tel.:

+7 918 073 48 79

